



kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 63 | 2015



MIZGÎNÎ BO ZAROKAN!

Çîrokeka evîndariyê ya nû bi kurdî li kitêbxaneya zarokên kurd zêde dibe.

Hêsirên Graniyayê

Fabilek li ser kurdan, keltan û eslê henaran

Ji weşanxaneya APECê

Gotin ji **E. A. Nolanê** û wêne ji **Saar Keunenê**

Hêsirên Graniyayê çîrokeka evîndariyê ya du-kulturî (bi-cultural) ya li ser du rêberên xwedan hêzên wekhev e: cinekî kurd ê wêrek yê bi navê Tijda û serrahîbeyeka xweşik a îrlândî ya bi navê Graniya ye. Gava civaka graniyayê ji bal pêşveketina orduya romayîyan dikeve ber gefan Tijda û Graniya hevkarîyekê avadikin ku di encamê de riya hebûna gelê kurd vedike. Di nav çîrokê de xwendevan pêrgiyê reqe-daketina (lierdêketina) 500 kilîmên (xalîçeyên) biefsûn, hêsirên xemgîn ên ku dikarin veguherin yaqûtên kefdayî û baxçeyekî mêweyan yê sihêrdar ku berê xwe yê pêştirîn ê henaran dide tê.


Hêsirên Graniyayê yê di destpêka 2016an de wek pirtûk bi kurdî, swêdî û îngilîzî derkeve.

Ji bo çi ji nu ve nivîsîna efsaneyekê?

Hêsirên Graniyayê, ya ku demekê efsaneyeka tarî û zordar a afirindiniyê ya kurdan bû, vediguhêre çîrokeka aştîyane ya pozîtîf bi peyamên giring ên li ser koçberiya mecbûrkirî, pîrkulturîyê û wekhevîyê.

E. A. Nolanê efsaneya eslî ya li ser 500 bakîreyan/rahîbeyan di dema piştî şerê Xelîcê de gava di nav penaberên kurd de kar dikir bihîst.

Gava wê guh dayê, bala wê kêşa ku hemû qehremanên mêr sûcdar/gunehkar bûn û hemû qehremanên jin qurbanî bûn. Wek çîrokbêjeka bihewes wê meraq kir, gelo hemû dîmenên buyeran nedikarî ji perspektîfeka din bê dîtîn. Ev bû destpêka Hêsirên Graniyayê.



kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

Ji bo vekirina Komela Çandî û Piştevanîya Kurdên Anatoliya Navîn
(KOMKURD-AN)

Mêvanên bi rûmet û endamên komîta KOMKURD-ANê,
me ji dil û can dixwest ku em jî aniha bi we re bûna!
Malesef, demê li hev nekir, çênebû û me nikarîbû em werin!

Lê her çiqas em bi xwe di nav we de nebin jî, dilê me bi we re ye!
Em hêvî dikin pîrozkirina vekirina KOMKURD-ANê wê bi kêfxweşî
derbas bibe!

Ev karê ku hûn dikin û pê radibin, karên pir muhîm in.
Di rojên pêş de ji bo parastin û pêşxistina ziman, kultur,
rabûn û rûniştina me kurdan ê roleka xwe ya mezin hebe.

Mêvanên delal, hûn li wir, em li vir û hinek ji me jî li derên din...
Li ku derê dibe bila bibe, bawer bikin şîn û şahiyên we, yên me ne.
Êş û kêfxweşiyên we jî yên me ne... Ev roja we, me jî kefxweş dike.

Bi hêvîya rojên xweş û geş em ev roja we ya vekirina
KOMKURD-ANê ji dil û can pîroz dikin.

Mala we ava be bo dawetnama we!

Li ser navê redaksiyona Bîrnebûnê
Ali Ciftci, Muzaffer Özgür, Seyfi Doğan

Stockholm 21ê zivistana pêşîn 2015

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 63 | 2015

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Dr. Mikaili, Xizan Şilan, Muzaffer Özgür,
Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Mem Xelikan, Hesen Huseyîn
Deniz, Mulla Ceran, Fatoş Koyuncuer, Eşgozel,
H. Hasan Tuzcu, Ecevit Yildirim, İhsan Türkmen,
Yusuf Yeşilöz, Memê Mala Hine, Adem Özgür

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08,

Spånga/Sverige

E-post

info@apectryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Têkili/İlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa:

Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İşveç hesap numarası: (Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İşveç dışındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baskı: Apec- Tryck AB



Roja ala Kurdistanê, 17/12

Wêneya berga pêşin ji kovara bi navî *Proqram* a rêxistina, *Gesellschaft für Bedrohte Völker* hatiye wergirtin.

Ev keçika ji êrişa DÎ (Dewleta Îslamî) ya li ser Şengalê reviyaye, ji mirinê filitiye. Ev wêneya li Zaxoyê di kampa penaberan de hatiye kişandin.

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tînin, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

- Ji bîrnebûnê 6
Ali Çiftçi
- Êrîşa ser kurdên Kirşehîrê 8
Mem Xelîkan
- Gundê Qadioğlu 14
Muzaffer Özgür
- Cangorîyên Qerecedax, Qirqîşla û 16
Zengenê ya Konyayê
Mulla Ceran
- Dawetên kurdên Anatoliya navîn 19
ên reşîyan
Fatoş Koyuncuer
- Çend gotin li ser kurdî– kurmancî 24
Hesen Huseyîn Deniz
- Hevpeyvînek bi seroka Komela 32
Hîndekariya Kurdî, Evîn Yağcı re
Ecevit Yıldırım
- Mîçê jî ji nav me bar kir 36
Îhsan Türkmen
- Kilamên şîret û gazinan 38
Îhsan Türkmen
- Veguherîn – Franz Kafka 43
Werger: **Nuh Ateş**
- 50 Mîçê Usî Zêwê lêhengêk bû
Muzaffer Özgür
- 53 Em bi Rojava va bûne xisim
Eşgozel
- 55 Fehmi Demir`in ardından
H. Hasan Tuzcu
- 58 Xerîbî mîna avê tal e
Yusuf Yeşilöz
- 61 Çîroka kilameke şînê
Memê Mala Hine
- 64 Helbest
Seyfî Doğan
- 65 Xwedî derketin:
Ji Mereşê da heta Sêwasê
Adem Özgür
- 68 Av
Seyfî Doğan
- 71 Sîyarê Têrika–6
Dr. Mikailî
- 77 Navenda gund
Seyfî Doğan
- 82 Helbest
Xîzan Şîlan
- 84 Başvuru dilekçesi
Serîlêdan

Ji bîrnebûnê

Xwendevanên birêz, bi vê hejmarê re em dikevin saleka nû. Mixabin sala derbas bûyî ji ber bûyerên li rojhilata navîn, nemaze li dorûbera welatê me koçberiyeka bêserûber dest pê kir. Ji Kurdistanê bigrê heta welatên Ewrûpa û Skandînavîyayê însanên ji Rojhilata Navîn û Afrikayê, di şertên pir dijwar de pênaber bûn. Piranî jîn, zarok û salmezin bûn. Ji cih û warên xwe bûn, ji bo canê xwe xilas bikin û jiyaneka aram ji xwe re peyda bikin, xwe li çîya, banîya û deryaya girtin. Gelek ji wan di avê de xenikîn û termên wan li qeraxên deryayan de lê rast hatin. Hinekên wan di revê de, di kamyonên porkirî de bê hewa man, mirin. Li welatên Ewrûpa li ber derîyê sînoran de belangaz û pêrîşan bûn. Ji aliyê gelek xêrxwazên europî ve pêşwazî li wan hat kirin, lê di eynê wextê de dijberiyeka pir bi xort jî li piraniya welatên Ewrûpa û Skandînavîyayê rû da û rê li pêşketina partiyên nijadperest vekir.

Îro li seranserê welatê me, şerekî pir dijwar û bê pîvan li hember xelkê me têye kirin. Li başûrê welêt, xelkê me yê ji Şengalê di êrîşên hêzên Dewleta Îslamî(DÎ) de rastî qirkirineka bêhempa bûn. Yên ku xilas

bûn niha li bakûr û başûrê welêt, vê zivistanê, di şertên pir xirab de, di kampa de dijîn. Ez naxwazim wan wek kurdên êzîdî bi lêv bikim. Ji ber ev kurdên me yên xas in. Bîrûbawerî û nasnama xwe parastine û ji ber wê jî dema kurd nêzikî azadî û serxwebûna welatê xwe dibin, em ji dîrokê de jî dibînin ku herdem ev pir bi hovane rastî êrîşên dijminên kurdan bûne.

Niha Şengal ji destê DÎ hatiye rizgar kirin, xeberekê xweş e! Pîroz be! Em pê dilşa ne. Lê, piraniya rûniştvanên Şengalê xuya ye dê ve-negerin cîh û warên xwe. Ji ber min bi xwe hem li kampa li Amedê û hem jî li yên Dihokê de, pir ev gotina ha bihîst: "... *êdî ev der ji me ra heram e! Em nikarin vegerin! Ji ber dema xeberê DAÎŞê hat û ew nêzikî me bûn berî wan cîranên me yên bi salan, bi kêr û xençeran erîşê me kirin. Ev der hêdî ji me ra heram e... em nikarin vegerin...*"

Erê, em hêvî dikin xelkê me dîsan jî bikaribe vegere ser axa kal û bavên xwe û desthilatdariyên hêzên kurd jî bikaribin guhên xwe baş bidin daxwazên xelkê xwe û dest ji berjewendiyên xwe yên

şexsî û partîyan berdîn! Ji ber divê hêdî tê bigihên ku berpirsyariya welatekî û parastina xelkekê li ser berjewendiyên partîya ne!

Ev êrîşen li başûr, rojhilat, rojava û bakûr dibin, hemû li hember kurdûnê ne. Em niha li navçe û bajarên Anatoliyayê jî rastî êrîşên bi vî rengê tên. Li Kirşehîrê, li Konyê, pir vekirî êrîşê dukan û cîyên kurdan hat kirin. Sibê jî dê çi bikin em nizanin!

Lê em baş dizanin ku êrîşên bi wî rengî li tu derê dunyayê li hember neteweyên ku xwedî dewlet in, nê kirin! Kurd, ji ber bê dewlet in, ji zaroktiyê de bigrê heta kalûpîr jî dibin, heqeretîyê dibînin, nasname û zimanê wan biçûk tê dîtin.

Em ji xwedîyê pirtûkxana *Gül*, birêz Eşref Odabaşı û xwediyên ev dukan, cîyên kar û malên ku rastî êrîşan bûne re dibên; derbasî be! Em her tim bi we re ne û piştevaniya we dikin.

Me pir ji dil dixwest bi agahdariyên nû û yên dilşa vê hejmarê bi we re perve bikin. Mixabin! Gotin bihara ereba, tofan li serê kurdan danî, Li seranserê welêt kurdên me mecbûr man sinorên xwe, malên xwe li hember DÎ û hevalbendên wan biparêzin. Ji

rojawayê Kurdistanê bigrê heta bajarê Kerkukê êrîşê kurdan kirin, kurd hatin kuştin! Li ku teqînîyek bû dîsan kurd hatin kuştin.

Li vir hemû ew kesên ku di teqînîya li Ankareyê de mirin û malbatên Şîrîn Kiliçalp, Fatma Karabulut û Gulhan Elmascanê re dibên; serê we sax be! Êşa we êşa me ye û em careka din van her sê gulan bi bîr tînin!

Ji reva, koçberîya şerê Irak û Suriyê de yên mirin, em dibînin dîsan piranî kurd in. Wiha bû ku termên zarokên kurdan li qeraxên deryayan de lê rast hatin. Ev jî têr nekir em dibînin yên bêyî emrê yezdanê mezin dimirin, dîsan piranî kurd in!

Em ji malbatên Fehmî Demir û Mustafa Taşçi re sersaxîyê dixwazin. Mirina herdu welatparêzên kurd pir zû bû! Ev ne tenê bo we her wiha bo me gîştikan wendayîyeka mezin e!..

17/12an roja ala Kurdistanê, îsal li welêt û li seranserê welatên Ewrûpa ji aliyê kurdan ve hat pîroz kirin. Bi hêvîya hevkarî û yekîtiya hêzên Kurdistanê roja ala kurdî, 17/12, herwiha sersala 2016an bi hêvîya serkeftinê li hemû gelê me pîroz be!

Heta hejmara bê bimînin di xêr û xweşîyê de!

Alî Çiftçî

Êrîşa ser kurdên Kirşehîrê

Mem Xelikan

Ew sed sal zêde ye, ku Kurdên Anatolîya Navîn, bi kîjan sedemê dibe bila bibe (sûrgunî, aborî, bi destê zorê û hwd.) li heremê bi cih û war in. Ya em pê serbilind, wanan hetanî huro li heremê bi çand û zimanê xwe jîyan domandine. Digel hemû zor û zordestîyê, nasnameya xwe parastine, dîroka xwe ji bîrnekirine.

Kurdên Anatolîya Navîn, li heremê ne tenê asîmilasyon, car caran bi çûk-mezin rastî êrişên nijadperest ji hatine.

Îsal serokkomarê Tirkîyê, dûv hîlbijartina 7ê heziranê, ya ku HDP bi serkeftinê jê biderketî û erk (ikdidar) ji dest partîya wî AKP çû, pêvajoya çareserkirina demokratîk û aşîyê ya ku sê sal in berdewam bû bi dawî anî û got:

„Ew masa aşîyê wergerîya“ û dîsa dest bi şerê qirêj kir. Dîsa li Kurdistana Bakûr rojên zilm, zordestî û bixwîn dest pêkir û berde-wame.

Li 8ê îlonê 2015an, MHP li her bajarekî Tirkîyê meşek pêk anî. Dûv

wê meşê de, bi destê komên nijadperest, faşîst û bi alîkarîya dewletê êriş birin ser kurdan. Partî, mal û karcihên kurdan şewitandin û xirab kirin. Êrişên li bajarê Kirşehîrê he giran û hov bûn. Wê şevê, li bajarê Kirşehîrê êrişkar bi slogana; „şehîd namirin, welat parçe nabe“ derketin holê. Di erebeyên şaredarîyê de, ji bo ku êrişkaran berehev kin anons kirin. Bi navê *Osmanlı Ocakları* û *Ülkü Ocakları*, qasî 150 meri di dest de bîdonên neftê, êriş dan ser HDP, pirtûkxanya *Gül*, 4 karcih û 32 malên kurdan xirab kirin û şewitandin. Hinek meriyên ne ji bajêr, bi kirasên (işlig) gewr û listeya derên ku êrişê bidin ser di dest de, ji êrişkaran re rêberî dikirin. Polîsên dewletê jî, ew temaşe dikirin.

Min ji bo xwendevanên Bîrnebûnê, ji çend hevalên ji Kirşehîrê yên ku ew bûyerana jîyane, fikir û dîtinên wana yên li ser wê êrişa qirêj girtin. Hevalan, pirsên min bi nîvîskî û bi Tirkî bersiv dan. Min ji bo we, bersivên wanan qut kirin

Kitêpxana Gul piştî
êrişen nîjatperestên
tirkên li hember kurdan
li Kirşehîrê



û wergerandin Kurdî. Ji wan hevalan birêz Ahmet Çiçek mamoste ye û Tirk e. Birêz Mustafa Kahraman serokê KURD-DERa Ankarayêye. Birêz Demet Resuloğlu Çetin, hevseroka HDP yê bajarê Kirşehîrê ye. Birêz Servet Altuntaş mamoste ye. Birêz Eşref Odabaşı xwedîyê pirtûkxana Gul e. Birêz Cihat Beydoğan jî, xwedîyê di-

kana konfeksiyonê ye. Wan herçar hevalan bersîvên xwe, bi nîviseke hevpar şandin.

AHMET ÇİÇEK:

Her çiqaş navbera Kurd û Tirkên de, „Em, wek neynûk û goşt in“ were gotin û ji hevdu bûkan bigirin, navbera wanan de şer û arbede tune we jî, ewana ji alîyê rih de parçe bûne.



Ji ber navê xwe Diyarbekir e û xwedî kurd e!

Tirk (Heval Ehmed, Tirk e) ji bo têkilîyên civakî, aborî û feodalî her çiqas li cem Kurdan, li rûyên wan nan nebêjin jî, dûv wanan ve dev ji feodalî, qelleşî parvakarîya (*Bölücü*) wan bernadin. Şerê qirêj î ku navbera dewlet û PKK de berdewam e, bandora xwe li ser wê yekê heye. Şerê dewletê yî psîkolojîk wek; „*Apo kujerê dergûşa ye. Herema vî heye. Ew ne Kurd in, Yêrmenî ne. Keçên gerilla, dergûşên xwe li çîyan diavên têr û tûyan.*“ bandora xwe li ser wê heye.

Bi dîtina min; li Tirkîye ne pirs-girika Kurdan, pirs-girika nijadperestîya Tirkan heye. Bi dîtina dewletê an jî AKP, pêvajoya aştiyê fêda xwe ne bi AKP, bi Kurdan û PKK bû. Ji bo wê jî, carek din dest bi şerê qirêj kirin. Li vî welatî ol (dîn) û nijadperestî tim pera û prîmê dike. Wê rojê, ne Kîrşehîrê tenê li 400 derî zêdetir êrişên nijadperest pêkhatin. Bi gotina Ertugrul Kurkçu, “Çalekîyên weng, encax dewlet organizeke bike û pêk bîne.” Têyê gotin ku „Her dewletekê, karên wê yên qirêj û pelikên wê yen qirêj hene.“ Dewleta T.C. pelikên wê yên qirêj hene. Lê; pelikên wê yên pak hene, ya were minaqeşe kirin.

Berê li Çorumê, Meletîyê, Maraşê, li Sêwasê jî waya kirin. Lê;

yên ku ew êrişên nijadperest û qirêj kirin, wê wextê xwe vedişartin. Me huro dît ku; ewana êdî hewcetîya xweveşartinê nabînine. Eşkere dikine. Carekê bifikirin; Wê rojê, dikana esnafekî dişewitî. Li hember wê, walîyê bajêr milê xwe dayîbû milê muhtelakî narkotîkê, marşa îstiklalê dixwand. Huro, ewqas bawerîya wanan bi xwe heye. Faşistê ku çentekî dişewitî di dest de, çente avite Pirtûkxana Gulê û vegeirî polisê li paş xwe maç kir. Ya ku hûn bizanin; ew bûyerana, ne bi hîs û fikirên netewî û bi dest komek faşist, bi dest dewletê pêk hatin.

Me, êrişên weng dipan. Lê; ne viqas eşkere û giran. Dewletê ew bajara, 6 seetan da dest çend ser-serîyan û teslîme wanan kir. Dûv wê êrişê ve, navbera Tirk û Kurdan de tu guhertinên bi çavan werin dîtin pêk nehatin. Ji bo êrişên weng ve, dixwaze em xweparastinê pêk bînin.

MUSTAFA KARAMAN:

8'ê Îlonê sala 2015'an li bajarê Kîrşehîrê êrişên nijadperestî ji aliyê dewleta kûr ve pêk hatibûn. Di van êrişan de 20 – 30 dikan û malên Kurdan hatin şewitandin. Em bi heyetekê çûbûn li serdana wan. Tu cudatîya wê êrişê û ya Madimakê

tunebû. Ew feraseta faşîzmê bi xwe ye. Heta niha Kurdên Kirşehîrê dijîn, bi gelê ku li vî bajarî dijîn re wek biratî jîyan kirine. Tu pîrsgirekek di navbera wan de pêk nehatiye. Lê belê dema ku Kurdên Kirşehîrê dewlemend bûn, xwende bûn rastî erîşên wiha hovane hatin. Ez wan erîşan şermezar dikim. Ji gelê me ên livir dijîn re jî dibêjim ku, xwe bi rêxistin bikin, yekîtîyê di nav hev de çêkin. Ji bo azadî û wekhevîyê têbikoşin.

Agahdarîyên ji:

DEMET RESULOĞLU ÇETİN,

EŞREF ODABAŞI, SERVET

ALTUNTAŞ, CİHAT BEYDOĞAN

Kurd, 200 sal zêde ye li heremê ne.

Hêjmara wanan 1/3 e. Ji xeyrî 3– 4

gundan, gundên Kurd bi hev re sînorên xwe hene. Kurdên li heremê, ji çand ziman û nasnama xwe tiştek winde nekirine. Têkilîyên wana û Tirkên, piranî ji alîyê bazirganîyê ve ye. Ji alîyê zewacê ve, têkilîyên wanan ewqas ne zêde ye. Em, diherin dol– dawet û tazî (azcî) yê hevdu tên. Hetanî huro, ji alîyê bazirganî û mirovatîyê de navbera me de tu nerindi tune wûn.

Kurdan, kêngê têkilîyên xwe yê bi partîyên dewletê ve qetandin, bûne armancên wanan. Kurdan, berê xwe dane partîya xwe şûva, kujan partîyê, li bajêr vekîl an jî şaredarî winda dikir, bi ramanên wanan sedem û sûcdar Kurd wûn. Şer dawestî, pêvajoya çareserîya de-



Dûkaneka kurdan piştî erîşên nijatperestên tirkên, li Kirşehîrê

moqratîk û aştiyê destpêkir şûva Kurdan dengên xwe didan AKP. Dûv destpêkirina şerê Sûriyê û pêvajoya çareserîkirinê bi dawî hat, Kurd ji nû ve vegeyîyan partîya xwe. Dû buyerên 6 - 7 Cotmehê ve, vaxê zêde bû. Li meşên Alê û merasîmên meyîtê şehîdan, hersê partî AKP, MHP, CHP wek hev hêreket dikirin.

Berî hîlbijartina 7ê Hezîranê, Serokkomar û serokê MHP cara pêşîn hatin bajarê me. Ew, nîşana li bajarê destpêkirina tiştêkî wû. Ew ne teseduf e, ku DAIŞê ji bajarê me zêde eleman digirtin. Çimkî, hertiştêk eşkere dikirin. Dema ku şerê herî giran, li Kobanê berdevam wû, yê ji DAIŞê re meriv berhev dikirin, li navenda bajarê dest û pêyên xwe badikirî dişuxulîn.

Li çalekî û daxuyanî diyarkirinên HDP, berizînên devkî destpêkirî wûn. Paşê, mudeheleyên fîzîkî destpêkirin. Polisên dewletê, tu mudehele nedikir. Waya ye jî, ceseret dida wanan. Berî hîlbijartina Hezîranê, bi ser hatina hevserokê HDP Selahatin Demirtaş a Kirşehîre de, rengê buyeran hate guherînê. Êdî, li hemerî Kurdan, berizînên devkî şûna xwe da êrişan. Roja ku Selahatin Demirtaş hat, li

qada mitîngê eleqedarîya gel pîrr zêde wû. Beşdarên mitîngê zêde wûn. Komeke ku ala Tirkan di dest de, ji guhdar û beşdaran re dest bi zêf û heqeretên kirin. polîsan tu mudeheleyî wanan nekir. Dema wanan dest bi êrişê kirin, gelê me yî li qada mitîngê, ji bo xweparastinê rabû ser lingan û ew belav kirin. Gel, meşîya partîyê û kesek ji wan êrişkaran nêzikî partîyê nekirin. Wê rewzê, morala Kurdan gelek bilind kir. Ya êrişkaran jî, xirab kir. Waya jî, bû bîngeha buyerên 8ê Îlonê.

Êdî, Kurd li partîya xwe xwedî derdiketin. Dest ji AKP, berdayî bûn. AKP jî, Kurd ji çavan bîderxîstî bûn. Li berçavan bû, ku herdu gel ji aliyê hest û rihê de ji hevdu qetîya bûn. pîrr merivên, bi wan buyeran eşiyayî hebûn. Ji bo ku, tenê nasname ya vî Kurd e, pîrr kesên dikanên wanan şevitî hebûn. Yê dikan, mal û karcihên xwe hatine şevitandin û xirab bûyî, kesên ku li civakê dihatin hezîkirin wûn. Dikanên navê wanan Diyarbakir, Adiyaman hwd. ji bo ku werin xirabkirin bes wû.

Dest êrişkaran de ala Tirka, şîşeyên bîra, çay û kevîr hebûn. 150– 200 meriv wûn. Bîna HDP şewitandin, pirtûkxana Gül şewi-

tandin ji kesî tu astengî nedîtîn. Bi ser de ji polîsan alîkarî dîtîn. Bi ser wê de, ceseret hate wanan. Kom bi kom li nav taxa belav bûn û malên Kurdan xirab kirin. Di dest êrişkaran de, listeya derên werin şewitandin û xirabkirin hewû. Di nav êrişkaran de, yên pirr rindiyên me jê re heyî hebûn. Yên em çûyîne şîn û dawetên wanan, yên hatine li malên me bûyîne mêvan hebûn. Ji vanan hinekan, ji êrişkaran re rê-beri dikirin. Wê ye, em şoq kirin, em pirr êşandin. Hevalên wê şevê, bi telefonan li me gerîyayî û bi bûyeran nexenê, nedilşa û pirr êşayayî hebûn. Hevalên ji MHP, li me geriyayî û gotin:

"Bi dere derve nekevin. Xwe bi-parêzin. Em ê, sibê çawa li rûyên we binêrin? Em ê, ji ber xwe ve fedî dikinî." jî hebûn. Wanan, em dilşa kirin.

Ji parastinên êrişên wisa, dixwaze gelê me tedbîra xwe bigire. Çimkî, dora dine rojê gel li heremên

dor— paş partîyê ji bo êhtimalên ku êrişkarên carek din werin, tedbîra xwe girt û ewana çavkirin. Êdî herkesekî dizanî, ku bûyerên hê mezinê werine hole. Gel, ji sibê de hetanî êvarê saet 20.00 an benda wanan bi amadekarî pa. Dihate guhên me, ku yên êrişê bidine ser gundan. Gundîyan jî, bi amadekarî tedbîra xwe girtiûn. Roja siftê, me xwe bi tenê didît. Roja dudiya, me dît ku gelê me bi amadekarî xwe dayê kêleka me. Waya wek peyamekê, çûyîbû guhên êrişkaran. Newêrîn carek din werin. Tedbîra ku dewletê roja siftê negirtî, roja dudiya girtibû. Tişteki me yî, em windakin tune wû. Ji bo ku, em malê xwe, canê xwe biparêzin dixwast em xwedî rêxistin sazî û qam (gûc) bûna. Wisa jî bû.

Em, bawerin carek din êrişek wisa pêk were bêgerew namîne. Her kesek, ji bo hertişteki amade ye. Ya em bikinî herî baş, xwe sazkin û ji bo parastinê tedbîr girtine.



Gundê Qadioğlu

Muzaffer Özgür

Rûniştvanê gundê Qadioğlu Kurd in û ji eşîra Canbega ne. Dema tîn Anatoliya Navîn nêzikî gund li cîhê ku pê ra *Ēk* tê gotin cîh û war dibin. Ew cîh xerebe ê kevnerûniştvanên berê yê Anatoliyê bûye. Çend sala bi şûnda tîn cîhê gund yê niha û gund ava dikin.

Gundê Qadioğlu giredayî qezaya Sarayönü ya Konya ye. Ji bajarê Konya 110 km. û ji Sarayönü yê jî 60km. dûr e. Qadioğlu, di sala 1907an de zozana (yayla) gundê Xatirliyê bûye. Gundîyan keriyên xwe yên pêz hebûne û wek kurdên Anatoliya Navîn yên din bi pez re mijûl dibûne. Gund ji sala 1901an de heta sala 1927an giredayî Akşehirê, paşê derbasî ser Cihanbeyliyê û di sala 1976an da jî derbasî ser qezaya Sarayönüyê bûye. Di sala 1992an de bûye belediye. Ji bo navê gund bi du versiyona hekatê gotin.

Ya yekemîn; Li ser gotineka mezinên gund; rojeka zivistanê pir berf dibare. Jin ya xûdiya erdê zozanê û malbata xwe tîn zozanê.

Dema lawikê jinikê ji hespê xwe peya dibe û li ser berfê dimeşe, bîra bin berfê de nabîne û dikeve bîra avê û dimire. Ji wê bûyerê bi şûnda ji cîhê vir re bi tirkî Kadınoğlu tê gotin. Salan bi şûnda nav di nav gel de dibe Qadioğlu.

Versiyona duyemîn jî; Zivistanê pir berf dibare. Rêvîyên lavê qadiyê Akşehirê ji ber dûpiyê rêya xwe şaş dikin û ten gund. Lawê qadi dema tîn nezikî bîra avê dibin ji ber pîrbûna berfê bîra avê nabîne û dikeve bîrê û dimire. Ji bûyere bi şûnda ji vir re qadioğlu tê gotin.

Hejmara rûniştvanên gund li dor 2000 kesî ye. Koçberiya berva Avropa hîn jî berdewam e.

Dema şere 2min yê cîhanê Profesore Alman Walter Ruben (26.12.1899 – 7.11.1982) diçe Tirkîyê û li zanîngeha Ankara di Fakûlteya Ziman, Dîrok û Erdnîgariyê de kar dike. Sala 1946an de li dor gundên bakurê Konyayê lekolîneke dike. Di lekolîna xwe de li ser gundê Qadioğlu jî agahdariya dide.



ANADOLU'NUN YERLEŞME TARİHİ İLE İLGİLİ GÖRÜŞLER KOÇHİSAR'IN TUZ GÖLÜ BATISINDAKİ STEP KÖYLERİNDE 1946 EYLÜLÜNDE YAPILAN BİR ARAŞTIRMA GEZİSİNİN SONUÇLARI

Dr. W. RUBEN (Hindoloji Profesörü)

80 haneden ibaret olan Kadı Oğlu köyü 1891'de 8 Kürd ailesi tarafından kurulmuştur, Bu adın hangi „Kadı,,nın „oğlu,, na izafetle verilmiş olduğu hakkında kimse bir şey bilmiyor. Burası da eskiden Hatırlı adlı köyün bir yaylası halindeydi. Köylülerin kendi iddialarına göre, bunlar vaktiyle Türkistan tarafından gelmiş olan Türklere; ve bunlar gelirken İranda bir istirahat molası vermişlerdir. Bu sırada inekleri yorulmuş olduğundan burada kendilerine „İnek Yeri, manasına gelen Gavestiya, demişlerdir. Kadı Oğlu köylüleri eskiden siyah keçi kılından yapılan çadırlar içerisinde otururlardı. (Bugün hâlâ göçebe hayatı sürmekte olan Yürükler de bu siyah keçi kılı çadırları içindedirler). Haddizatında çok fakir bir köy olmakla beraber, köyde en fakir olanın bile, 2– 3 kısımda olmak üzere 15– 20 dönüm kadar arazisi vardır. Ve daha fazla toprak ekmek isteyene,

köy hey'etinin müşterek kararı üzerine mer'adan tarla sökölüp verilebilmektedir. Kombinalarla köyün hududu olmadığından, bu hususta köylünün şikâyeti de yoktur. Ve mer'a sıkıntısı bulunmamakla beraber yine de köyün 12000 başlık koyun adedi 1945 yılı zarfında 4– 5000 başa düşmüştür.

Kadıoğlu köyünde de bize Konstantin'e ait ve üzerinde işareti olan bir para gösterdiler. Paranın bir tarafından da Micinius adında birisinin resmi vardır. Eski taş sütunların kırılmış kısımlarını bugün hemen Anadolunun her tarafında, düz toprak damların üstünü muayyen zamanlarda bastırmak ve sertleştirmek için kullanırlar.

Kadı Oğlu köyü camiin minaresi yoktur ve onun yerine camiin batı yanından olmak üzere taştan bir merdiveni vardır. Merdiven dama kadar götürür.“

Çavkanî: Foto: www.sarayönu.gov.tr www.kadioglu.org.free.com

Ankara Üniv. Dil ve Tarih– Coğrafya Fakültesi Dergisi; cilt V, sayı; 4 / Eylül– Ekim 1947 sayısı

Cangorîyên Qerecedax, Qirqışla û Zengenê ya Konyayê^(*)

Mulla Ceran

Me, ew dildayiyên azadî, biratî û aştiyê yên qenc û wêrek bi tevayî ber bi oxira nemirî û bêdawîtiyê ve kirin. Ev mirovên qenc û bedew, cangorîyên azadî û demokarsiyê ne. Sedema xwefedakirina wan, tenê daxwaza jiyaneke pevre û mirovanebû. Ew, cangorîyên(şehîdên) me yên demokrasî û azadiyê ne û wekî Stêrka Qurixê, rê şanî me didin.

Hêza me ya birêxistî, biryardariya me û têkoşîna me ya ji bo demokrasiyê, di oxira aştiyê de, dê li ser vê erdnîgariyê, xweseriya demokratîk pêk bîne û me bigihîne roja azadiyê. Ji bo ku em êş û jana van heval û hogirên xwe hinekî sivik bikin, divê ku pêşî em xwe li benê azadiyê bipêçin. Em ê Tirkiyeyek demokratîk a ku wekhevî, azadî û pevreyiya gelan diparêze pêk bînin û biafirînin. Ji bo ku dawî li vî şerê qirêj were, divê careke din gelên qedîm ên ku li ser vê


xakê pevre dijîn, tu carî din neyên peşberî hevdû û qet pev neçin.

Peywira hikûmeta AKP'ê, ecîqandina muxalefeta demokratîk e. Mafê jiyane nade tu reng û dengên cuda. Hêzên biqirêj ên şerxwaz û zorker (dîktator), bombe bi ser kesên ku beşdarî mitîngê bûbûn, barandin. Dixwest ku bi vê yekê hemû rengên keskesorê û dengên cuda yên ku ew dîn û har kiribûn, bibire. Mexsed û armanca Gladîyoya Şer, çewsandin û têkbirina kesên aşîxwaz, demokrat û mafparêz e. Dijmin û dijberê wan ne kesên diz û rantxwir in ew her gav li hemberî kesên ku doza maf û dadê (edaletê) dikin û dengê xwe bilind dikin û dibêjin “Êdî Bes e!” girtin, kuştin û qirkirinê pêk tînin. Mirovê desthilatdar dibêje “Ez çi bikim ez ê bikim. Ez ê gelê kurd, mirovên pêşverû, şoreşger û yên ku li hemberî min derdikevin, li ber xwe didin û serî natewînin û hwd.

* Orjînal tirkî hatiye nivîsîn. Adar Jiyan wergerandiye kurdî.



Şîrîn Kiliçalp



Fatma Karabulut



Gulhan Elmascan

beciqînîm bigirim, têxim hebsê.
Tu kes nikare lêpîrsînê bike. Tu
kes nikare ji min xeber bide. Tu kes
nikare bi min re hesab bibîne. Yên
tiştêkî wisa bikin jî ez ê digel dest

û lingên wan parçe parçe bikim û
mêjiyê wa li nava bajarê Enqereyê
belav bikim. Ji bo wê, divê her kes
aqilê xwe bide serê xwe û li cihê
xwe rûnê!”

Divê ev yek neyê jibîrkirin; ku gelê kurd gelekî mezlûm û mexdûr e (stembar û xedirlêbûyî ye). Pir li ber xwe û rûmeta xwe dikeve. Ji do û heta îro tu carî li hemberî zordest, xwînxwar, desthilatdar û sultanen serî netewandiye. Gelê kurd, gelekî qedirnas e; şert û merc çî dibin bila bibin, tu carî kesên ku pê re dostanî û biratî danîne li nivê rê nehiştiye. Em di-karin ji dîroka borî jî gelek mînakên baş bidin.

Gelek kurdên ku beriya niha bi sedan sal, ji ber gelek sedemên cuda ji Kurdistanê derketine, hatine li Qulu, Canbegî, Haymana, Yunak û Polatliyê bi cih û war bûne. Û ev der ji xwe re kirine meskenê bav û kalan. Bi taybetî kurdên Qulu û Canbegî, xwebûna xwe ya neteweyî, çand û zimanê xwe ji bîr nekirine. Gelek ciwanên kurd, di nav Tevgera Azadiyê de cih girtine, tevî refên gerîla bûne û şehîd ketine.

Li aliyê din di komkujiya Enqereyê de biraziya kedkarê perwerdeyê Mustafa Taşçı ê ku ji Qerejdaxa Quluyê ye, Şîrîn Kiliçalp; dîsa Fatma Karabulut a ku ji Qirqışelaya Canbegiyê ye; û her

wiha kedkara perwerdeyê Gulhan Elmascan a ku ji Zengena Eregliyê ye, canê xwe dan û beşdarî nava karwanên cangoriyê aştîyê bûne.

Her sê cangoriyên aştîyê yên ku di komkujiya Enqereyê de canê xwe dan, her gav li hemberî bişavtin (asîmîlasyon), înkâr nîjadkuji (jenosîd) û tunekirinê li ber xwe dane û di hemû civîn û komcivînan civakî de bi zimanê xwe axivîne û ew parastine. Ev hersê şitlên aştîyê, bengiyê azadî, biratî û demokrasîyê bûn. Mamoste Şîrîn û Gulhan, ji bo ku ji xwedkarên xwe û nîfşê bê re cîhaneke aştîyane û mirovane bihêlin, canê xwe feda kirin. Cangoriya din Fatma Karabulut jî ji Qirqışlayê koçî Stenbolê kiribû. Û li Stenbolê di nava Rêveberiya HDP'ê ya navçeya Uskudarê de cih girtibû û ji bo demokrasîyê têdikokoşiya Çalkagereke girîng a Tevgera Jinên Azad bû. Hersê cangoriyên me jî bi bîr û bawerî û biryardarî tevdiageriyan. Parêzavanê mafê mirovan û têkoşerên aştîyê bûn.

Em sond dixwin û soz didin ku em ê ala wan a azadî, aştî û demokrasîyê li erdê nehêlin. Û em ê wê alê berztir û bilintir bikin.

Dawetên kurdên Anatoliya navîn ên reşîyan

Fatoş Koyuncuer

Amadekirina dawetan berê girêdayî kelecaneke mezin bû. Malbatên bûk û zavayî bi awayekî gelekî taybet dest bi hazirîyên xwe dikirin. Yek bi yek li ser her tiştî dihat fikirandin. Heta ku roja dawetê dihat, mala zava salê du— sê caran diçû serdana mala bûkê. Wek mînak; loqimê bûkê dixwarin. Di wê derheqê de, pirî caran li ber dahol û zirneyê yan jî li ber dengê teybekê li mala bûkê govend digirtin û li wir şêranî dixwarin. Pişt re loqîmê ku ji ber dima, dikirin paket û didan yên ku çûne loqimxwarine. Ji wê zêdetir, di cejnan de ji bûke re diyarî dibirin û bi wê re cejna xwe pîroz dikirin yan jî dema pezbirînê jê re hirî dibirin ku bûk pê rihela xwe dagire (ava bike). Bêguman hirî neşuştî dibû her dem. Bûkê ew bi jinên malbata xwe re li ser erxê dişuşt. Piştî ziwakirina hiriyê, hemû tiştên wek balîf, mînder, lihêf û hwd. ku divê werin tijekirin, pê dihatin tijekirin.

Berê hirî boyax jî dikirin ku pê tevnan bikin. Ji bo vê, li ber kaniya gund beroşên mezin didan ser

tifikê û hirî tê de boyax dikirin. Bes av û boyax dixistin hundirê beroşan. Bi awayekî darekî hirî lê hatiye pêçandin, hêdî hêdî dixistin nav ava kel û derdixistin, heta ku ji rengê wê bawer dibûn. Kanî giring bû ji ber ku piştî boyaxkirine, hirî heta ava wê li ser zelal dibû carî dikirin. Ji karê boyaxkirina hiriyê re digotin „*oreng kirin*“. Hirî rengûreng dibû. Tê bîra min em, zarokên gund, li nav beroşan digeriyan û me ji xwe re ji her rengî hirî kom dikir û vedişart. Hiriya rengûreng ji bo dagirtina balîf, çekirina galt (kilîm) û xalûcîlan dihat bikaranîn.

Amadekirina rihela bûkan karekî gelekî bi zehmet û dijwar bû. Yek û yek her tişt bi dest dihat çekirin. Pirî caran xizmên bûkê jî diketin nav amadekirina rihelê. Bi coş û herwiha ewqas jî bi tengezarî çêdikirin.

Dawet tim li piştî hasilê dihatin kirin. Digotin bila hemû kar ji dest me derkevin, em ê hingê dest pê bikin û bêguman pereyê ku wan ji hasilê digirtin jî, ji wan re lazim dibû. Mala bûkê du— sê rojan di ber hilawestina alê re, ya dihat wa-



teya destpêkirina dawetê, bang li cîran, heval û xizmên xwe dikirin ku bê werin ser „*saroqî*“. Saroqî pêşkeşkirina rihela bûke ye. Ew rihela ku bi pûte hatibû amadekirin, bi awayekê pêşangehê dihat pêşkeşkirin. Cîran, heval û xizm dihatin rihelê xêr dikirin û diyariyên bi xwe re dianîn, dixistin nava wê.

Di roja yekem a dawetê de, rihel tê berhevkirin û buxçik (çikin) tên amadekirin. Aliyê bûkê ji malbata zavayî re yek bi yek (ji xesî, xezûr, xwişk û birayên zavê û ji jin û mêrên wan û xal, ap, met û xaltîkên zavê re) buxçikan dadigrin. Tiştên din jî bi pûte tên pêçandin. Di roja hineyê de rihel ji mala zavayî re tê şandin.

Wexta ku li mala bûkê ew karûbar û hazirî tên kirin, mala zavayî jî ji aliyê xwe ve haziriyên

xwe dike. „*Bajarê bûkê*“ distînin û wan li odeyekê jê re bi hev da dikin. Bajar ji odeya razanê, ji dolab, ref/vitrîn û her wiha tîkberên spî (sar-ker, makîneya dirûtinê hwd.) pêk tê. Mala zava bi awayekî pêşangehê bang li kesî nake lê dîsa jî gundî, heval û xizm diçin mala wan û li bajêr dinêrin.

Dawet bi piranî di rojeke pêncşemê de, bi hilawestina alê û „*nanê bayrokê*“ li mala zava dest pê dike. Berê, xwarin li mala zavayî dihat kelandin, îro pirî caran ji navçeyê tê xwestin. Dawet roja pêncşemê û îne bes li mala zavayî tê pîrozkirin. Ji bilî govend û xwarinê pir tişt nabe. Pirî caran roja îne êvarî, bûk û çend xizm û hevalên wê ji bo saetek – du saetan tên nav dawetê. Roja şemiyê tim roja hineyê

bû û hîn jî wisa ye. Bûk nîvro diçe cem kuafor û pişt re li malê li hêviya „*bineciyan*“ (hemû kesên ku diçin mala bûkê) disekîne. Ew derdora esrê diçin mala bûkê. Li wir govend tê girtin û şêranî tê xwarin. Berî mala zava vegere, çend jin ji bo ku dawet bi oxir be, ji mala bûkê tişteki xwe yî biçûk wek qedeh û tepsî, didizin. Ji aliyê zava jî çend kes wê rojê li mala bûkê diman û sibetir bi bûkê re vedigeriyan mala zava.

Di roja hineyê de, herwiha rihela bûkê li erebeyan tê barkirin û çend jin pê re diçin mala zava ji bo ku wî bi cih bikin. Ji karê wan jinên ku bi rihelê re diçin mala zava re dibêjin „*xanî çokme*“. Ew jin ji bilî ku rihelê bi cih dikin, odeya bûkê û odeyekê jî ji xesî û xezûr re bi rihela wê dixemîlinin.

Roja şemiyê êvarî li ber mala bûkê bi coş û kelecaneke mezin hine distirên. Wê êvarê li mala bûkê keç û bûk destên xwe hine dikin û pirî caran bi bûkê re heta sibê karûbarên wê yên ku maye, digihînin dawiyê. Di roja dawiyê de, yanê roja yekşemê sibê zû bûkê dibin navçeyê ji bo ku xwe li cem kuaforekî bixemilîne û pişt re jî li cem wênekêşekî wênayên xwe bigre. Li wir kevneşopiyek heye ku du

– sê kesên ji aliyê zava û bûkê, bi wan re diçin kuafor û wênekêş. Ew kes pirî caran xwişk, xwarzî, zeyî yan jî cawiya bûk û zavayî dibin. Pişt re bûk dîsa tê mala bavê xwe û heta ku mala zava derdora nîvro tê û wê derdixe, xatirê xwe ji malbata xwe dixwaze. Berê, dema ku li şûna orkestreyan stiranbêj, dahol û zirne hebûn, wan li ber mala bûke, dema bûk jê dihat derxistin, li zaravaya bûkê dixistin. Zarava ango stran gelekî xemgîn bû û divîbû bûkê bigda gîrî.

Bira yan jî biraziyên bûke li ber zavayî derî digirin û heta ew pereyên dixwazin nede wan, derî venakin û bûke bernadin. Pirî caran mala zava û zava li ber deriyê mala bûkê pir bazarên dirêj dikin. Dema ku bûk tê berdan, ew kesên pê re çûbûn kuafor jî, hevaltiya wê dikin û diçin mala zava û ger pêwîst bû, heta êvarê li wir li cem wê disekinin. Berî ku bûkê dibin mala zavayî bi erebeyan li gund û herwiha li derdora goristana gund digerin û bi awayekî serdana xizmên xwe yên mirî jî dikin û bala wan jî dikşînin ser daweta xwe. Begûman çûyina wan gelekî diajo ji ber ku zarokên gund rêya wan digirin û ji bo vekirina rêkê ji wan pere distînin.



Dema ku li ber mala zava bûk peya dibe, tepsiyek tije pereyan hûr û savar li ber lingên we dikin. Ew kevneşopiya bi pereyan û savarê nîşaneyê rehmê (bereket) ye. Belavkirina wan ji bo zarokan gelekî bi coş e, ji ber ku li ber lingên bûk û zavayî li ser wan pereyan kom dikin, pev diçin. Tiştêkî herî balkêş jî ew e ku bûke nabin mala xezûrê wê, lê dibin mala cîran an jî tiyê wê. Bûk heta êvarê li wir disekîne û piştî mehra mele diçe mala xezûrê xwe. Piştî ku bûkê li wê mala ew lê peya dibe, pêşî dergûşeke biçûk didin dest wê û wisa hêvî dikin ku zû zarokên wan çêbibin. Bûk ji çenteyê xwe pereyan derdixe û dide dayika dergûşe. Zava bi piranî li mala xwe li hêviya bûkê

disekine. Zarok meresê bûkê ji zava re û yê zava jî bi bûkê re dibin û wisa pere kom dikin. Herwiha balîfa bûkê jî didizin û dibin ji zava re. Heya ku ew pereyan nede wan, balîf azad nabe. Xezûr jî pereyan dide yên ku alê ji dar dadixînin. Yanê di roja dawî de gelekî pere tên belavkirin. Wê rojê bi dayîna nanê nîvro yê ku jê re „*nanê bûkê*“ tê gotin, êdî dawet giran giran diqede. Xizmên mala zava yên ji dûrê hatine diçin. Hin ji wan dimînin û bo paqijkirina malê alîkarî dikin.

Bûk û zava jî derdora esrê tev li hev nanê bûkê dixwin û herwiha ji bo wê sifreyê jî pêwîst e pereyan bidin û birçî nemînin. Êvarî piştî mele mehra dibire, bûk ji bo ku

bi oxir be, ji mala ew tê de ye heta mala xezûrê wê misînekî tije av bi rê de li erdê dike. Berî ku cara yekem bikeve hundire mala xezûrê xwe tiliya xwe di rûn da dike û di eşka (şemûga) derî dide. Dibêjin ew ji bo rûnermiya bûkê ye. Yanê wisa dikin ku bûk rûnerm be. Bûk sibeha din gelekî zû şiyar dibe û pêşiya malê rêş dike ku cîran û nas wê bibînin. Pişt re sifreya xezûr û xesiya xwe amade dike û giran giran bi zeyî yan jî cawiyên xwe re dest bi karên din dike. Di hefteyên pêşîn de bi piranî jî di hindirê sala bûkbûnê ya yekem de, bûk divê her dem zêr û zîvên xwe bi xwe ve bike ku yên tên serdana wê, wan bibînin. Di hefteyên pêşîn de herwiha pir kes tê û çaya bûkê vedixwe. Ew kes, pêwîst in ku pereyan bixin navbera qedeh û binkê qedehê. Bûk ji wan re, ji bilî çayê sifreyeke bi şêranî jî radixe.

Di hefteyên pêşîn de, cîran û xizmên mala zava û bûkê bang li wan dikin û ji wan re nanî (nên) çêdikin û wisa wan xêr dikin. Bûk piştî du— sê rojan bi zava û çend meriyên din re ji mala wî diçe *bavanên* xwe. Li wir ji wan re nan tê çekirin. Herî dawîn piştî du hefteyan bavanên bûkê bi piranî qerebalix tên malxêrkirine. Malbata

bûkê ji wê re çend alavên ku bi wê lazim bin, tînin ji wan re.

Her çiqasî ew kevneşopiyên me yên êşîra reşîyan bêhempa jî bin, mixabin îro piraniya wan winda bûne. Wek mînak; ew 15 sal zêdetir e ku kes li gundan êdî boyaxkirina hiriyê nake û kes tevnan jî ranaxe. Ji wê zêdetir *destrîsandin* bi tevahî winda bû. Berê, di ber dawetê re destrîsandina keçikên destgirtî pîroz dikirin. Di derheqa destrîsandinê de xizm û nasên zava û bûkê diçûn mala bûkê, li wir nan û şêranî dixwarin û ji bûkê re diyariyên wek cilûberg û qûmaş dibirin. Êdî rihelên bûkan wek paketan li navçe û bajaran tên firotin. Pir ji wan tiştên destkariyê nemane mixabin. Dawet îro li şûna çar rojan bes du rojan diajon. Îcar rewşa dawetên bajaran hîn xiraptir e; dawetên bajaran êdî ne li mala zavê, lê li salonan bi pîrozkirineke sê çar saetan bidawî dibin. Herwiha êdî kes naçe odeya bûkê jî naxemilîne.

Wekî her tiştêkî ku dibe qurbana jiyana rojane ya modern, ew kevneşopiyên me yên yekta jî winda dibin û kes xweziya xwe pê nîne. Dîsa jî em ê hêvî bikin ku ew wek gelekî tiştên rojane bibin mode û ji nû ve werin ecibandin û bikaranîn.

Hinek rêzikên zimanê kurdî– kurmancî

-II-

Hesen Huseyîn Deniz

A– Rêzikên ji bo tîpan:

Tîpên Kurmancî 31 lib in. Mirov dikare tîpan bi vî awayî ji hev cuda bike:

1)– Tîpên dengdêr: a, e, ê, i, î, o, u, û

2)– Tîpên dengdar: b, c, ç, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, ş, t, v, w, x, y, z

3)– Tîpên pevdeng: xw, (çw, kw, gw, tw)

xw: `xwîn` wekî `xûn`, `xwişk` wekî `xuşk` angî `xûşk`, `xweş` wekî `xoş`, `xwar` wekî `xar`;

`xwir` wekî `xur; teyrên laşxwir angî teyrên laşxur?

Xwirandin, xwerandin, xurandin?

çw: `çwîk` wekî `çûk`;

kw: `kwîr` wekî `kûr, kwir, kur;

gw: `gwîz` wekî `gûz` angî `goz`

tw: `twîj` wekî `tûj` angî `tîj` dinivîsîn û tînin ser zimên ku çewt e, ji ber ku dengderxistina peyvên kurdî diguherîne. Divê li ser vê yekê zimanzanên kurdî li hev bicivin û gengeşe bikin. Gelê kurd

dibêje, „ezê gwîzekê bixwim“, an dibêje „Ezê gozekê bixwim“, an jî „Ezê gûzekê bixwim“? Ev yek bi her sê awayan sê dengên cuda derdixîne û her nivîskarek angî nûçegihanek li gorî devoka xwe an jî li gorî bîhîstina guhê xwe, awayekî ji vana bi kar tîne. Mixabin awayekî hevbeş tineye û divê ev yek ji bo van tîpan were zelalkirin. Li gorî pirtûkên rêzimanî yê hinek Instîtuyên Kurdî qala tenê tîpeke pevdeng dikin û wekî „xw“ diyar dikin. Lê wê demê „çw“ ya çwîk, „kw“ ya kwîr, „gw“ ya gwîz, „tw“ ya twîj, em bixin ku derê angî wekî teşeyê wê hatiye xerakirin, em nebêjin çwîk, em bêjin çûk, em nebêjin kwîr, em bêjin kûr, em nebêjin gwîz, em bêjin gûz?

4)– Tîpên bi awayê hişk û nerm tînin gotin: k, t, ç, p

k: ker (sewalek), ker(r) (ê/a nabihîse), kar (xebat), kar (karik), ka? (li ku?), ka (pûşê zêd),

t: ta (sermegirtin), ta(dezî), tor (tevn), tor (herêmeke Mêrdînê), teng (ji bo şidandina kurtanê ker, hesp hwd.), teng (ne fireh), tîr(bi

kevanê re tê bikaranîn), tîr (ne rohn),

ç: ço (dengderxistina ji bo ajo-
tina kerê), ço (darê lêdanê), çir (ji
çirandinê), çir (nayê cûtin), çil (hi-
jmarek), çil (dilbijîna xwarinê),

p: par (tişta tê beşkirin, parî),
par (sala çûyî), pêl (hilbûna ava
behrê), pêl (ji pêlêkirinê),

5)– Di tîpan de dubareki-
rina dengdêr û dengdaran: Tîpên
dengdêr dikarin werin dubareki-
rin, lê ji bo tîpên dengdar dubare-
kirin pêwîst nake. Herçiqasî hi-
nek peyvên dişibin hev hebin û di
nivîsandinê de dibe pirsgirêk jî lê,
di anîna ser zimên de dengê cuda
derdixe. Mijara dubarekirina tîpên
dengdar divê were gengeşekirin.
Ji ber ku dema dengdêrek du cara
were nivîsandin, li ser tîpa serî
bandorê çêdike û wê tîpê hişk-
tir dike. Mînak: ker: di wateya ajala
barkîşandinê de. Kerr: di wateya
kesê guhê wî nabihîse de. `k` ya di
`ker`ê de nerm e, `k` ya di `kerr`
ê de hişk e. Ger tîpa `r` a hatiye
dubarekirin were rakirin jî, divê ev
hişkbûn û nermbûn were parastin.
Lê kesekî kurdî ne ji dayika xwe,
bi xwendin û nivîsandinê fêr dibe,
wê ji ku binase? Divê ev yek bi per-
werdeyê were fêrkirin û têgihiştin.
Ger ev yek di anîna ser zimên de

dibe pirsgirêk wê demê divê rêzika
ku dibêje `tîpên dengdar nayên du-
barekirin` were guhertin û li şûnê
bê pejirandin ku `tîpên dengdar
dikarin werin dubarekirin`.

6)– Tîpên kelijandinê: y, (h, k,
t, w)

her çiqasî tîpa kelijandinê bi pi-
rahî wekî „y“ tê nasîn û bikaranîn
jî, gelek caran tîpên k, t, w jî weynê
kelijandinê dilîzin û di kurmancî
de tên bikaranîn. Mînak:

şîna¹, keska¹, bira¹, serser¹,
du²wem, duyem ...

7)– Ketina tîpan: Di kurmancî
de pirahî tîpa `i` tê ketin. Mînak:
`sitêrik` dibe stêrk, `şikeft`, `dibe
`şikeft` angû `şkeft`, `çirûsik` dibe
`çrûsk`, `birûsik` dibe `brûsk`, `ki-
lofir` dibe `klofir`, `girover` dibe
`grover` ...

Ev yek zêdetir ji ber herikîna
deng pêk tê. Bi pirahî di kîteya
yekem de, gava “i” jê dikeve, du
dengdarên dimînin wekî pevdeng
deng derdixin û ev yek jî herikîna
diafrîne. Mînak: şik dibe şk, çir
dibe çr, bir dibe br ... wê demê di
peyvê de hijmara kîteyan kêr dibe
û kîteyên bi pir- tîp derdikevin
holê: şi- keft ji du kîteyên 2+4 pêk
tê; şkeft ji kîteyê 5 tîpan pêk tê.

8)– Tîpên dengkin û yên
dengdirêj: `i`, `e`, `u` dengê kin

derdixînin, pêwîstî bi dirêjkirinê nabînin. Lê gava kum tê ser wana, vê carê dengê wana dirêj dibe. Mînak: `bir`, `bîr`, `kir`, `kîr`, `mir`, `mîr`, `sir`, `sîr`, `tir`, `tîr`; `ber`, `bêr`, `der`, `dêr`, `fer`, `fêr`, `ger`, `gêr`, `her`, `hêr`, `ker`, `kêr`, `mer`, `mêr`, `ner`, `nêr`, `per`, `pêr`, `şer`, `şêr`, `ter`, `têr`, `wer`, `wêr`, `zer`, `zêr`; `kur`, `kûr`,

9)– Dengên nêzî hev: v, f w; c, j, ç; b, p; d, t; q, k; h, x;

Di anîna ser zimên de, li gorî herêman û devokan, dîsa li gorî fêrbûna ji dayikê ango ji der ve, guhertin tên çêkirin ku ev yek ahenga zimên xera dike. Mînak: `heval` wekî `hewal`; `serkeftin` wekî `serkeftin` ango `serkewtin`, `bi-vir` wekî `biwir`; `berûvajî` wekî `berûfajî` dibêjin û hinekên li ser zimên ne serdest wiha wekî ji devê wan derdikeve dinivîsînin jî. Dîsa `cejn` wekî `çejn`; `xirûcir` wekî `xirûjir`; `cerdewan` wekî `çerde-wan` ango wekî `jerdewan`; `birinc` wekî `birinç`; `cîran` wekî `jîran` tînin ser zimên û ahenga zimên xera dikin. Dîsa `dolab` wekî `dolap`; `derb` wekî `derp`; `derd` wekî `dert`; `merd` wekî `mert`; `mivred` wekî `mivret` ango `mifret` bikar tînin ku çewt e. Dîsa, `qurs` wekî `kurs` ango

`kûrs`; `kongre` wekî `qongre`, `konferans`, wekî `qonferans`, `komîte` wekî `qomîte`, `biriqîn` wekî `birikîn`, `sixte` wekî `sihte`, `serxwebûn` wekî `serhebûn`, `xêr û xweşî` wekî `xêr û hiweşî` ji dev derdixin ku çewt e.

10)– Tîpa `h` ji aliyê dengderx-istinê ve di kurmancî de xwediyê cudahiyan e. Mînak; `h` ya di `hêlîn` ê de û ya di `herî` yê de dengên cuda derdixin. `h` ya di `hêlîn`ê de zêdetir hilmîn û sivik e, lê ya di `herî` yê de kêmhilmîn e û hinekî tê pêlêkirin.

11)– Tîpa î gava berya tîpa `y` were, dibe wekî `iy`; ji ber ku `y` wekî nîv dengdêr tê hesibandin. Mînak derî: wî deriyî bigire. Sêwî: Li wî sêwiyî xwedî derkeve.

B)– Rêzikên ji bo navdêran:

1)– Navdêr di Kurmancî de wekî navdêrên serenav û navdêrên heve-nav tên navlêkirin.

Navên serenav: navdêrên ku li cîhanê tenê yek jê heye.

Mînak; navê kesekî/kesekê; ji ber ku ew kes tenê ye (navên mirovan), navên bajaran, navên welatan, navên parzemînan, navê demsal û mehan, navê rojan, navê sazî û rêx-istinan, navê dewletan, navê çem, gol û behran, navê çiya û deştan, navên nijadan, navên pirtûk, fîlm,

bername û hwd. navên heyîneyên ezmanî wekî stêrk, gerestêrk, hîv, roj û hwd. divê wekî serenav werin nasîn û nivîsîn.

Mînak: Gulîstan, Dewran, Amed, Mêrdîn, Kurdistan, Swîsre, Asya, Ewropa, Havîn, Zivistan, Adar, Nîsan, Duşem, Sêşem, Saziya Perwerdehiya Dibistana Sere-tayî, Komeleya Hîndekariya Kurdî, Dijle, Firat, Gola Ormiyê, Behra Wanê, Çiyayê Cûdî, Çiyayê Araratê, Deşta Cizîrê, Bêrîka Mêrdînê, Kurd, Erebi, Faris, Hêvî Her Dem Heye, Anabasis, ...

Navên hevenav: Navên ku derveyî navên serenav ango navên ji her cureyê gelek hene. Mînak; navên ajalan, navên dar û beran, navên beş û libatên laşê mirov û ajalan, navên alavên malê û têperînê, têgih û biwêj, pîşe, navên kincan, navên xwarin û vexwarinan, navên reng û hijmaran, navên peyvên demîn û pirsyarîn,

Mînak: bizin, karik, gur, rovî, berû, gwîz, sêv, hirmî, dest, ling, mil, xurfe, dolab, sênî, kevçî, erebe, peyv, lêker, hevok, tîrşik, şorbe, sor, zer, kesk, yek, du, sê, îroj, sibe, sala bê, kengî?, çima? ...

2)– Navdêr wekî navdêrên şênber û navdêrên razber jî dibin du beş:

Ji navdêrên ku bi pênc libatên hest û hîskirina mirov dikarin werin (peyitandanin) tespîtîkirin re, navdêrên şênber tê gotin.

Mînak: kevîr, dar, ezman, roj, baran, bizin, sosin, Kurdistan, Cîhan, stêrk, masî, av, hewa, brûsk, gund, çiya,

Ji navdêrên ku bi pênc libatên hest û hîskirina mirov nikarin werin peyitandin re, navdêrên razber tên gotin.

Mînak:

xeyal, xewn, hez kirin, dil ketin, rûmet, aciz bûn, nefret kirin ...

wêrekî, tirsonekî, dildarî, bêdilî, duristî, xerabî, bênamûsî, welat-parêzî, xayintî ...

bawerî, azadî, çand, exlaq, dadmendî (adalet), hêvî kirin, ...

pêşketin, ser ketin, paş de çûn, têk çûn, hîndekarî (perwerde) ...

3)– Kitbûn û kombûna navdêran:

a)– Navdêrên kurdî gava bi tena serê xwe werin nivîsandin, wateyeke him kit, him kom didin. Yanî eger mirov bixwaze lîsteyeke tiştan çêbike û navan li binê hev rêz bike, mirov nikare bi awayê kom binivîsîne:

Mînak:

Awayê çewt (şaş) ê kom: sêvan, kêran, bizinan, daran ...

Awayê rast ê kom (û kit): sêv, kêr, bizin, dar

Kurdek, gava mirov dibêje sêv, kêr, bizin, dar ... him wekî sêvek, kêrek, bizinek, darek tê digihêje û him wekî gelek sêv, gelek kêr, gelek bizin, gelek dar tê digihêje. Ya rast jî ev awa ye. Hin kes di malperên xwe de serkoşeyên xwe wekî: nivîskaran/nûçeyan/ ... dinivîsîn ku ev yek ne li gorî zimanê kurdî ye û çewt e, ji zimanên din hatiye jiberhirtin, ti peywendiya wê û kurdî bi hev re tineye.

b)– Ji bo dema borî: Di hevokê de gava ne wekî bireser (objekt/tîşt) be, kombûn an kitbûna wê li ser lêkerê tê çêkirin. Lê gava wekî bireser be divê kitbûn û kombûn were diyarkirin. Lê belê di dema borî de, gava navdêr ditewe (li rastî ergatîviyê tê), navdêra tewandî dikare bi awayê kom were nivîsandin.

Mînak:

Zarokan sêv xwar: (gelek zarokan sêv xwarine – hijmara sêvan ne diyar e, dibe ku sêvek be, dibe ku ji yekê zêdetir sêv bin).

Zarokan sêv xwarin: (li vir hijmara sêvan jî bi awayê kom hatiye nivîsandin. him zarok gelek in, him sêv gelek in).

Zarokî/ê sêv xwar: (zarokekî, zarokekê sêvek ango gelek sêv xwariye).

Zarokî/ê sêv xwarin: (zarokê/zarokî gelek sêv xwarine).

Lê ger daçekek ango hokerek bi bireserê re were bikaranîn, ango bireser wekî veqetandekê be wê demê bireser dikare bi awayê kom were nivîsandin.

Mînak ji bo daçekê: Min bi gundiyan re wêneyên xwe dan kişandin.

Mînak ji bo hokerê: Min doh hevalên xwe dît.

Ji bo dema niha û dema bê: Berûvajî dema borî, vê carê mirov divê bireserê bi awayê kit û kom binivîse. Mînak

1.1– Jin sêvê dixwe. (di wateya “jinek sêvekê dixwe” de)

1.2– Jin sêvan dixwe. (di wateya “jinek gelek sêvan dixwe” de)

1.3– Jin sêvan dixwin. (di wateya “gelek jin gelek sêvan dixwin” de)

1.4– Jin sêvê dixwin. (di wateya “gelek jin sêvekê dixwin” de)

Tê dîtin ku di her çar awayan de jî kirde (subjekt) bi awayê kom nehatiye nivîsandin, lê belê di hevokên 1.3 û 1.4 de mirov tê digihêke ku navdêra “jin” a di hevokan de bi awayê kom e û ev kom bûn li ser lêkerê bi paşgira –in hatiye diyarkirin.

Mînak:

Ez sêvan dixwim. (sêv bireser e û bi awayê kom hatiye nivîsandin)

Min sêv xwarin. (di wateya min gelek sêv xwar. de, lêker bi awayê kom hatiye nivîsandin. Min kesê/a yekem a kit e. –in a li dawîya lêkera “xwarin”ê, navdêra “sêv”ê dike awayê kom).

4)– Zayenda navdêran: Di zimanê kurdî– kurmancî de zayend” cihekî grîng digre û pirî caran li ser çapemeniya kurd bi awayekî çewt tê bikaranîn. Sedema bikaranîna çewt, xwendin û nivîsandina bê zanistî ye. Bi pirahî ji tirkî tê wergerandin û di bin bandora tirkî de, bê tewang tê nivîsandin ku ev yek jî zayendê ji holê radike. Çewtiya duyemîn jî ji soranî tê. Di zaravayê soranî de nêr û mê nîn e, awayê –î ji bo zayenda nêr û zayenda mê tê bikaranîn. Ji bo wê, kesekî/keseke soran bi hêsanî dikare bêje; “jinekî got”. Axavtvanên kurmancî jî, gava rêzikên zimanê kurmancî nizanibin û vê yekê dibihîsin, dibêjin qey bi kurmancî ye û ew jî bi kar tînin û wê demê çewtî derdikeve holê.

Lê belê tewanga “mê” di kurmancî de “–ê” ye, ya “nêr” “–î” ye. Gava ew kes dibêje; “jinekî got”, kurdekî/kurdeke kurdî ji dayika xwe hîn bûbe, nikare wê hevokê rast bipejirîne.

Di reklama ji bo alîkariya Rojava de dibêje; “... ALÎKARIYEK jî tu

bide!”, ev hevok sedî sed wergerake bi mejiyê tirkî ye. “Bir yardim da sen ver” peyv bi peyv wergerandine kurdî bûye “alîkariyek jî tu bide”. Di peyva ALÎKARÎ de tewang nehatiye bikaranîn, ji ber ku di zimanê tirkî de tewang tineye. Lê eger dema ev hevok hat çêkirin ew kes bi kurdî hizirîba, wê bigota; “alîkariyekê jî tu bide” –ê ya tewanga mêbûnê wê bi ser peyva alîkarî ve kiriba. Lê dîsa jî li gorî rêzkirina hevoksaziya kurdî tam ne durist e, ji bo hevok tam were duristkirin, divê bigota: Tu jî alîkariyekê bide. Lê ji bo peyva “alîkarî”yê mirov derxîne pêş, dikare sazûna hevokê weke “Alîkariyekê jî tu bide” binivîsîne û bêje, lê belê “alîkariyek” bê tewanga “– ê” divê neyê gotin, eger were gotin ew ne bi mejiyê zimanê kurdî ye.

Zayenda mê û diyar ji bo veqetandekan: – a: xwişka min

Zayenda nêr û diyar ji bo veqetandekan: – ê: birayê min

Zayenda kom û diyar ji bo veqetandekan: – ên: xwişkên min, birayên min, xwişk û birayên min

Tîpa “y” li vê derê tîpa kelijandinê ye.

Zayenda mê û ne diyar ji bo veqetandekan: – eke: xwiškeke min

Zayenda nêr û ne diyar ji bo veqetandekan: – ekî: birayekî min

Zayenda kom û ne diyar ji bo veqeyandekan: – in (– ine): hevalin min (hinek wekî “hevaline min” jî bi kar tînin), bingehê xwe ji peyva “hin” tê û di wateya “hin ji hevalin min” angî (çendek ji hevalên min) de ye.

Ev xal di çapemeniyê de ewqasî çewt tê bikaranîn ku mirov nizane bê ji ku derê dest bi rastkirinê û mînakdayînê bike. Tev jî ji hiziran-dina bi zimanên biyanî û wergera çewt tê.

Zayenda mê û diyar ji bo tewangê: – ê: li wê jinê binêre/li jinê binêre

Zayenda nêr û diyar ji bo tewangê: – î: li wî zilamî binêre/li zilamî binêre / li zilêm binêre

Zayenda kom û diyar ji bo tewangê: – an: li wan jinan binêre, li wan zilaman binêre, li wan jin û zilaman binêre / li jinan binêre, li zilaman binêre, li jin û zilaman binêre

Divê were diyarkirin ku li Kurdistanê tewanga nêr bi sê awayan tê bikaranîn:

1- – î: li zilamî binêre

2- gava di kîteya dawîn navdêrê de “a” hebe, ew “a” tê tewandin û dibe “ê” Mînak: ez zilêm dibînim/li şûna “ez zilamî dibînim”, ez nêr dixwim/li şûna “ez nanî

dixwim”

3- hinek herêm jî zayenda nêr bi kar naynin. Mînak: ez nan dixwim, li şûna ez nanî dixwim angî li şûna ez nêr dixwim ez diçim bajarî / ez diçim bajêr / ez diçim bajar zilamî got / zilêm got / zilam got.

Herwiha gava zayend ne diyar be jî ev awayê tîpên tewangê tên parastin.

Zayenda mê û ne diyar ji bo tewangê: – êkê: jinekê got

Zayenda nêr û ne diyar ji bo tewangê: – êkî: zilamekî got

Zayenda kom û ne diyar ji bo tewangê: – inan: jin û zilaminan got.

Ravekirina veqetandek û tewangê:

Veqetandek; navdêrekê ji navdêreke din, navdêrekê ji cînavkekê, navdêrekê ji rengdêrekê û navdêrekê ji hokerekê bi awayê zahend û hijmarê diyar bike, vediqetîne, lê

Tewang; hijmar û zayenda navdêreke bi tena serê xwe diyar dike.

Ji bo mirov ji hev binase; bi pey tewangê re navdêrek, cînavkek, rengdêrek, daçkek, hokereke ku ji navdêrê were veqetandin û pê re di nava tîkiliyê de be angî lê vegere nayê, lê navdêr, cînavk, rengdêr angî hokera li pey veqetandekê tê

wesfê navdêra bi veqetandek diyar dike. Bi pey tewangê re pirahî lêker tê, lê bi pey veqetandekê re lêker qet nayê.

Mînak ji bo tewangê:

Jina bijîşkî (navdêrek û navdêrek), jina te (navdêrek û cînavkek), jina çê (navdêrek û rengdêrek), jina bi xeml (navdêrek û daçekek), jina li malê (navdêrek û hokerek)...

Jinê got , li jinê binêre, jinê li ber deriyê got, jinê ji min re got, jinê nan xwar, tu li jinê dinêrî, tu bi jinê re dimeşî

Zilêm/zilamî got, li zilêm/zilamî binêre, zilêm/zilamî li ber deriyê got, zilêm/zilamî ji min re got, zilêm/zilamî nan xwar, tu li zilêm/li zilamî dinêrî, tu bi zilêm/bi zilamî re dimeşî

Di vir de peyvên din ên li pey tewangê rêz dibin, ne têkildarî tewangê ne, têkildarî lêkerê an jî têkildarî kirdeyê ne. Mînak; dema mirov dibêje, “zilamî li ber deriyê

got”, hokera li ber deriyê ne veqetandeka zilamî ye, ew cihê gotin yanî çalakî lê hatiye kirin diyar dike. Peyva “zilam” bi tena serê xwe ye û paşgira -î nêrbûn û kitbûnê diyar dike.

Ev xal grîng e, ji ber ku di malbata zimanên Hind– Ewropî de nêr û mêbûn heye, lê di zimanê tirkî de ev yek tineye (zimanê malbata Ural– Altay). Kesên kurdî ne ji dayika xwe û ne rêzimanî fêr bûne û di çapemeniyê de cih digrin û kurdî ji tirkî werdigerînin, ji ber vê yekê pir dikevin çewtiyan. Mînak:

Li Amedê jinan meşîyan/ Li Amedê jinek got/ Li Amedê zilamek got/ Li Amedê dayikan meşîyan ... tev hevokên çewt in, rastiya wan wiha ye:

Li Amedê jin meşîyan/Li Amedê jinekê/jinan got/Li Amedê zilamekî– zilêm– zilaman got/ Li Amedê dayik meşîyan ...

Têbinî: Di hijmara bê de mijara “rêzikên ji bo lêkeran” wê cih bigre.



Hevpeyvînek bi seroka Komela Hîndekariya Kurdî, Evîn Yağcı re

Ecevit Yildirim



*Tu dikarî xwe ji bo xwendevanên
Bîrnebûnê bidî naskirin?*

– Ez ji yayla Kîrligê ya bi ser Bêşqewaxa Mezin im. Ji du mehîniya xwe vir ve li Baselê dijîm, 23 salî me û niha jî li zanîngehê pedagojiyê dixwînim. Bi rû da jî karê wergera zimanê kurdî û elmanî dikim.

*Bi xudê haya min ji karê wergerê nebû.
Heqet tu çend karan bi hev re dimeşîni?
Ez carekê dinêrim tu li navenda Baselê
qahwe û pasta difiroşî, carinan dibînim
tu li ser dîkê di koroyê de stranan dibêjî.
Karê mamostetiya te zaten emê hîn li ser
deng bikin. Ew çi enerji ye ?*

– Belê spas! Rast e. Dema şerê li Kobanî û Şengalê me ji bo alîkariya penaberan qahwe û paste difirotin. Ji ber ku wan rojan însanên me di rojên gelekî giran re derbas dibûn, me dixwest berpirsiyariya xwe ya însanî li hember mîletê xwe yê bel-engaz bi cîh bînin. Mesela koroyê jî, me wek jinên kurd li Baselê koroyek ava kir û dema bang li me tê kirin em diçin di şahî, çalakî û hwd. stranên xwe dibêjin.

*Her bijî je te re. Meraqa min li min
megire lê tu bi kurdiyeke bê devok deng
diki. Te ev kurdiya pak û zelal çing hu
kir?*

– Bavê min ji berê de însanekî welatparêz bû. Deh sal berî niha dîsa li Baselê qursa zimanê kurdî hebû û bavê min wê çaxê ez birim li wê qursê qeyd kirim. Destpêkê min nedixwest ez tev li qursa kurdî bibim. Ez bi zora bavê xwe diçûm. Lê belê piştî demekê hezkirineke zimanê kurdî li min peyda bû. Heta dikarim bibêjim; Ez bûm evîndara zimanê kurdî. Min wê çaxê biryar

da ku kurdî baş fêr bibim, bo ku rojekê ez bi xwe jî zarokên kurd fêrî kurdî bikim.

Evîndariya te li serê hemû keç û xortên kurd be! Em niha werin ser mijara me ya esas; Tu dikarî komela we bi xwendevanên Bîrnebûnê bidî naskirin ?

– Berî şeş salan Komela Hîndekariya Kurdî ji hêla mamoste Hesên Huseyîn Deniz ve li Zurichê hatibû avakirin. Destpêkê qursên kurdî di komela kurdan de dihatin dayîn. Piştî demekê ji bo fermîbûna zimanê kurdî serlêdana kantona Zurichê hatibû kirin û bi pejirandina wê serlêdanê di dibistanên cuda yên li Zurichê çar pol hatin avakirin. Berî du salan jî gava min mamoste Hesên Huseyîn Deniz nas kir, ji min daxwaz kir ku em bi heman awayî li Baselê jî xebatê ji bo zimanê kurdî bikin. Îro li hêla kantona Zurichê, li kantona Basel û kantona Bernê jî zimanê kurdî wek fermî hatiye pejirandin.

Wateya fermîbûna zimanê kurdî çi ye?

– Fermîbûna zimanê kurdî tê maneya ku em dikarin qursên kurdî di dibistanan de bidin. Berî wê me di komeleyan de qursên kurdî didan. Her wiha qursên kurdî dikevin nav bawernameyê jî.

Wekî din ji ber ku dewletek bi navê Kurdistan tune ye, neteweyek bi navê Kurd û zimanek bi navê kurdî jî di pratîkê de tune tê hesibandin. Ji ber vê yekê gava li welatekî kurdî tê fermîkirin, di tunehesibandina wê pratîkê de qulek tê vekirin. Berê gava me qala zimanê kurdî dikir gelê Swisre digot, hm belê me fam kir tirkî û tirk. Me bi israr digot; Na em ne tirk in, em kurd in û zimanê me jî kurdî ye. Îro kes me û tirkan tev li hev nake. Kurdî îro di nav 29 zimanên fermî yên Swisre de cihê xwe digre û em jî pê serbilind in.

Li Baselê çend zarok dikevîn qursa we?

– Li Baselê du polên me hene. Bi qasî 20 zarok dikevîn qursên me. Dîsa em li derveyî dibistanê qursên kurdî ji bo yên temenmezin jî didin.

Bîst zarok ji bo bajarekî wekî Baselê ne hendik e?

– Erê, bê gûman! Lê belê gerek em rastiya xwe jî bibînin. Yanî ji hêlekê ve mamosteyên zimanê kurdî gelekî kêmtir in. Yên heyî jî em ji ber sedemên aborî nikarin bi hev re kar bikin.

Çing yanî, dikanî vira hinekî vekî?

– Dewleta Swisre li derveyî mu-



fredata xwe tu qursên din finanse nake. Yanî gava tirk li Swisre dikevin qursên zimanê tirkî, mûceyên wan dewleta tirk dide. Ji ber ku dewleteke Kurda tune ye mamos-teyên zimanê kurdî jî wî karî wek karekî dilinî dikin. Ji bilî vê yekê heta niha ne sazî û ne jî dewlemen-dekî Kurd xwe nedan ber finanse-kirina karê me.

Naveroka qursên we çi ye?

– Qursên me di bin sîwana “Heimatliche Sprache und Kultur (Çand û Zimanê Welat)” de tên dayîn. Ji hêla siyasî û olî ve gerek qursên me bêalî bin. Wekî din em azad in. Em naveroka qursên xwe li hêla xwendin, nivîsandin û xaftina bi kurdî bi nasandina çanda Kur-

distanê jî dadigirin.

Qursên we bandorek çing li zarokan dikin?

– Ez bawer dikim, qursa me bandorek gelek erenî li ser zarokên ku tev li qursên me dibin dike. Gava zarok tên qursê, bi dilgermî tev lê dibin. Ez vê yekê bi dilekî rihet dikarim bêjim. Lê rastiye ruyekî xwe yê din jî heye. Gerek dê û bavên zarokan jî bizanin, ku qursa me li malê jî berdewam dike. Yanî pir cara ez dibînim dê û bav zarokên xwe tînin qursê, lê heta ber deriyê dibistanê bi tirkî deng dikin. Ew jî karê me û yê zarokan zortir dike.

Yanî tu dibêjî dê û bav him zarokên xwe ji bo fêrbûna kurdî tînin qursê û him jî pê re bi tirkî deng dikin?



– Erê, mixabin.

Çima?

– Ez bi xemgînî dibînim, ku kurdên me her ciqas welatparêz û fidekar bin jî, girîngiya zimanê dayikê yan nizanin yan jî piştguh dikin. Gerek dê û bavên zarokan vê yekê baş bizanin; Dibistana herî mezin mal û malbat bi xwe ye. Gerek zimanê malê bibe kurdî, ku ew zarok bika-ribin di pêşerojê de bi kurdî deng bikin. Gava malbat di malê de bi tirkî deng bike û zarokê xwe jî bişîne qursa kurdî, dibe cihê nako-kiyê. Îro pedagog tim bang dikin û dibêjin ji bo ku zarokek di jiyana xwe ya pêşerojê de bi ser keve, gerek destpêkê zimanê xwe yê dayikê baş bizane. Cimkî zimanê dayikê wek bingeh tê qebûlkin. Tu bingeha tişteki çiqas qêr çêkî avahiya li ser jî ewqas qêr dibe.

Armanca we ji bo pêşerojê çi ye?

– Di pêşerojê de em dixwazin hej-
mara qursên xwe zêde bikin. Ji bo
wê jî em niha mamosteyên nû per-
werde dikin. Li zanîngeha me şeş
keçik hene ku perwerdeya mamos-
tetiya zimanê kurdî dibînin. Ew ji
hêla mamoste Hesen Huseyin De-
niz ve tîr perwerdekirin. Ez jî wana
yekcara tev li qursên xwe dikim, ji
bo ku di pêşerojê de hazir bin.

*Ji bo te dema xwe ji bo me veqetand ez li
ser navê Bîrnebûnê spasdariya te dikim
û di karê we de jî serkeftinê dixwazim.*

Di dawiyê de tu dixwazî tişteki bibêjî?

– Berê min bîrnebûn nas nedikir.
Gava min naskir û dît, ku kovare-
ke herêmkî ku zimanê kurdî tê de
ewqas serdest e, ez gelekî pê şad
bûm. Bîrnebûn karekî gelekî hêja
dike û hêjayî xwedîlêderketinê ye.
Mala Bîrnebûnê ava.

Mala te jî ava !

Miçê jî ji nav me bar kir

Îhsan Türkmen

Mirin mala te xirab be!

Mala te xirab be tu her tim bê wext î.

Te îro jî kekê min, hevalê min,

birayê min, mentorê min ji nav me bir.

Da ku bi birayê min re heval bû, ez Miçê ji biçûktiya xwe vir de nas dikim. Rûyê wî her tim bi ken bû, biçûk mezin bi herkesî ra jî heval bû. Ji ber wê bû ku ez bêjim biçûk-mezin herkesî ji wî hez dikir. Di nava her gotina xwe de bi henekekê bi yareniyekê şora xwe xweş dikir.

Mekteba mamosteyîyê li Agiriyê xwendî bû. Bi hezaran meseleyên xwe yê li ser dema xwe ya zanîngehê hebûn. Meselê xwe yê taxa Agirî ya Teyarê yê herî xweş bûn. Kîlîma “dolabê” jî cara yekem nim ji wî bihîstî bû. Yek cara di hate kêf û dest pê dikir:

”Dolabê hey dolabê eman dolabê

Dolabê hey dolabê bû şing şinga dolabê

Dolabê ji dara darê eman eman dolabê

Mîn risto hirya karê bû şing şinga dolabê”

Na Miç ne merivê min û ne jî cîranê min bû. Malên me jî ji hev dûr bûn. Lê riyên di sala 1988 de gihîştin hev. Miçe bi Çetîn ve dest bi muhasebeyê kiri bûn. Lê Miç mamosteyê dibistana destpêkê, Çetîn jî li Zanîngehê Stenbolê de beşa hiquqê dixwend.

Miçe rojekê ji min re go, ka ezê bikaribim karê mihasebeyê bikim, yan na. Min him ji Miçe hez dikir him jî ji Çetîn. Bê ku li ser bifikirim min qebûl kir. Nêzikî pênc salan em tevûhev xebitîn. Çetîn salek—diduya bi şûn da ji ber pirsgerikên wî yê siyasî xatir ji me xwest û çû Almanyayê. Çend sala bi şûn da jî ji wek dîsa ji ber kurdûnê Miç wekî sirgûn şandine Rihayê. Me nikarî bû em karê mihasebeyê bimeşînin û me dev jê berda. Paşê ez hatim Almanyayê...



Mustefa Taşçi, 1962 -24.11.2015

Miçê ez ne şaş bim cara yekem di nava refên Özgürlük Yolu bi navê niha PSKYê de dest bi siyasetê kir û heta mirinê jî çalek û aktif bû. Li der dora me bi navê kurdbûnê çi dibû, ew herî li pêş bû. Li kuderê tiştêk bi navê kurdbûyînê dibû, guhê wî li vir bû. Kurdên sirgûn ji Merdîne hatin, ji wan re xanî alîkariya bi her awayî dida organîze kirin. Di nav kurdan de kê seriyê xwe diêşa dîhate ba wî û Miçê jî jê ra çareseriyek didît. Bê tîrsa ku ji kar bê avêtin, dixwast ruhê kurdîtiyê bi her awayî di nav herkesî de belav bike. Kovarên li ser kurdîtiyê didan xwendinê, belavokên qedexê belav dikir û hwd.

Yek ji damêzrênerê HEP, paşê DEPa navçeya Kuluyê bû û di demeke kurt de di saya wî û çend

kesên din de, HEPa Kuluyê vekirin. Ev bûbû sebeba kelecaneke li hemû gundan dor Kuluyê heya gundên Ankarayê nêzik.

Paşê ji gundê me re (Xelîkan–Karacadağ) di navberên salên 1990– 2004an de ji partiya Hak–Parê bû serokê şaredariyê. Paşê demekê dîsa mamosteyî kir. Ji Kongreya dawî heta niha jî wekî yek ji endamê civaka partiyê (PM) Hak– Parê bû.

Bê lê zêdekirin ezê bêjim... Li hemû gundên Kulu û Cihanbeyliyê hûn ji kê pîrskin ewê ya Miçe nas bike, yan jî navê bihîstiye. Ez jî yek ji wan yê bextewar bûm ku, min ew pîrr ji nêzik ve û pîrr baş nas kir.

Riya te vekirî be Miçe!

Kilamên şîret û gazinan

İhsan Türkmen

Di nava Kurdên Anatoliya Navîn de, bi taybetî li Konyayê sereke du cûreyên strandinê hene. Yek ji wana strandina dema şînê ya din jî kilamên evîndariyê ne. Kilamên mêranî yan jî egîtiyê he-nin, lê pirr kêr in.

Kilmanên şînan bi pirranî ji aliyê jinên ku wekî şare tên binavkirin ve tên gotin. Û bi tunî ji ber xwe ve, di wê demê de li ser jîyana yê ku mirî tê xwendin. Tê de li gor rewşa yê ku mirî, xizaniya wî, sêwîtiya wî, bi aqilbûna wî, zarok, jin, xwang û bira, dê û bav, newxeşî, ciwantiya û hwd wekî motif tên bikaranîn.

Kilamên dila bi pirranî ji aliyê mêran ve tên gotin, yan jî yên ku ji aliyê mêran ve tên gotin pirrtir belav bûne. Ji bo afirîna van kilaman tenê dil girtin têrê nake, da ku ew dil bibe kilam divê pirrê caran ew dil nere serî yan jî astengiyan mezin li hemberî wan hebin. Yan lawik xizan e, yan keçik bi destgirti ye, salên wê biçûk in, yek ji wan zewiciye, keçik xwenda ye, lawik şivan e...

Naveroka vê nivîsê kilamên dila yê ku ji aliyê jinan ve hatine gotin e. Bi taybetî jî cûreyek ji wan e ku, meriv

dikare wekî şîret— kilam jî bi nav bike. Di naverok û di navên her çar kilamên li jêr in hûnê baştir bibînin keçik û lawik her du jî li hev bi dil in. Lê lawik pirî caran yan tûr e, pênezan e yan jî jênehatî yek ji wan zewici, bi destgirti ye.

Wekî mînak di kilama Binar de, keçik giliyên xwe dike û rê dide nîşandayînê ka bi çi halî ewê were xwastinê wê û di dawiyê de ewê bi çi were xelat kirin:

Binar binar tu heram î

Li ber hacîya nagerî

Canî Aşê Mame gewr şana bî

Binar binar tu heram î

Di naveroka vê çarrêzê re jî kifş e ku keçik dixwaze ku dilketiyê wê here ji hacîyên gund rîca bike ku ew werin wê bixwazin. Di encamê de bizewicin û bi hev şa bibin.

Li cîhekî din de keçik jî dîsa rê dide nîşandan û sergirti ji wî daxwaza revandina xwe dike.

Li qapî hukimatê li yanî te me

Gava keçik sal bi çûk, zewicî yan jî ihtîmal bê dil hati be revandin, ew

tišta li gor yasayan sûc e û lawikê were
mehkeme kirin.

Binar

*Berî mala me ra mere mewo
Dilê rezîl di pê tewo
Serî te radim arî sêlowo
Binar binar tu heram î*

*Serî te radim arî sêlowo
Binar binar tu heram î*

*Binar binar tu heram î
Li ber haciya nagerî
Canî Aşê Mame gewr şana bî
Binar binar tu heram î*

*Mere li mehlê xwe xwe nepesîne
Mede du xwe herçar peza
Hin xweş nebûya şûna geza
Binar binar tu heram î*

*Hin xweş nebûya şûna geza
Binar binar tu heram î*

*Binar binar tu heram î
Li ber haciya nagerî
Canî Aşê Mame gewr şana bî
Binar binar tu heram î*

*Binar binar li yanî te me
Heta'k mirim bi navî te me
Li qapî hukimatê li yanî te me
Binar binar tu heram î*

*Li qapî hukimatê li yanî te me
Binar binar tu heram î*

*Binar binar tu heram î
Li ber haciya nagerî
Canî Aşê Mame gewr şana bî
Binar binar tu heram î*

Herêm: Qemera

Di kilama Kurdê Hemê de jî qala tûri-
tiyê Kurdo tê kirin. Her wiha meriv tê
dihgihîje ku ewî newxêş e. Ji ber wê jî
keçik temeyên xwe li Kurdo dike.

Kurdo here li mala xwe bê xem rûne
Ez a tutinê te binim bi teşî û bi
ristinê

Kurde min î nexweş ketiye
li ser dûganê

Kurdê Hemê

*Mala Kurdê Hemê li paşya dunê
Junyê min qerimîn bi çûyîn hatinê
Kurdo here li mala xwe bê xem rûne
Ez a tutinê te binim bi teşî û bi ristinê*

*Were Kurdo Kurdo Kurdê Hemêwo
Tu çi bûyê gure'k hêlîna xwe dipewo*

*Tu çima bi şev neyî lo bi ro teyî
E li te xin Kurd Kurdo min gunewo*

*Min go qiptî qiptî Kurd Kurdê min qiptî
Ew çi qiptiyek ji destê min lo filitî
Ez bi dere serî sêz ketim
Dile gundê Xelîka bi min şewitî*

*Were Kurdo Kurdo Kurdê Hemêwo
Min go tûro tûro tûrî Fatêwo
Min go here lê lê lê li baranê
Tavê girtiye li ser xermanê*

*Fatê Eşê di berda hatinî
Kurde min î nexweş ketiye li ser dûganê*

*Arabeyê têye ji Diyarbekir
Çiqina min û te bûye mûj û şekir
Wela bi navî Xwadê min sond xwariye
Di gunde Xelikan da pîrr bîra te kir*

Herêm: Xelikê Jêr

Wekî navê stranê, meriv dizane ku lawik î bê xêr e yan jî jênehati ye û îhtî-
maleke mezin e ku keçik zewicî be.

*Qansizo go songê vî dilê min ya kuştin e ya berdan e
E bê Qansizo tu ney mêr î lo tu ney mêr î*

Meriv dibîne ku keçikê ji bo dilê xwe mirin daye ber çavan û dixwaze lawik jî
cêmer be. Her wiha behsa berdanê dibe, ku ew jî tê wê maxnê ku keçik zewici ye.

*Lo lo Qansizo qurban go ma meytî min bişon lo bi heft ava
Ma pewin dinî ser riyeke bejin zirav, bejin kîbaro*

Wele go kotingî mêra e li texe bi dönerê()
Qansiz e te songê hûr bike lo bi xençerê*

Qansiz

*Dibê Qansiz xerman yerî bişewite lo duzo pon e
Lo lo Qansizo go singê min î gewrî bê gerdan e
Qansizo go songê vî dilê min ya kuştin e ya berdan e
E bê Qansizo tu ney mêr î lo tu ney mêr î
Go tu xwedanê arabeyê heşin lo hespî nêr î
Go Qansizo tu damaweste lo li ber mimzerê
Te heta siwê çima omiza xwe kiriye devî pencerê
Wele go kotingî mêra ê li texe bi dönerê(*)
Qansiz e te songê hûr bike lo bi xençerê
Bê Qansizo ro helato û ro çû ava
Lo lo Qansizo qurban go ma meyiî min bişon lo bi heft ava
Ma pewin dînin ser rîyeke bejin zirav, bejin kîbaro
Her kî'k derbas bû ma bê rehme li hestiyê dê û bavawo
Go Qansizo tu bewrar bewrar lo damekeve
Lo lo Qansizo go ma çave mino lo li te nekeve
Go herkî çavî minî lo li te dikeve
Tîrek dikeve serê min lo bi heftekî diduya dernakeve
E Bê Qansizo tu ney mêr î lo tu ney mêr î
Tu xwedanê arabeyê heşin lo hespî nêr î*

Di nava kilama Berdoş de meriv ji herçar kilamên jor motîfan dibîne. Hinek ji van kilaman bi melodî û naveroka xwe pirr nêzikî hev in. Meriv nizane ku di nava wextê de varyasyonê wana çêbû ne, yan na? Dibe ku yek ji wan kilaman ji yên din re bibûbe mînak ku di nava demê de gotin li ser hatibin zêdekirin yan jî guhertin.

(*) navê tîfingeke ku şeş gulan digire ye. Her weha wekî toplî jî tê bi nav kirin.

Berdoş

*De min go berdoş berdoş sado rabûyî li hespê xwe yê kumêt mene
Bewrar bewrar damekeve
Her ku çavî min li bajna te çeleng dikeve
Janê dikeve serî min heftekî bi dudya dernakeve
Berdoş Berdoş li yaray te me
Lo lo min go ezî li qapî hukimatê li yanî te me
Min go ezî dōnera navê te me
Berdoş Berdoş min go xarmon yêrî cî'kî pan e
Sîng û berê min î gewrî bi gerdan e
Lawik tu min direvînî birevîne
Songa duney lo yan kuştin e yan berdan e
Berdoş Berdoş li yaray te me
Min go lo lo li qapî hukimatê li yanî te me
Lo lo Berdoş min go siwê da rabûm
Kutey kuta John Deereyê te tê
Lo lo min go Hecîlera hatin me dawetê
Gotin va çi Berdoşek dile te ketê
Min got li erdê xelkê ne tu tişt e
Li erdê mino bê Cemal Gurselê li ser text e
Berdoş Berdoş li yaray te me
Ezî li qapî hukimatê lo li yanî te me
Lo lo min got ez îşlige laylonî li sirte te me*

Berhevkar: Gursel Dayan



VEGUHERÎN

– Serpêhatiya merivekî ku veguhêriye, bûye kêz –

Franz Kafka

Wergera ji almanî: Nuh Ateş

III

Gregor ji mahekê zêdetir ji ber birîndariyê dikişand. Çima ku tu kesî newêrîbû ku sêva mîna nîşana yadigareke berçav di cane wî da hatibû xwarê derbixe. Êdî bav bilem gihêştibû wê qonaxê ku Gregor, dûmena wî ya niha çiqas xemgîn û bed be jî, kesekî ji malê bû û nedibû ku meriv mîna dijminekî lêbinihêriya, û berevajî erkekî malbatî bû ku meriv bêzarîya li hemberî wî li xwe rawire û tehemûl bike, tenê tehemûl, ne tişteki din.

Ji avrûyê birînê da, Gregor tevgera xwe, îhtimal ji herdemîyê ra wenda kiribû. Û vê hengavê ji bo çûyîna wî ya ji kûncekî odeyê hetanî kûncekî din, mîna ku kalekî kûd be, wexteke pir dirêj lazîm bû û xûşîna berjor jî êdî ne mimkûn bû. Lê bi fikra wî, mîna ku bedelê neçêbûna rewza wî be, derfeteke din ya têr cihgir derketibû pêş wî. Her dem, dev-deve êvarê deriyê odeya mêvanan yê ku wî, mîna ku ji xwe ra kiribe edet, seatek û duseatan pêşda rind bala xwe didaye, dihate jihevkirin.

Bi vî awayî wî dikanîbû di reştarîya odeya xwe da, bi şekla xwedirêjkirî û ji odeya mêvanan va nexûyakirî, malbatê gîşt li ber maseya bi çireyan ronîkirî bibîne û dengkirina wan, tu yê bibêjî bi îcazeya gîştî, ji ya berê pir cihêtir bibihîze.

Bê guman evana ne mîna sohbetên bi tîn yê demên rabirtî bûn; yên ku Gregor bi dilxwazî di odeyên piçûk ên otelan da, gava ku wî bi halekî westîyayî xwe mecbûr diavete nav nivînên kamdar, bi bîr dianîn. Niha ew pirtir bêdeng radibihurîn. Bav ji xwarina şevê bi şûnda, di paldanka xwe da zû dikete xewê. Dayê û xwangê hevûdi sewa bêdengîyê tembî dikirin. Dayê berve binê ronîya çireyê xwarvehatî kincê narîn ji bazirxaneyê modeyê ra didirûya. Xwangê ya ku li ser karê firoşgeriyê bû, bi omdîya ku karekî hîn rind bibîne, êvaran sitenografi û frensî dihêvisî. Carna bav bi xwe dihêsiya û mîna ku hay jê neye ku ew raketîbû, digote dayê: “Îro dîsa ji kîngê va ye tu didûrî!” û hema dîsa

radiket; wê demê dayê û xwangê bi rûkenîyeke sivik li hev mês dikirin.

Bavê bi înad red dikir ku ûnî-formaya xwe li malê jî ji xwe biêxe; halbuku pîjemeya wî li boşê pê niçikê kincan va darda kirîbû; ew bi kincên lixwekirî gîştan va li cihê xwe di xew da diçû, te yê bigota, ew î her dem ji xizmeta serdarê xwe ra amede û li benda dengê wî ye. Ji ber vê jî, ûnîformeya ku ji sêri da ne nû bû, û her çiqas ku dayê û xwangê bi îtina lêdinihêrin jî, pakîya xwe wenda kiribû; û Gregor pir caran bi dirêjîya êvaran li vê kinca bi leke ya bi pişkojên zêrkirî, tim pakkirî û birqokî û tê da merivê kal pir ne rehet lê haşt radiket, dinihêrîya. Çawa seat dihate dehan, dayê bi dengêkî nizm bang dikir ku bavê ji xewê rake û dûv ra wî qanî bike ku ew here nav nîvînê. Çima ku li cihê ew lê bû, xeweke xwaş ya ku ihtiyaca wî pê hebû, ne mimkûn bû; û gerek ew li seat şeşan biçûya ser wezîfeya xwe. Lê ew bi înad ya ku jikî xizmetkarîyê dike lê peyda bûbû, ji ya xwe danedigerîya; û her çiqas ew li wir her dem di xew da biçûya û paşê birina wî ya nav nîvînê bi zehmet bûya jî, dixwast dirêj li ber maseyê bimê û nedikete ser ku paldankê têke berginde nîvînê. Her çiqas dayê û xwangê sewa ku wî

qanî bikin, bi bergerîn û sergerînan bi ber dil da biçûyana jî, wî çaryek seatê serî giran badikir, çav digirtin û şûna xwe nediterikand. Her çiqas dayê radihişte hûçikên pîyên kincên wî û şorên xwaş bi pistepistkî di guhên wî da digotin û xwangê jî sewa ku alîkarîya dayê bike karê xwe cihdihîşt, dîsa li ser bavê tu tesîr nedikir. Her diçû ew hîn pirtir di paldankê da dihate xwarê. Kîngê ku jinan bi binçengên wî digirtin, hinge wî çavên xwe vedikirin û bi dorê li dayê û xwangê mês dikir û ev gotinan dihatin ser zimanê wî: “Ev jîyanek e. Ev aramîya rojên rabirtî ye.” Û bi palpiştîya her du jinan ew bi çetinahî radibû ser xwe, mîna ku li xwe bûbû barekî giran û cihdihîşt ku jin wî hetanî ber dêrî bibin, li wir nîşana besbûnê dinimand û bi serî xwe diçû; pê ra, ji bo ku bidin pey bavê û dîsa ji wî ra bibin palpişt, dayê tiştê xwe yê dirûnê û xwangê jî qelemê xwe bi lez cihdihîştin.

Ji vê malbata hincirî û têr westîy-ayî, vîqasî hewce ye wexta kê hebû, ku destê xwe bi ser Gregor ra bigire? Bûtçeya malê her diçû kêmtir dibû; keçîka xizmetkar ji kar hatibû derxistin; xizmetkareke mîna qedene û bi porê gewr yê pêlpêl sewa ku karê giran bike sibeh û êvaran dihate malê. Bi her tiştên din ra dayê, li rû

karê dirûnê, eleqedar dibû. Hetanî ku bi gewherê malbatê gihê yên ku dayê û xwangê di demên rabirtî da, bi dilşahî li kombûn û şenahîyan bi xwe da dikirin, hatibûn firotin û Gregor ji sohbet û şewrên malê bi bihayê wan hêsîyabû. Derdê pir giran û domdar ew bû ku meriv nedikanî apartimana ji bo rewşa hîngê pir mezin biterikînê, ji ber ku çawabûna malguhêrîna Gregor nedihata tesewurkirin. Gregor tê digihêşt ku malneguhêrîn ne tenê ji avûrûyê wî da bû; meriv dikanîbû wî di kodikeke guncaw ya bi çend qulên nefeshelnanê da, bi hêsanî bar bike. Ya ku malguherîna malbatê nedihîşt pirtir bêhêvîbûn û hizira şikestina wê bû ya ku qet nehatibû serîyê tu kesî din î ji mermalî û nasan. Însanên xizan ku dinya jê çî bixwaze, di bin şerdên pir giran da be jî, tînin şûnê. Bavê ji memûrê piçûk yê bankeyê ra taştî dianî; dayê ji bo kincê xelkê xwe xişhal dikir; xwang li gor fermana mişterîyan di paş refmaseyê da, virda û wêda dimeşîya; jê vê zêdetir guca malbatê nedigihaye. Birîna li piştê Gregor ji nû va destpê êşînê dikir; gava dayê û xwang, ji birina bavê ya nav nivînê vedigerîyan, kar li cihdihîştin, li teniştê hev rûdiniştin û serî digihan-din hev. Gava niha dayê berî berve

odeya Gregor digot, “Grete” derî han bigire lê,” û gava Gregor dîsa di reştarîyê da dima, jinan li teniştê hêstirên çavan tevhev dikirin yan jî bê hêstir mat li maseyê mês dikirin.

Gregor şev û roj hemahema bê xew derbas dikirin. Carina weng difikirî ku vê carê dêrî vebû, ew ê karûbarê malbatê mîna berê helne ser xwe. Ji demeke dirêj şûnda, dîsa serdarê bazirxaneyê û berdevkê wî dihatin bîra wî; katib û berdestik, xulamê fahmkor, du û sê hevalên ji bazirxaneyên din, keçika xizmetkar ya oteleke navçeyî, êvînek, bîranînên demkî, qasedareke bazirxaneyê lengeran ya ku wî cidî di dorê ra bazdida, lê ku di hate rûniştina li ser kevîrê xwazgînîyê xwe giran dikir. Evana gîşt bi yên yad û jibîrkirî va tevhev, şûna ku alîkarîya wî û malbata wî bikin, ji ragihîştinê ra ne amede bûn. Ê ew bi kêmbûna wan şa dibû. Lê paşê, dîsa hewêsa wî dişikest ku bi malbata xwe ra eleqader bibe. Ji ber xwedîkirina neçê ew pir sur dibû. Ê her çiqas wî nedikanîbû bîne ber çavan, ka dilê wî ê bixwasta, dîsa jî plan çêdikir ji bo ku ew ê çawa bikane bikeve kulîna xwarinê û ku ne birçî be jî, dilê wî çî dixwest bibira. Bêyî ku niha pir li ser bifikire, da ku meriv ê bi çî bika-ne ji Gregor ra xwaşikîyeke xas bike,

xwangê bi lez, berî ku sibeh û nîvro-
 jan bimeşe dikanê, bi lingê xwe pê
 tişteki ku bihê xwarinê va dida û di-
 avête odeya Gregor û paşê, êvarê wî
 tiştî, bi guhnedayî û bêyî ku bi ser
 ra mês bike, ka xwarin tenê hatiye
 tamkirin yan – wekî pir cara– qet
 destpênêkirî mabû, bi derbeyeke
 şijingê berve derva rêş bike. Êvaran
 wê êdî tim bi lezîyeke ku di ser ra
 tunebûn, ode berehev dikir. Li ser
 dîwaran çizîyên qilêrê, li vir û wê
 kuçên tozê û bermayîyan xuya diki-
 rin. Di dema pêşîyê da, gava xwang
 dihate odeyê, Gregor xwe di kun-
 cên weha pir balkêş da bi şûn dikir,
 mîna ku bixwasta bi vê dîmenê, si-
 tem li xwangê bike. Lê ku ew li wir
 bi hefteyan bimaya jî, xwangê dîsa
 helwesta xwe berve çêbûnê nedigu-
 herî. Wê jî mîna Gregor qilêr didît,
 lê qerar dayîbû ku wê di cih da bi-
 hêle. Pê ra, wê bi hesasiyeteke pir nû
 ya ku malbatê bitûn vegirtibû, dîqet
 dikir ku berehevkirina odeya Gre-
 gor para wê bimîne. Carekê dayê
 odeya Gregor ji sêrî hetanî binî bi
 çend helbik av pak kiribû, lê bi pir-
 bûna kamîyê Gregor nexwaş diket û
 ew bi panî, mûrîzbitahl û bêlîvîn li
 ser qenepeyê dirêj ketibû. Ji ber vê,
 dayê ji cezaxwarinê nefilîtiya. Çawa
 ku xwangê êvarê guherîna di odeya
 Gregor da dît, pê pir êşîya, sur bû

û cîhlê bezîya odeya mêvanan û li
 hemberî dayê ya ku bi bergerîni de-
 stên xwe berjor helnabûn, horûhor
 girîya. Dê û bav berê pêçekê mat-
 mayî û neçar li wê nihêrîn, - bav
 hema ji paldankê pekiya - paşê bavê
 berî berve hêla rastê lome li dayê kir,
 çima ku wê pakkirina odeya Gregor
 ji xwangê ra nehîştîye; dûv ra berve
 çepê lê xwangê vegerî, bi qîrînî got,
 ku êdî niha şûnda îcaze tune ew
 odeya Gregor pak bike. Dayê bav yê
 ku ji ber hêrsbûnê hay jê xwe nebû,
 bi xwe ra kişand û bir odeya rake-
 tinê; xwangê ya ku ji ber îskeîskan
 lerizî bû, bi mistên xwe yên piçûk
 pê maseyê va didan; û Gregor ji hêr-
 sa ra bilind difîşîya û qet nedihate
 bîra kesî ku derî bigre û wî ji van
 dîmen û qîrvîrîyan dûr bihîle.

Şayed ku xwang ya ji ber barê
 pişekarî xişbûyî û her çiqas jê bê-
 zar bibûya bilem, wekî berê Gregor
 xwedî bike, hînge qet ne minasib
 bû ku dayê şûna wê bigirta û divê
 Gregor nehatiba îhmalkirin, ji ber
 ku niha êdî xizmetkar hebû. Ev jin-
 ebîya pîr ya di temenê xwe yê dirêj
 da, di saye bedena xwe ya bi hestîyên
 pît çileyên giran derbas kiriye, arast
 qet ji Gregor nefret nedikir. Bêyî ku
 bi awayekî meraq bike, carekê wê
 tesaduf derîyê odeya Gregor vekî-
 ribû û gava ew raste Gregor hat, yê

ku heyret mabû û her çiqas ku kesî rasere wî nedida jî, dest pê çûyîn û hatina vir da û wê da kiribû, ew dest di paşilê da ecêbmayî dawestîbû. Ji hînge va wê kiribû edet, her sibeh û êvarê rêkûpêk derî hendik vedikir û bi ser Gregor ra mês dikir. Di destpêkê da, wê bi gotinên yên ku li ba wê bi ihtimal berdilkî dihatin hesibandîn, wekî “kêza rixê ya pîr hela carekê vir da bihê!” yan “carekê li kêza rixê ya pîr binihêre!” bane wî dikir. Gregor bang û gotinên wê bê bersiv dihiştin û di cihê xwe da weng bêlîvîn dima, mîna ku derî qet nehatiba vekirin. Şûna di hate hîştin ku xizmetkar bi yarênîyên bêfêde Gregor eciz bike, dera ku emir bihata dayîn, ku ew her roj odeya wî pak bike. Carekê sibehê zû, - gava baraneke şên, mîna ku nîşana hatina baharê be, li caman dixist- xizmetkarê dîsa dest pê gotinên xwe yên her dem kir. Gregor pê hetanî dêv hat û wekî ji berhelanê ra hazir, lê hêdî û şengijî li wê vegeyîya. Encax xizmetkar jê netirsîya û bi serda jî wê rahişte sendelîya nêzikî dêrî û ew berjor helna. Ji dîmena sekinîna wê û devê wê yî hetanî dawîyê vekirî aşkere dibû, kîngê sendelîya di dest da di pişta Gregor biçûya xwarê, hînge wê devê xwe bigirta. “Yanê hetanî vira, jê wêda na?” wê pirs kir

û gava Gregor rûyê xwe guherî, sendelîya şûnda deyna kunc.

Gregor êdî hemahema tişteke nedixwar. Tenê gava ku di hêla xwarinên hazirkirî ra derbas dibû, jê tozikek diavête devî xwe û di devî xwe da bi seatan digirt, paşê pir caran dîsa diavête der. Di pêşîyê da, difikirî ku ya nedihîşt ew xwarinê bixwe, xemgînîya ji ber rewşa odeya wî bû; lê pir neçû ew hubûbû guhertinên odeyê. Mîna ku bûbû edet, tiştên ku li dereke din nedihatîn bişûnkirin, li vê odeyê deydinan; û tiştên wengna jî pir bû, ji ber ku odeyeke malê bi kirê dabûn sê mêran. Sê mêrên cidî, her sê jî bi rîyên bitûn, wekî ku Gregor di navberê dêrî ra kifş kiribû. Û her sê jî ji hêla nîzamê da nexwaşê rêkûpêkîyê bûn; ne tenê di odeyên xwe da, her weha, çima ku wan ev dera kirê kiribûn, di warê îdareyê û bi taybetî ya aşxaneyê da jî. Wan tehemûle tiştmiştên bê kêrhatî û qilêrî nedikirin. Yek jî, wan pertalên mobilîyayên xwe jî bi xwe ra anîbûn. Ji ber vê jî tiştên bê feyde zêde bûbû, yên ku nebihatana firotin, lê meriv nedixwast biavêta jî. Evana gîşt dike-tin odeya Gregor, hetanî ku bi kodikên xwêlî û bermayîyên aşxaneyê gihê. Ku vê hengavê çî ne lazim bû, xizmetkarê ya tim bi lezûbez, ew cihlê çeng dikir odeya Gregor. Ya

rind e ku Gregor pir caran tenê tiştên ku dihatin odeya wî û destên pê wan girtî, didît. Xizmetkarê belkî jî nêr kiribû ku kingê wext û fersend çêbû, wan bi şûnda biderîne yan gîştan bi carekê ra biavê derva. Lê arast, ew çawa bi çengkirina siftê ra hatibûn, weng li wir diman, eger Gregor bi çerxbûna xwe ya di nava wan ra ew nelivandana; ew mecbûrî vê bû, ji ber ku ji xuşîna wî ra şûneke betal nemabû; lê paşê bi şabûnî ev dikir, her çiqas ku ew ji ber çerxbûnê han, pir westîyayî û bixwedeketî bi seatan di cihê xwe da neliv bima jî.

Çima ku kirêdaran carcaran xwarina êvarê jî li mal, di odeya mêvanan da dixwarin, loma derîyê wê hen êvaran girtî dima. Lê Gregor gava ku derî vekiribû jî, jê îstifade nedikir, berevajî, bêyî ku malbatê hay jê hebe, ew di kuncê tarî yê odeya xwe da dirêj kirî dima. Carekê xizmetkarê derîyê odeya mêvanan hendik vekirî hîştibû û wexta ku kirêdar êvarê hatin û çire vêketin jî, ew weng vekirî mabû. Kirêdaran xwe li alîyê jor, li ber maseyê, şûna ku berê bav, dê û Gregor lê rûdiniştin, bi şûn kirin û destmalên sifreyê vekirin, kêr û çetel kirin destên xwe. Dayê sehanê goşt di dest da, hema di derî ra xûya bû û li pişt wê jî xwang bi sehanê kumpîr li ser heldayî. Helmeke tîr ji

ser xwarinan heldihat. Kirêdar bi ser sehanê da xwar va hatibûn, mîna ku bixwastina berî xwarinê wê kontrol bikin û bi rastî jî yê ku di navberê her duyên din da rûniştibû û xwe wekî serdarê wan dinimand, hîn di sehanê da, çiniyek goşt jêkir, belkî ji bo ku bizane ka ew rind kelîyabû û gerek hebûya wî şûnda vegeerînin aşxaneyê. Ew memnûn bûbûn, dayê û xwang pê rehet bûn û di ber xwe da sivik kenîyan.

Malbatê bi xwe di aşxaneyê da şîv dixwar, lê dîsa jî bav berî ku here aşxaneyê, dikete odeya mêvanan û şewqe di dest da, bi xwarvahatineke tenê carekê, di dor maseyê ra çerx dibû. Kirêdar gîşt radibûn ser xwe û bi nav riyên xwe da dikirin piste-pist; paşê, gava ew bi tenê diman, wan şîv dixwarin. Ev bi Gregor ecêb dihat, di nav dengderxistinê pir çêşîd yên ji xwarinê, meriv tim û tim yê herdina didanan dibihîst, mîna ku bi Gregor bihê nimandin, ku ji bo xwarinê hewceyîya merivan pê didanan heye û çiqas rindtir bin jî, meriv bi çengeyên bê didan bi şîya nake tişteki bike. “Bîza min diherê”, Gregor pir bi xemgînî ji xwebixwe ra digot, “lê ne ji vî tiştî ra, ku ez xwe mîna van kirêdaran bi xwedî bikim, ez ê bimirim!”

Tam vê êvarê – nedihate bîra

Gregor ku bi dirêjîya demê li vîyolînê guhdarî kiriye— dengêkî zirav, mîna çingîniyekê, ji hêla aşxaneyê da dihat. Kirêdarên xwarina şevê bi dawî kiribû û ji wan yê navîn rojnameyek derxiste pêş û jê rûpelek da her yekî din û niha wan bi piştanîyê ew dixwandin û cixare dikişandin. Gava ku lêxistina vîyolînê dest pê kir, bala wan hat kişandin; ew ji cihê xwe rabûn û li ser pozî nigan çûn ber derîyê mabeynîyê û li wir, li ber û paş hev dawestîyan. Kesên di aşxaneyê da hatina wan bihîstibûn, loma bavê bang kir û got: “Herhal lêxistina vîyolînê bi mîrzayan xwaş nehat? Ew ê hema bihê birrîn.” “Berrevajî,” ji mîrzayan yê navîn got, “ma xanima cîwan naxwaze ku bihê ba me û li vê odeya hîn hewandîdar û rehet lêbixe?” “A, li ser seran” bavê lêvegerand, mîna ku yê li vîyolînê dixwe ew bixwe be. Kirêdar vegeşîyan odeyê û dipan. Pir neçû, bav bi rehle di dest da, li pey wî, dayê bi noteyan û xwang jî bi vîyolîna xwe va hatin odeyê. Xwangê ji bo lêxistina li vîyolînê, sakîn her tişt hazir dikir; dê û bavê, ji ber ku wan hetanî niha tu ode nedabûn kirê, bi pêşwazîyeke pir nazik hereket dikirin, mîna ku newêribin li ser paldankên xwe rûnin. Bavê xwe bi dêrî hebstartibû

û destê rastê kiribû navberê du pişkojên ûnîformeya xizmetkarîyê a bihevda kirî; dayê li ser paldankê ya ku kirêdar teseduf deynabû kûncekî fîrk û kereme wê kiribû, rûniştî mabû.

Xwangê destpê lêxistinê kiribû; bav û dayê, her yek ji hêla xwe da, bi dîqet li hereketên destên wê mês dikirin. Gregor bi têsîra dengê vîyolînê tozîkê berve pêş hatibû û bi sêrî ketibû odeya mêvanan. Ew qet li ser vê heyirî nema, ku wî pir kêmbû li demên dawîyê qedira yê din zanibû; qedirzanîya ku berê serbilindîya wî bû. Lê niha, ji bo wî sebeb hîn zêde hebûn ku xwe vedize; çima ku ew bitûn di bin tozê va bûbû, ya ku li her derê odeya wî danîştibû û bi her livîneke piçûk va birûbelav dibû; wî dezî, tayên por û bermayîyên xwarinê yê li ser pişt û bogirên wî barbûyî, bi xwe ra kaş dikirin. Bêxemiya wî ya li hember her tiştî pir zêde bûbû, wekî ya berê, gava ku wî rojê çend caran li ser piştê ketî, xwe bi xêlî dixurand. Û li hember vê rewşê ew çavtirsî nedibû ku li ser zemînê pir pak yê odeya mêvanan gavekê pêşda biavê.

Dûvmayî heyê

Mainz, (Almanya) 04.10. 2015

Miçê Usî Zêwê lêhengek bû

Muzaffer Özgür

Min, Miçê Usî Zêwê di sala 1979an da naskir. Heta ew ji nav me barke û herê ser dilowaniya xwe jî hevaltî û dostaniya me berdevam kir. Rêheval, dost û birayê min bû. Me bi hev ra gelek karên siyasî yên veşartî û eşkere kirin. Dema ez ji hevalbendiya wan ya siyasî bidûrketim min hemû kemasî û rexneyên xwe jê re gotin. Ew pê eşiyabû lê dostaniya me qût nebû. Heyfa Miçê bû ku zu ji nav me barkir û em di bin xemginiyêka mezin de hîştin. Lêhengen wek mîna Miçê kem in û bê wan jî tekoşîn bi zehmetî dimeşê.

Miç, însanekî bi civak bû. Di tekiliyên xwe de politîk û teng nebû. Bi her aliya û fikran re dostanî dikir. Ew lêhengê kurdên Anatoliya Navîn bû. Mala Miçê mala me, buroya wî buroya me bû. Dema karêkî me li Kuluyê hebûya em diçûn ba Miçê. Civan, telebe, karker, gundî, mamoste, kurdistanîyên li Kuluyê dijîn û y.d. hemû hezkirê Miçê bûn. Gelek bîranîne me hene, ez dixwazim ji bo xwandewanê bîrnebûnê behsa yekê ji van bikim.

Rojêka havînê ez li Ankareyê bûm. Dema ez berva nexwaşxana

Nûmunê çûm, min dît ku li meydana etfayê pazara tiştên kevn û antîk heye. Ez li nav geriyam. Çavên min di nav de li tiştêkî ket kû wek mîna îstasyona radyo bû. Dema min pirsî, kesê li paş masê got:

—Ew ji Rusya hatiye, îstasyona seyyar a radyo eskeriyê ye. Min pirsî;

—Kar dike? Got; —na! Lê gereg e bê nûkirin. Mesrefê xwe jî nepir e. Li dawîya sohbetê, me li hev kir û min ew sand. Bi tirs û gûman ew bir kire paşîya ereba xwe...

Min îstasyona xwe li Ankarê li ba kesekî radyoçêker amadekir û kemasî dirûst kirin. Radyowan bawer kir ku ez ji eskeriya Tirkîyê me. Çawa kar dike min agahdarî girtin û bir li gund di nav çalekî ceh de veşart. Rojêkê min xwest ji Miçê re behsa amadekariya xwe bikim û çûm buroya Miçê. Demekê bi şûnda dengkirina me hat ser karê min. Min got;

—Miçê ez î behsa tiştêkî bikime, lê tê li ser nemûs û Kurdîstanê sond bixwî ku heta yek ji me ji dine koç neke ew mesele di nav me herduya de bimê. Malbat, heval, dost û hogirên siyasî ma nizanin. Te sond xwar ez ê bejim.

Miç kete kelecaneke. Min li ser kaxizeka biçûk ala Kurdistanê bi rengîn resm kir û got;

—*Rabê ser xwe û destê xwe bide ser ala Kurdistanê, sona xwe bike.* Miçê got;

—*Gotinên te hemûyan erê dikim û li ser nemus, bawerî û Kurdistanê sond dixwim ku ew gotin û karê bê kirin tîstek heta mirinê di nav me herdu ya de bimîne.*

Min plana xwe eşkere kir. Emê li Anatoliya Navîn bi rêya radyomobîlê propaganda ya kurd û Kurdistanê bikin. Miçê got;

—*Lo tu dîn î, em çi dizanin karê radyo mobîlê! Ê me zû bigirin. Ne karê me ye. Gereg e em agahdariya bigirin. Dibe, nabe. Em dikanin bi hevalê Şixo re xeberbidin, ew dikane alikariya me bike. Ew radyo û televîzyona çêdike û dukana xwe heye.*

Min qebûl nekir. Min, Şexo baş nasnedikir û ditînen Şixo yê siyasî jî cûda bûn. Min got;

—*Ya em herdu yan jî ji bîrbike.*

Li dawiyê me li hew kir ku em ê karê xwe bi disîplîn û dizikî bikin. Bernama me bi kemî 30 daqqe be. Destpêk bi kaseta Şivan Perwer dest pêbike, propaganda kurdî û tirkî û li navbera û dawiyê carek din muzîqa kurdî be. Me plana xwe kir. Cihê yekemîn; dor

aliyê gundên Xelika—Gölyazı an jî Qolûta. Paşê li gundê Celika—Yeşilyurt û li dawiyê dor aliyê Altılerê. Dema em bi ser ketin her meha nû, du car çêbibe. Miçî bi tirkî û ez jî bi kurdî bernama xwe pêşkeş bikime û dema me dengdikir emê ji bo dengê me nênasîn paçêkî bidinî ser devê xwe. Kemasîyê hebûn, wek akû, teyba biçûk a kaseta, pîl Miçê hilgirt ser xwe. Dema kemasî xelasbûn me dest bi karê xwe kir.

Li havînê, di şevê de di bin ronahiya hîvê de me li nezîkî gundê Cutka—Günyüzü seatekê radyo xwe bi kar anî. Miçê dest pêkir û bi tirkî got:

—*İyi Akşamlar sevgili dinleyicilerimiz, burası radyo Anadolu. Yaklaşık olarak sizinle bir saat birlikte olacağız. Yayınımız Türkçe ve Kürtçe olarak iki dille devam edecek...*

Kaseta Şivan dest bi musîqa kurdî dikir. Dema musîq xelas bû min bi kurdiya kurdên Anatoliya Navîn dest pê kir.

—*Evarbaş, guhdarwanên delal, radyo Anadolu li ser xeta we ye. Em programa xwe bi kurdî û tirkî di-kin... Dem dema musîqa kurdî ye...* Dîsa kaseta Şivan Perwer.

Em pir bi heyêcan bûn. Kesekî guhdarî dikir an na me nedizanî. Lê em gelek kefxwaş bûn. Bi rê de

min ereba diajot û ez bi serkeftina me serbilindbûm û dile min zîz bû, kelegirî bûm. Miçê bi nişkava li gepira min xist û keniya, got;

—Çirbû, em ê hîn jî pir li ser karê te yî radyo karbikin. Ma dilê te nêşê...

Demekê bi şûn da me li navbera gundê Celika, Şereflîyê û Birinaxilê li ser gaza xerîte carek din propaganda xwe kir.

Bi derengîya şevê em wegeriyan Kuluyê. Me nezikî deh roja guh da ser xeber an gotina ku ka kesekî xebera xwe çebûyê an na. Miçê bi alikariya leşkerên Kurd ji jandarma Kuluyê agahdarî girtin ku li dor aliyê Kulu û Cihanbeyliyê propaganda illegal ya radyoyê çêdibe. Em tirsîn ku devletê agahdariya xwe heye û em gerege hîn bi disiplîn bin.

Mala minê, Miçê laşê xwe yî giran bû. Dema em dimeşîyan zehmetî didît. Cixare kişandin jî min lê qedex kiribû. Gelek aciz dibû. Lê evîna kurd û Kurdistanê dermanê me bû.

Kaymakamê Kuluyê/Jandarma mixtar agahdarkiribûn ku bi rêya radyoyê propaganda kurdîtiyê çêdibe. Rojekê mixtarê gundê me li nav gund bangî min kir û got;

—Xarzê, li wan gundên me bi radyo propaganda kurmanca-terörîsta çêdibe. Qereqola Kuluyê agahdarî dan min, ew çing dibe? Ma

tu dizanî?!!! Min got:

—Xalo, ew teknîk hîn jî li ser dine tune yê ew, we dixapînin. Ez nizanim wallahî?!

Tirs ket dilê min. Min bi Miçê re dengkir. Me demekê karê xwe sekinand. Bi kasetên Serbilind Kanat, Kurd Remzî, ji klasîkên kurdî jî çenda me arşîva xwe dewlemend kir. Me çend carên din jî karê xwe kir.

Dema ez derketim derwayî welat min makîna xwe hûr kir û hendik hendik li çol û baniya belav kir.

Ez di sala 1995an hatim Avrûpa û tekiliyên me qet kem nebûn. Dema hat Avrûpa bû mevanê min. Me li ser bîraninen me sohbet kir. Dema min ew ji bo karûbarê şaredariya Qerecdaxê rexnedikir, digot;

—Karê min gelek zor e. Ji aliyekî de dewlet, ji aliyekî de kurdên me pêşîya min digirin. Propagandeka kirej li ser min tê kirin. Ez î siyaseta partiya xwe ne, ya kurdîtiyê bikim.

Lêhengê Anatoliya Navîn çû ser dîlovaniya xwe. Oxir be! Zu bû lê dema mirin hat ser dora kesekî jê xelasbûn tune ye. Silavên min ji kekê heja Faik Candan, Kürt Remzî, Nebi Kesen, Murat Bozrak, Bilal Ercan, Ali Çetinkaya, Fehmi Demir û rêhavalan re bejê. Em we jîbîrnakin.

Em bi Rojava va bûne xisim

Eşgozel

Min di vê hejmarê da xwest qala zewaca lawkê xwe, Osmên bikim. Em sala 1991an ji gundê xwe Masto, bi tirkî jê ra dibêjin „Cacikli“ hatinê Almanyê. Mêrkê min Silo, jê ra dibêjin Siloyê Fata Hemî Bozê, çar sal ber me hate vira, iltica kir, paşê otirme heyne û kete îş, mal filan girt û em anîn ba xwe.

Çar kurikê min hene, a piçûk, Melîsa li vir hate dinê. Şikur elhemdillo gîştka li vir xandin, meslego xwe kirin û pere xwe qezenc dikin. Lawkê mezin Osman 27 salî ye, ez jê pir razi me. Osmanê min pir kehîl e, mozlum e, rokê kalpî min neşikandiye. Va saleke li mahleya ku em lê rûdinin însanê Surîyê hatin bi cih bûn. Me jê ra yardim kir, Eşya dan, kinc kol dan, kurike min carna çûn jê ra tercûmanlîxi kirin. Gune ye, dilê min bi wan dişewite, mahsûm in, ji şer revîyan hatine, mal û bara xwe hîştine. Qe hune bizanin, hewce tune ku ez

qala êşa wan ji we ra bikim. De tu were wê, em epey çûn hatin ba hev û em bûn wekî meriyê hev. Malbatek heye di nav wan da, em bi wan va pir samimî bûn, pir e baş in, ji Heseke hatine û kurmancîya xwe pir benzemişe ê me dikê. Ez şaş mam ku çiqas bi zimanê me va ey-ni ye; ê doxî ez fehî nakim, ema ê wan fehî dikim.....

Neyse ez werim mesela xwe; ke-çikek wan heye, navê xwe jî mîna gendî Xanim e. Xanim 23 salî ye, pire bi şuhret e jî, Osmên dilê xwe kete Xanime, va çend mehne dilgirtîye û mehek ber vê jî em çûn xwazgincîyê. Merikna pir şa bûn û li tu manemuna negerîyan. Me go veng veng durim va ye, em bi emrê Xwedê keçika we ji lawikê xwe ra dixwazinî. Ewna jî dengê xwe nekirin û serî bakirin, gotin tamam. Paşê me xewer da merlixê xwe. Me xwast ku nîşaneke bi şênayî bi dê û dutê xwe va çêkin. Peeey..., her

keskî şorekî got; „Çima tu lawkê xwe ji merlixî yan jî ji gundî xwe nazewicînî, çima ra Suriye!?“ Dê qurban, tê bêjî hun ne kurmanc in, hun ji ku hatin Anatoliya Navîn û ji wira jî hatin Almanyê!? Mîna ku bê ez lawikê xwe ji Fîzanê dizewicînim! Pismamê Silo sûva hatiye, xwastiye ku em keçika wan ji Osmên ra bixwazin. Keçika xal-tiya min, Tayiba Gulkê Miçê jî li min sûva hatiye. Wê jî xwast ku keçika xwe bide lawikî min. Ê lê ez çir kim? Di dest min da ye sankî? Lawikê min dilê xwe ketiye, ez rawim bêm „Na, ez a te ji merlixî bizewcînim!“ Va ekek biwe!

Pir kes nahatin nîşana me, ji
bo ku hen sêva hatin. Dîsa jî pir



Fehmi Demir'in ardından

H. Hasan Tuzcu



Bir arkadaşın, yoldaşın, bir dostun ardından yazı yazmak oldukça zor iş. Fehmi Demir'i ölümünden sonra anlatmak daha da zor. Ömrünün büyük bir bölümü, taviz vermeden, aktif siyasi mücadeleyle geçmiş bir yaşam. Anlatmak gerçekten zor benim için. 02.01.1957 yılında Konya'nın Cihanbeyli ilçesine bağlı Yeniceba nahiyesinde çiftçi bir ailenin çocuğu olarak dünyaya gelir. 6 kardeşin en büyüğüdür. İlk tahsilini Yeniceoba'da, ortaokul ve liseyi Cihanbeyli'de okur. Siyasete daha lise yıllarında ilgi gösterir. Yüksek öğrenimini, Eskişehir Ticari İlimler Akademisinde bitirir. Öğrencilik yılları siyasete ısındığı yıllardır. Bu yıllarda mücadeleye başlayarak, Özgürlük Yolu grubu içinde, Kürt öz-

gürlük hareketine omuz verir. Evlenir, üç çocuğu olur. 1990 larda legal partilerde de yerini alır. HEP'in kurucuları arasına girer. Sonra DEP'in de kurucuları arasındadır. Kesintisiz mücadeleden asla vazgeçmez. DDP., DBP. partilerinde kurucu, genel sekreter görevlerini üstlenir. 2002 yılından bu yana HAK- PAR'ın kuruluşundan, genel sekreterlikten, son kurultayda da genel başkakanlığa seçilerek mücadeleye devam eder.

Bu defa tarih 25.10.2015 yine Kürt halkı için acı bir gün. Fehmi Demir'i tanıyanlar bilir, hedefine en hızlı bir şekilde ulaşmak isterdi. Bu defa yine Adana'da bir parti toplantısına ulaşmak için tek başına bir otomobille yola koyulmuştur. Toplantı başlamadan, arkadaşlarına

yerini bildirir, “Pozantı’dayım geliyorum” der. Arkadaşları onu usulca beklerler. Gelmesi gecikince, telaşa düşerler. Ne yazık ki Pozantı yolunda trafik kazası geçirdiğini, devlet hastanesine kaldırıldığını öğrenirler. Artık çabalar boşunadır. Fehmi Demir, aramızdan ayrılmıştır. Çocuklarını, sevdiklerini, yoldaşlarını, ezilen halkını, geride bırakarak. Kardeşi Yılmaz Demir’in yanına gider.

Fehmi Demir’in ölümü, 19 Aralık 1983 yılında Diyarbakır zindanlarında, faşist insanlık dışı uygulamaları protesto ettiği sırada, kardeşi Yılmaz Demir’in hayatını kaybetmesinden sonra, **Demir** ailesinin ve halkımızın yaşadığı başka bir büyük acıydı. onlar mücadeleleriyle halka mal olmuşlardı. Mücadeleciydiler, yığittiler. En önemlisi halkının yanındaydılar.

İkisini de 1970 lerde tanıdım. Yılmaz’ın kısa süren ömrü, onurlu mücadelesi her zaman saygıyla hatırlanacaktır. Fehmi Demir’in de dişiyle, tırnağıyla 40 yılı aşkındır kesintisiz süren haklı siyasal mücadelesini, 25 Ekim 2015 gününe kadar onurla getirdiğine, Biz arkadaşları şahidiz. Hiçbir zorluktan yılmadı, yorulmadı, taviz vermedi.

Orta Anadolu Kürtleri, onla-

rı daha lise yıllarında demokratik mücadeleleriyle tanıdı, yakında kaybettiklerimiz; sevgili ALİ ÇETİNKAYA, MUSTAFA TAŞÇI, aynı jenerasyondan sayılırız. Onların da erken ölümü yaraladı hepimizi, anıları mücadelemizde yaşayacaktır. CYKD, HALK EVLERİ, DHKD örgütlülüklerinde yer aldılar. Önce, Konya, Cihanbeyli, Kulu, Yunak, Eskişehir’de gençlik örgütlemeleriyle öne çıktılar. Daha sonra siyasal mücadeleye özgürlük yolu (PSK) ile devam ettiler. Yılmaz’ın acı ve erken ölümü, Fehmi Demir’i derinden yaraladı. Bir yandan da onun mücadelede azmini, inancını biletti. **Fehmi Demir**, demokrasiye ve eşitliğe olan inancını hep korudu, mücadelesini ısrarla sürdürdü. Kürt halkının özgürlüğü onun için her şeyden önce gelirdi. Yerini doldurmak kolay olmayacak cesur bir dava insanıydı. 1980 askeri faşist darbesinden sonra da sürdürülen, demokrasi ve özgürlük mücadelesi örgütlemelerinde de cesaretle yer aldı. Önce HEP, daha sonra DEP, sonra DDP, DBP, HAK- PAR da ve daha bir çok alanda devam etti.

Pozantı’dan, Ankara’ya getirilen naaşı, önce genel başkanı olduğu, Hak- Par binası önüne getirildi,



Fehmi Demir

yüzlerce Kürt aydını, yurtsever, sosyalist, siyasetçi, ala rengine sarılı cenazesi önünde saygı duruşunda bulundu. Her görüşten, her gruptan insanlar, Güney Kürdistan'dan, Diyarbakır'dan, Van'dan, Avrupa'dan, herkes Mihatpaşa Caddesindeydi. Mücadele arkadaşları, siyasetçiler, Sn. Kemal Burkay, Mesut Tek, Selahattin Demirtaş, partili arkadaşları olmak üzere birer kısa açıklama yaptılar. Sonra Yeniceoba'nın yolunu tuttuk. Önce Kulu makasına, sonra; Kulu, Ömeranlı, Acı Kuyu ve Yeniceoba yol ayırımına geldik. Tüm sevenleri, yoldaşları, hemşehrileri, siyasetçiler, yazarlar, şairler Yeniceoba'ya akın etmişlerdi. Yol

boyunca, tanıdıkları tarafından, yaylalarda geçen çocukluğu, ele avuca sığmayan gençliği hatırlandı, Konuşuldu. Yeniceoba'da ağıtlar yükseldi.

Fehmi Demir, doğduğu, büyüdüğü kasabasının mezarlığında, kardeşi Yılmaz Demir'in yanına defnedildi. Yaşlı, acılı annesi, kardeşleri, çocukları, eşi başta olmak üzere, tüm sevenlerinin, Kürt halkının acısını tekrar paylaşıyorum. Yılmaz'ın yanına defnettığımız onun bedeniydi. İkisinin de uğruna ölüme gittiği idealleri şüphesiz yaşayacaktır, yaşatılacaktır. Ruhları şad olsun. Sevgiyle, saygıyla dostlukla, inançla yad ediyorum.

11.12.2015

Xerîbî ê mîna avê tal e! *

Yusuf Yeşilöz

Danê ber nîvroyeke peyîzê ya bi mij, heyam sar bû. Mîna her dem, ez deh deqîqeyan berî birêketina tîranê hatibûm îstesyonê. Kom bi kom meriv dihatin. Di kurtedemekê da, li peronê kerîyek însan kome ser hev bûbû, mîna hevên guşîyek tirî. Nîvê wan weng bi ser neynika simartfonê da xwar va hatibû, tê bigota ew ê hîpnotîze bûne.

Bêyî ku mêyla xwe bidim hevrêyên di kompartimanê da, ez pê xwandina rojnameyê da ketibûm. Nûçeyên çêşîd çêşîd yên ji navçeyê Kobanî a li Bakûrê Surîyê, ji destpêkê vir da, pir bala min dikişand. Kiryarên hovane yên rêxistina bi navê DÎ (Dewleta Îslamî) ya ku vê hovîtîyê bi navî dînekî dike, wekî pir kesên din ez jî matmayî dihiştim, vediciniqandim. Merivên rihberdayî ji xwe ra heq dizanîn ku "gunekaran" bi navî Xwedê bikûjin!

... dengê zarokekî bala min kişand ser hevrêyan.

Di destê mêrê di kompartimana

min da beligekî bi girbûnîyê viqasî A5 hebû. Û li ser jûnîyê wî keçikeke piçûk û bi porê kestanereng rûniştibû. Wê bi her du destan pê herçeke cawinî a qehwereng girtibû. Keçikeke din jî ya ku dora çar salî xwîya dikir, li ber bavê sekinîbû û li ser çokan bê hedef li korîdorê dinihêrî. Mêrik beligê di dest da bi hevrêyê li hêla xwe yê ku li kêlekê pencereyê kîtabeke Infomatîkê dixwand, nimand. Merikê cîwan bi almanî, inglîzî û bi îtalî jî ji wî ra rave kir ku ev tîrana li vê îstesyonê daweste. Lê bilênihêrîna mêrikê pirsyar ê bi ceketê cord î kesketîr, wer xwîya dikir ku wî bersiva cîwanmêr fehm nekirîye. Gava ku wî bi keçika xwe ya li ser jûnî ra gotineke bi kurdî kir, min berê xwe berve kir û jê pirs kir ka ez ê çawa bikanim alikarîya wî bikim.

"Çiqas rind e ku hun bi zimanê min deng dikine!" wî bi şabûnî got û pê ra jî beligê di dest da dirêjî min kir. Li ser beligê, îstesyona ku ew ê lê peya bibe, ji alîyê serdarê wargeha awarte va bi rengîn ha-

*Ev nivîs di kovara *Aufbruch* da bi zimanê almanî hatiye weşandin. Nuh Ateş ew wergerande kurdî

tibû nîşankirin. Pirs a wî ew bû ku bizane ka ew di tîrana rast da ye. Min jê ra got ku ew meraq neke, ez jî li wê îstesyonê peya bibim. Wî pirs a xwe dubare kir. (Ez ê paşê pê bihêsem ku ew î her pîrsekê kêmtir du cara tînê zimên). Min got, gerek ew bêxem be û ez navnîşanê baş dizanim û ez ê hetanî wê malê a ku li ser rîya min e, ra hêla wî kevim. Wî xwast ku bizane, ka ez ji kîjan cîhwarê Kurdistanê me; herema li navenda Tirkîyê wî nas nedikir. Ew bi xwe ji Qamişloyê, Rojava ya li Bakûrê Surîyê, bû; û da ser got: "Cîhê ku îro şerekî giran lê diqewime yê ku ez ji ber neçar mabûm, warê xwe biterikînim û berê xwe bidim welatên yad. Her tişt yad û nenas e. Ez xwe mîna masîyeke ku nû ji deryayê hatiye derxistin, dibînim".

Min hewl da ku wî aşt bikim û jê ra got; "li yad destpêka bi merivan mîna avê tal bê. Lê her ku dem derbas dibe meriv hu dibe yadbûnê û her ku meriv bi tecrube dibe û zimên dihêvise, ew zêdetir aşîna yadîtîyê dibe."

Wî serî ba dikir. Hetanî dema ku em peya bûn, me bi hev ra qet deng nekir. Ev merivê gir û bi qelefet yê ku keçikek li ser pîyê wî bû û wî bi destê ya din girtibû, ra

hêla min ketibû. Min ew hetanî malê ya ku wekî hedefe wî hatibû nîşankirin, bir. Wî ji berîya xwe karvizîteke randewûyê ya hekîmekê a ku zarokên wî sewa kontrola tenduristîyê diçûn ba, derxist. Bi çavlêgerandineke li kartê xwîya dibû ku ew du seatan pêşda hatibû. Gava ku min jê ra qala vê kir, ew kenîya û got xem nake, ya muhîm ew e ku wî edres dîtiye û şûna ku li navenda penaberan ya ku ew lê tu karî nake, ew ê li vir bipe.

Min cadeya ku berve golê dirêj dibû pê nimand û jê ra qala kenara golê ya fereh a ku meriv xwaş li bigere kir.

Di vê navberê da, mijê deste deste xwe paş ya kişandibû.

Wî xatirê xwe ji min xwast û teşekir kir. Li ber derîyê sînemaya piçûk min biryar da ku ez jî berve golê herim. Min pistepiste xwe dibihîst: "Dixwazim xwe bidim ber rojê û kêf bikim, ez dikanim fîlim di bernameya êvarê da jî sêr bikim."

Gava wî ez dîtîm, sivik kenîya, hîn ez ne gihêştibûm ba wî, bang kir û got, henne tu jî du seatan pêşda hatibûyî. Keçîka mezin bi destê ya piçûk girtibû û bi sendewîça xwe du qû yêm dikirin. Nave min Marwan e, wî merivî got. Min jî xwe

pê da nasîn. Wî fêkî teklife min kir yên ku wî ji Navenda Penaberan ya ku wî wekî "Kamp" bi nav dikir, bi xwe ra anîbû.

Ber golê xwaş e, min devê şorê dîsa vekir û koma merivên li kenarê golê pê mêrandin. Komekê xwarin dixwar, komek jî fêr dibû. Tebîet li vira pir hêşin e, wî got, lê ew bîrîya bajarê xwe yê bi teqereq dike, bîrîya bîhna herdê jî.

Bajarê wî Qamişli ya ku berê ji sedhezari zêdetir însan lê dijîyaye, berî sedsalî ji alîyê Arameyan va, yên ku ji ber sitemkariya Împeratoriya Osmanî revîyane, hatiye avakirin. Li pey wan kurd jî revîyana û hatine wê derê. Çar hezar ermen jî ji Tirkîyê revîyane û hatine li doralîyên Qamişliyê sitar bûne. Xwemalîyên bajarê wî pê serbilind in ku bajarê wan ji merivên ku ji ber zilumkariyê revîyane ra bûye sitargeh. Jihadiştan dixwastine ku vê mozayîka gelan xerab bikin, bi dawî bînin.

"Tu stranbêjê ermen, Aram Tigran yê ku bi kurdî distrê nas diki?"

"Helbet, ma kî dengê wî ê melankolîk nasnake?"

"Ew hemşehrîyê min e, bavê wî yek ji wan kesan bû yên ku ji qira ermenen xelasbûyîbûn. Ji malbata

wî tenê ew ji qirkirinê flitîbû. Di diwanzdeh salîya xwe da, ew teve komeke ermen ji Tirkîyeyê revîyaye û hatiye Qamişliyê. Xaniyê malbata Aram nêzikî mala me bû. Çiqas hestîyar distra! Jikî ku ez revîyame, rêzika wî, "yadbûnî pir bi qahr e" pir baş fehm dikime. Rehma Xwedê lê be!"

Marwan bi jina xwe û her du keçikên xwe va çend mahan di ber vê hatibûn Îswîçreyê, bi rêwîtiyeke dirêj û dijwar. Malbatê heqe penaberîyê standiye. Dê û bav, xwang û birayên wî hîn li Kurdistanê Başûr di konan da diman. "Evana gîşt ji bîrîya me dernakevin, pirtir ji ya keçikan. Bi serda, şagirtên min jî ji ber çavên min naherin."

Gava ku min ji bo xatirxwastinê destê xwe dirêj kir, wî pirs kir ku bizane ka ez ji kîngê va li vira me. Min bi dengê bilind hesab dikir. "Bîstûheft sal in." Ew heşmet ma û lêva xwe ges kir. Wî pirsar xwe dubare kir. Min jî bersiv dubare kir. Awirên wî yên pirsyarkî heşmetmayîna wî didan der. "Me digot em ê 2015an vegerin welêt, ba xwang û birayan, ba dê û bavên."

Min jê ra got, ku ez jî di wexta xwe da bi omdî bûm ku du salan şûnda vegerîyama.

Çîroka kilameke şînê

Memê Mala Hine

Di çanda devkî û gelerî ya Kurdên Anatolyayê de şûna kilamên şînê girîng e. Ev Kurdên ku ji welatê xwe dûr ketine êş û kulên xwe bi kilamên şînê derbirîne. Di kilamên wan de êşa tenêtiya sedan salan xuya dibe. Ji ber ku xwe tenê hîs kirine, ji bo wan her mirinek zêdebûna êşa tenêtiyê bûye. Mirina her kalekî an jî pîrekê ji bo wan dûrketinek bûye ji kaniya ku bav û kalên wan av jê vexwariye.

Mîna berhemên din ên devkî kilamên şînê jî çi mixabin di wan salên dawiyê de bêtî ku werin qeydkirin, tên jibîrkirin. Hin ji wan kilaman ji aliyê çend berhevkarên dûrbîn û bihîstyar ve hatine qeydkirin û ji bo nîfşên bê wek mîrateke dewlemendiya rasteqîn hatine parastin. Lê çi heyf e hejmaran van kilaman li gor yên ku hatine jibîrkirin pir kêmtir e.

Bêguman her kilamek xwedî naverokeke taybetî ye û ev naverok bi bûyerên rasteqîn û ne ji rêzê pêk ten. Digel vê naverokê her kilamek xwedî çîrokeke balkêş e. Belê, her

kilamek xwedî serpêhatiyên wisa ye ku wexta mirov dibihîse pê ecêb dimîne. Ez jî dixwazim di derbarê serpêhatiya kilameke wisa de hin tiştan binivîsînim. Lewre wexta ku min çîroka vê kilamê bihîst ez yekcar şaş û metel mabûm.

Ev kilam ji bo gundiyeke min ê ku di şerê yekem ê cîhanê de miriye, hatiye gotin. Navê leşkerê ku di şerê Çanakkaleyê de birîndar bûye û li Stenbolê di nexweşxaneyê Haydarpaşayê de jiyana xwe ji dest daye, Mewlûdê Tono ye û ji gundê Yuzukbaşı yê ser bi Polatliyê ye. Aysîkê Tono ku xwişka Mewlûdê Tono ye li ser birayê xwe ev kilama şînê strandiye. Kilam ji ber ku ji hêla jinekê ve hatiye vegotin xwedî cihekî taybetî ye. Lewre em ji gotinên kilamê dibînin ku jineke Kurdên Anatolyayê çawa li ser bûyerên serdema xwe haydar e. Di vê kilamê de rexneyeke balkêş a şer tê dîtin. Heta di risteyeke vê kilamê de "*Lo lo bişewite mala Îsmet Paşa; Berhev kir xortê deh panzde salî me re şand kalê rûspî ne*" tê gotin. Ew xortên panzdeh salî ku çûne şer wexta ku vegeriyan

êdî bûne kalên rûspî. Lê belê navê Îsmet Paşayê ku di vê risteyê de derbas dibe, ihtîmaleke mezin çewt e, şûna Îsmet Paşa divê Enwer Paşa be. Lewre di wê serdemê de Enwer Paşa wek troykaya Îttîhad û Terakkî serdest û binavûdeng bû. Wexta ku min ev yek ji wî kesê ku min kilam jê bihîst pirsî, ji min re got ku ev yek dibe ku wisa be, lê ew baş pê dizane ku wî kilam wisa bihîstîye. Ji ber vê jî min wexta ku gotinên kilamê nivîsandin tu guhertînek nekir.

Min di zarotiya xwe de ev kilam bihîstibû. Lewre bavê min ji devê gundiyekî me ku navê wî Hecî Mamê bû ev kilam qeyd kiribû. Bavê min her tim ji kasetê ev kilam guhdarî dikir û tevî wî me jî guh dida vê kilamê. Kilam pir dirêj bû, qala bûyerên girîng ên wê serdemê, êş û derdên ku gel rû bi rû mane dikir. Lê çi mixabin niha em tenê çend çarînên vê kilamê dizanin. Lewre ew kaset niha li ber destê me nîn e û em nizanin ka çi lê hatiye.

Deh sal berê min xwest ez vê kilamê tomar bikim. Ji bo vê jî ez li pey wan kesan ketim ku vê kilamê dizanin. Çi mixabin Hecî Mamêyê kal çûbû rehma xwedê û bi tevî xwe gelek çarînên vê kilamê bi xwe re biribûn. Paşê min bihîst ku gundi-

yekî min ku navê wî Cafarê Derwêşê Kûşê ye, çend çarînên vê kilamê dizane. Ev camêrê han jî daxwaza min neavêt pişt guhê xwe û min ew bermayiyên vê kilamê ji devê wî qeyd kirin. Wî jî heye ku çil sal berê bi dizî ji devê Hecî Mamê ev kilam guhdarî kiriye û ew risteyên vê kilamê ku min qeyd kirin, ji wê rojê hate îro di bîra wî de mane.

Mîna gelek gundiyan me, Cafarê Derwêşê Kûşê jî qala inyadiya Hecî Mamê kir. Belê Hecî Mamê yekî pir bi inyard bûye û di îxtiyariya xwe de li ba kesî jî ev kilam negotiye. Hecî Mamê rojekê li zeviya xwe wexta ku fasulî an jî bi gotina hêla me "borce" berhev dike, vê kilamê dibêje. Cafarê Derwêşê Kûşê jî wê demê xort e û li nêzikî zeviya Hecî Mamê karê zeviya bavê xwe dike. Wexta ku dibîne Hecî Mamê kilameke dilsoj distrîne, hema bi dizî xwe nêzikî zeviya Hecî Mamê dike û guh dide kilamê. Lewre ger Hecî Mamê bi hatina wî bihese dê kilamê di nîvî de bihêle. Wî ev kilam cara ewil û dawî li wir ji devê Hecî Mamê guhdarî dike. Hecî Mamê wexta ku bi wî xortî dihesse dev ji gotina kilamê ber dide. Cafarê Derwêşê Kûşê li ber Hecî Mamê digere da ku vê kilamê bêje. Lê Hecî Mamê nabêje. Xortê han "Apo ger

tu vê kilamê heta dawî bêjî ez ê we-
rim van fasuliyên te berhev bikim”
dibêje. Lê Hecî Mamê qebûl nake.
Cafarê Derwêşê Kûşê jî bi stûxwarî
vedigere ser karê xwe û qala vê bûy-
erê ji bavê xwe re dike.

Lê mîna ku pêşiyên Kurdan di-
bêjin, dinya bi dor e, ne bi zor e.
Lewre di ser vê bûyerê re wext der-
bas dibe Hecî Mamê jî bo kurê xwe
diçe keça Derwêşê Kûşê dixwaze.
Derwêşê Kûşê jî bi şertekê keça xwe
dide. Ev merc jî ev e ku Hecî Mamê
wê kilama ku li ser Mewlûdê Tono
hatiye gotin, vebêje. Hacı Mamê
li ber Derwêşê Kûşê digere da ku
dev ji vê mercê berde. Lê Derwêşê
Kûşê "Tu bi inyard bî, ez ji te in-
yadtir im, ger tu vê kilamê nebêjî
ez jî keça xwe nadim” dibêje. Hecî

Mamê ca li kurê xwe dinihêre, ca
jî li Derwêşê Kûşê dinihêre. Ku vê
kilamê nebêje wê keçikê nedin kurê
wî. Di dawiyê de mecbûr dimîne
û li wir ji Derwêşê Kûşê re vê ki-
lamê dibêje. Belê piştî vê jî Derwêşê
Kûşê diçe ji kurê xwe yê din Çolo re
keça Hecî Mamê dixwaze. Lê Hacı
Mamê mîna Derwêşê Kûşê merc
danayne û keça xwe bê merc dide.

Ez gotinên vê kilamê li jêrê
dinivîsînim. Li gor devoka me
dengên ‘a’ wek ‘o’, dengên ‘e’ jî wek
‘a’ tên bilêvkirin. Lê min ew deng
wek kurmanciya giştî nivîsandin.
Her wiha qeyda vê kilamê ku min
ji devê Cafarê Derwêşê Kûşê tomar
kiribû, li ba min e û kî ji min bix-
waze dikarim bi rêya emailê jê re
bişînim.

Diwê m jêr ve têne vana kî ne

Vana xortê Yuzikbaşî simbêl reş îşlik yanbekî ne

Lo lo bişewite Mala Îsmet Paşa

Berhev kir xortê deh panzde salî me re şand kalê rûspî ne

Diwê m de rawe rawe lo lo lo Mewlûd birawo

Diwê m çelenga xaniyê te bû kulingo qalipçiya

Diwê m de rawe rawe lo lo lo Mewlûd birawo

Diwê m şikur dikim birê min nemir li zindanlixê

Qardaşê min şehîd bû li qasrê Îsmet Paşa li selamlîxê

Diwê m de rawe rawe lo lo lo Mewlûd birawo

Çelenga xaniyê te bû kulinga qalipçiya

Diwê m Îstanbulo li rû kaşa

Nalenalê van nixweşa

Ez çûm min go ka qardaşê min

Go qardaşê te rakirin xastexana Haydarpaşa

Diwê m de rawe rawe lo lo lo Mewlûd birawo



Mustefa Taşçi

üst üste geldi acılar

şirin zexê hevîdî mîho ve sen miçî usî zêwê
üzgünüm
taşınması zor bir yük
siyah mendillerim ıslak
xelikanda olmayı çok istedim
sizlere meşe ağacının yapraklarında
çiçekler sunardım
gel gör ki hasret yine yollarımı kesti
yeşil kıvı ve sarı renklerin süslediği
güneşin ısıttığı yolculuğunda
uçuşa hazır kanatların
gençlik kokuyordu

sarı bir sabah vakti

ankara semalarında bir delal güvercin
şirin mi şirin
alımlı mı alımlı
uçuşunda belli
kararlı
yüreğinin büyüklüğünden daha büyük cesareti
gagasında alev alev barış türküleri
bırer insanlık yuvası kara gözleri
kutsal bir ibadeti yerine getiren
aslına sadık bir usta
mavi bir sabah vakti
ankara semalarında bir güzel güvercin
nazlı lı mı nazlı
kıvık kanatları bırer hasret destanı
severek süzölüyor
güneşin doğduğu ellere

Seyfi Doğan



Şirin Kiliçalp

Xwedî derketin: Ji Mereşê da heta Sêwasê

Adem Özgür

Çûma welêt

Mîn li zanîngeha Çewlikê li beşa çapemeniyê xwend. Çapemenî him ji bo min tişteki giring e, him jî ji bo kurdên Anatoliyê kêmasiyêka mezin e. Ji bo vê, min li zanîngehê tiştên nû hu dikirin li ser çand, huner û diroka kurdên Anatoliyê nerîtî dikir. Heta ku min zanîngeh teva kir, ez li ser vê mijarê dişixûlîm. Teza min î tevakinê jî li ser kurdên me yê Anatoliyayê bû. Nêzikî salekê li ser vê dişixûlîm û li vê navberê min pir tişt êvisî.

Rojekê, em ji sinavê derketin û min biryar da kû ezê herim Entabê û Mereşê, ba meriyên xwe. Min him dixwast wan bibinim, him jî dixwast li ser teza xwe yê tevakinê agahdarî berehev kim. Nivî şevê ez li otobusa ku tere Entabê siwar bûm. Ez seda li saet deha li Entebê bûm. Apê Kemal hat ez ji qerêj heylandim. Em her du bi hevra çûn mala wî.

Apê Kemal û xanima wî herdu bi tenê dimên. Keçika wan li zanîngeha Rihayê dixwînê û lawikên xwe jî ji wan cê ne. Wextê

min wan dîtî ez pir şabûm û min Apê Kemal hemêz kir.

Bi rastî merov dizane ku emê ji vir in. Tişteki pir cûda ye!

Me bi xanima Apê Kemal va hevdû naskir û ez derketim derva. Çûm ba lawkî apê Kemal, navê wî Mahmut bû. Me tengê bi wî ra deng kir û li hemberî dikanê wî mêrikik hebû, Mahmut got ew mêrika li ser diroka me pir tiştî dizana. Ez çûm ba wî, ew jî mîna apê Kemal zivistanê li Entabê û havînê jî li gundî xwe dimînê. Navê wî Mistefa bû. Mistefa 65 salî bû û pir caran hatibû Kirkpinarê û gundê me, Yeşilyurtê (Kulu). Apê Mistefa nêzikî du saeta ji min ra qala diroka kurdên Anatoliya Navîn û gundê xwe kir. Min bi apê Mistefa ra got, wextê carekê din hatî Konya û Enqerêyê, were mala me jî.

Ez ketibûm teşqelêkê mezin, şa dibûm. Min êdî meriyên xwe dîtî û ez li ba wan bûm. Lê min bi apê Kemal ra digot, ez li vir namînim, ezê herim gund, gundê xwe. Apê Kemal qebûl nekir, got “em îşev li vir bin, tu tucar nehatî vira, li vir

rakeve.” Bêçare ez li wir raketim, em seda saet dahan da derketin rêya gund. Ez, apê Kemal û xanima wî. Navê gundî wan Karahuyuk e û giradayê navçeyê Pazarcikê. Pazarcik jî navçeya Mereşê ye.

Nêzikî 40 deqqe şûnda, em di gund giheştin. Gundekî piçûk û kevn bû. Malên nû jî hene, lê piraniya wan kevn in. Zevîyê wan, darê wan û heşinayîya wan pir bûn. Li ber her derî, li ber her malê û li her quncikî dar hebûn. Xortên wan yan li Mereşê, yan li Entabê, yan jî mîna me li Ewrûpayê ne. Piraniya wan terin Îngîlîztanê.

Em siftê çûn mala apê Kemal, êdî ew giran giran tên gund. Zevîyên wan, dar û bostanên wan li gund in, gerek li wan mes kin. Me hinek mala wan berev kir û min got, ezî herim ba meriyên xwe. Derketim rêyê û sifte çûm ba pîrikê Fat. Fatê 72 salî bû û bi dîtina min pir şa bû, girî. Me hevdu hemêz kir, hevdû pirsî û em ketin hundir. Maleka kevn bû û di bin da jî axur hebû. Pîrika Fat va dirêj dirêj qale zemanê berê dikir. Kengê em çûn Anatoliya Navîn, me çing hevdû dît û pirsên din dihatin ser ziman.

Min gişk naskirin: Kî lawkê kê, kî keçka kê...

Şev bû û ez disa çûm mala apê Kemal, wana karê xwe teva kirin, zobe vexistin û çaydan dan ser zobê. Hundir germ bû, lê hundirê min jî pir germ bû. Ez heta niha tu car nehatim vî gundî, piraniya wan jî min nas nedikir. Gundekî piçûk û şîrîn; meriyên xwîngerm bûn.

Seda bû ez çûm ba apê Şîxo, mezinê apê Kemal bû. Li ber qerejî xwe dar hûr dikir, xanima wî jî çay dikeland. Me hevdû nas kir û ez li ber jûnî wî rûniştim. Min got ji min ra qalê xwe, piçûkahîya xwe û mezinên me bike. Apê Şîxo mîna kalê Mehmik bû. Serçavê xwe, dengkiri-ne xwe û xûyê xwe... Min got “apê Şîxo, tu mîna kalê Mehmik î, ew jî mina te ji seda heta êvarê di qerêj da ye.” Saet dahan da heta nîvro şûnda ez li ba wî runiştim û wî ji min ra qalê zemanê berê dikir. Paşê kesên din jî hatin, me nan xwar, çay vexwar û me dirêj dirêj sohbet kir.

Şeva dawî meriyên me gişk hatin ba hev; mala pîrika Fat nan çê dikirin. Ji bo min çêkirin. Bangê cîrana jî kiribûn. Di hundur da pir kes hebûn, min li wan sêr dikir.

Baş bû, tiştêkî giring bû, lê ez bi tiştêkê berxe diketim. Wana bi tirkî deng dikir, kurmancî zêde nedizani. Min bi wan ra kurmancî

deng fikir, wana tirkî bersiv dida. Min got, ma hûn çima bi kurikên xwe ra bi tirkî deng dikin; digotin me ji bo ziman pir çile dît, ma ew jî nebînin. Ez sê şeva li wir mam û heta çûyina xwe min bir kur-mancî deng fikir. Bajarekî Kur-distanê kur-mancî nizanê, lê çend sal in kurdên Anatoliyayê Navîn, zimanê xwe diparêzin. Min ji wan ra digot, ev tiştekî pir eyb e, gereg hûn kur-mancî vi ber wan xin. Apê Şîxo nêzikê 70 salî bû û ji min ra got “tu tirkî dizanî xersê, ez ji we ra qalê tiştekî bikim.” Wê şeve min her kes dît, xatirê xwe ji wan xwast û ez derketim rêyê. Rêyek dirêj. Bingol nêzikê deh saet diajo. Min hemû tiştên ku min dîtin û tiştên bo min ecêb hatin li xetê nivîsand. Gereg merov li dîroka xwe, koka xwe xwedî derkeve...

52 sal şûnda koka xwe dîtin

Di facebookê da hevalemî ji Hay-meneyê ji min ra peyamek şand û got jinikek li gundî atkafasî digêrê. Min meraq kir, kî bû û çima li gundê me digêrî. Min jê ra peyamek şand û me li ser medyaya civakê hevdû naskir. Mamoste bû, ji gundekî Sêwas-Gurunê bû. Çend

sal in bixwe û bi malbata xwe va li meriyên xwe digêrîn. Me hevdû li Enqereyê dît, em hatin ba hev.

Me dirêj direj sohbet kir û êşkere bû kû ew kurd in û mirovê wan ê ji gundî me, ji malê Olî Cenê û malê Eşê Elê bûn. Çend sala ber vê, Tahsin î Eşê Elê, wextê xort bûye, çûye wira û ji wî wextê şûnda hevdû wenda kirine.

Ez li mala Eşê Elê û li mala Olî Cenê geriyam, wan jî qebûl kir, gotin ew meriyên me ne û çend sal in em li wan digerin.

Bi vî êşkereyê û bi gotina malê Olî Cenê û malê Eşê Elê kesên ji Sêwasê pir şabûn. Em çend cara hatin ba hev û me bahsa kurd bûnî fikir. Ew dibêjin, me çend sala nedizanî ku em kurd in yan tirk in yan jî ereb in. Êdî ew jî êşkere bû û ew niha dibêjin emê bi her kesî ra bejin “em kurd in!”

Min va mijara li Enqereyê ji nivîskar brêz Mehmet Bayrak ra jî qal kir, wî jî digot li gundên Gurunê kurd û ermen pir in. Bi gotina brêz Bayrak şûnda jî, me bi xelkên Sêwasê va hevdû dît. Min ji wan ra qal kir û êdî ew çav dikin ku werin gundê me. Yan jî gundê xwe!

Seyfi Doğan

Tarî bû. Dema ku ez bi rê ketim û berîyê xwe da Newalê Rapo havîn e. Emê terla me ya li Newalê Malê Mihî Reşê bi makîne hespan diçinî.

Berî ku em li ser şivînê rûnin, me nêrî ku ava me yê teva bûyê. Pismamî min, Hecî bi min re got; li aspî qumêt siwar bibe, here Newalê Rapo, ji bîrê, ji me re avê bîne. Ez bi lez li hespê siwar bûm.

Bi rê da hespê min bêhîzur bû. Ji nişkave dadiwestî. Dor alîyê xwe dinêrî. Bi simên xwe erd dikola. Guhên xwe bel dikirin. Ez jî bêhîzur bûm. Xofekê xwe da ser min.

Min nav û dengê Rapo bi-hîstibû. Rapo, însanekî ji wan gundên me bûye. Ewî nexweş dibe. Xwedîyê xwe yê wî li gangilîyê sîwar dîkin ku bibin xestexanê. Wexta ku nezîke Newalê Zozanê Malê Mih Topalê dibin rewza wî yê xerab dibe û î ji xwe derbas dibe. Xwedîyê xwe yê bawer dîkin ku wî dûne xwe guherî. Xwedîyê di hundirî newalê da gorekê diqolin û Rapo dîkin hundirî gore û axê bi ser dîkin. Dema

ku xwedî axê bi ser dîkin, Rapo yî bi xwe dihêse û lingen xwe hildide.

Bi vê ra, xwedî ditirsîn û dev ji gorê berdidin û direvin. Rapo yî di bin axê da li berxwe dide ku ji gorê derkeve, lê î bi sernakeve û dunê xwe diguhêre.

Ji vê bûyêrê bi şûnda, navê newalê dibe Newala Rapo.

Wexta ku ez hatim ser bîrê, bayekî sar wek kêreke tûj li min qelifî. Şegîzîm. Min xwe bi kolî bîrê girt ku ez li ser piştê gêrnebim. Porê min li serî min gij bû. Min eşqa dilî xwe ya ku min pi rê da fantasî li ser ava dikirî ji bîr kir.

Wexta ku ez hatime xwe, min dewl berda hundirî bîrê ku avê bikşînim. Min çend caran kolê bîrê çex kir ku bizanim, ka dewl tijî bûye an jî nebûye. Min carake din ceriband û heskir ku dewlê tijî bûyê. Min dest pê kir û kole bîrê çex kir. Min mêz kir ku kolê bîrê î bi zehmet çex dibê. Min berê jî ji bîrê av kişandibû, tecrûba min heye. Dewlê giran e.

Ji nişkave kolê bîrê ji dest min

filitî û dewl bi lez keta hundirî bîrê.
Bi wê re min deng bihîstin.

Dengên têne. Min bi xwe û xwe got; dengê şevê ne. Wê demê piranîya gundîyan ê li çolê bûn min got qay dengên gundîyan e. Dengên li şevê ê ji dûr da werin. Min carak din rahîşte kolî bîrê û dewl berjor kişand. Cetin bû, lê dewl dihat. Dewl tam nezîkî devî bîrê bû ku keratîyekê di hundirî dewlê da ye. Min kolê bîrê berda û xwe paştaya vekişand. Keratîyê xwe bi kenarê fiçiyê ku li ser devî bîrê bû, girt û derket derve.

Hespî min serê xwe hilda û bazda. Ez mat bûm dawestîm. Pelgên guhên min cirifîn. Ez ji zimên da ketim û şaş bûm! Min nizanî çi bikim. Li hevdi gerîyam. Min xwest birevim lê lingên min bûn yek dar. Li hember wî figûrê bûm lapêkî.

Wî figûrê ku bejnê xwe qirarê metrokê û bi destpîyên gir. Por reş. Qulên bilîvan wek yek bîrên bê binî. Lêw tenik. Çav kur. Guh bel.

Figûr rahîşte çemilî min û ez berve masake ku bi şewqê loksekê ronî dibû, birim û ez li hemberî xwe li ser kursîyekê bi ruşkandi dam. Kursî pak û nerm bû. Ez bûm rebenekî ber derîyan û belengazê meras dirî.

Wî li min dinêrî û marekî zer û qut, mina tizbîyekê di dest xwe da bi listikandi dida. Mar carcaran dixeyîdi û diranên xwe di dêst re dikirin. Figûr we demê, serî xwe paştaya dihavêt û nefeseke kur hildida û kenek li ser lêvan dihilist. Jan û zewq bi hev re dijinî. Min ji tirsê re, di bin çavan re li wî dinêrî. Di tamarên dilî min da xwîn, mina çemî biharê diheriqîç

Dema ku tirsê min teneke fireh bû, min mela xwe da çavan. Min xwest ku di kûriya çavên wî da rewşa ruhî wî tespît bikim. Çavên xwe yê wek du penceran bûn. Yekê tarî û ya din ê ronî bû.

Di pencerê ronî da, reng bi reng rê derbas dibûn. Piranîyê rêyan sipî bûn û kevîyên xwe bi reqem û herfan xemilandî bûn. Li kevîyên rêyan kîrîşên telefonan dirêj dibûn û tîlên darên telefonan ê ji zêr bûn. Li derderan, darên telefonan şikestî û tîlên xwe qetîbûn. Şûnê tîlên zêrinî, tîlên hesinî bikaranî bûn. Şîfrek bi dest min ket û min bi wê şîfrê derîyê odekê vekir û navê xwe li defterê mêvanan nivîsand.

Di hundirî pencerê tarî da nêyek nek habûn. Neynekên bêdeng. Neynekên tarî û bê pencere. Hewake sar.

Mêrik, ez dame hemberî xwe û demeke dirêj li min nêrî bi şûnda, bi dengêkî otoritêr dest bi axaftina xwe kir.

Ji xwe da qet behs nekir. Kî ye!? Ji kuda tê!? Kuda rêvîye.!?

Li min şîret kirin;

– Serê gihîştikê aqil û kar e!

– Felsefe xwe yê jîyanê li ser hînbûn û qabûlkirina mirnîyê û bêtirsîyê dagre!

– Xwe teslime tabiatê xwe meke!

– Mekeve hundirî pîramîdan.

Rengên xwe çî dibin bila bibin mekeve hundir û bi xwe jî pîramîdan ava meke!

Dema ku ez li hespê siwar bûm ku herim avê binîm, ne hefser ne zîn, ne ji heqiv hebû. Wî camêrî, hespe min bi hefserî zivîn, bi zîna-ke ji purtiken cûcikan, bi heqiweke herîrî û simên hespê yê peşîyê bi zêr û yên paşîyê bi zîv xemilandin. Kûzên min ên ji axê sor şikênandin û kûzen ji zêr tiji av kirin û kirin hundiri heqivê herîrî..

Berî ku ez bi rê kevîm got; “paş xwe mêzmeke” .!



Sîyarê Têrika –6

Bi zaravayê mikailîyên Polatliyê

Dr. Mikailî

ASPARİK, CÎRANA OSÊ

Os di navbera du Yenîçeriyên da, dil bi tirs û xof, hat ber derî xanîyî ku padîşah lê yi. Li ber dêri jî dîsa du parastwan bi kinci xu yî bi şuret û dibriqî, disekinîn. Ji xencî Osê hin çend hemwelatî, yanê qulê padîşah li wir bûn, giştika deste xu li ber, bi hevra girêdayî, stuye xu li hêlikê da xar kiruwûn, dipan. Deriye xêni ji darê çîn bi çîn xemilandî û qasî bejne du mêra bilind diwû. Li ser dêri du helqê gilover, ji hêsin, didaliqîn.

Piştî gavekê deri be dengê bilind, giran giran wewû, axayekî serayê bi kincên xu yî wek ê din nû û bi rengîn, derket ber dêri. Di dest da şivek hewû. Wî şiv çend caran li erdê xist û bangkir; –Destûr efdê padîşahê mezin û gir, temsilkarê Xadê û Pêxemberî pîroz amade ye we qebl bike!

Bi rêz û rûmet bin, min bang kê kir ew bi parastwana va bê hundir! Hetanî ku padîşah ji we tiştêkî nepirse, deng nekin!

–Dor a kê ye? Ji parastwan pirsî.

Parastwan, Os ra wî da. Osê di zikî xu da li ber Xadê digerîya ku bira tiştêkî xeraw nê serî wî. Kince xu duzkin û di nav parastwana da ket hundir. Seri li

ber xu xuzkirî, dest li pêşva girêdayî û bi gavên pir bi tirs, sivik û giran. Herdu parastwan ketin bin pîyî wî û ew wekî ku ji erdê ra kaşkin, birin ber padîşê, sere wî bi destî xu xûzî jêr kirin.

Os gavekê war ma, dû ra li ser çoka ber bi destî padîşê çû û ipta pêşa xeftanî wî, dû ra jî ew gîstîra ku di tiliya wîda paş kir, wekî ku berî hatinê, ra wî dawûn, sere xu qe ranedikir. Dûra destek dirêj çengi wî bû, ew bi tiliya xu berbi jor rakir. Os hîn jî ditirsya li wî binêri. Le pir jî bi meraq bû. Padîşê bi dengê nerm û nazik;

–Lawî min navî te çî ye?

–Osman, Hacıibrahimzade Osman!

–Tu ji ku yî?

–Sancaxi Engürü, Heymaneh!

–Kijan Êl?

–Mikailî, Qawmî Egrad!

Os ji dengî padîşê berda diçû ku, tiştêkî xeraw tunne wû, bi vê fikrî bare wî sivik bû, dîlfereh bû.

–Osman dile min bi xandina Qur`ana te pirr kêfxweş bû, le lêva te bala min kişand, çî bi lêva te hat ku wekîna dirya yî?

Osê çiroka lêvê xu kin û qut ji wî ra qal kir. Padîşê ji wî ra got;

– Ji dîya xu ra ji bo vê dilgiran nebe, neêşe, ji ber ku wê bi xastek ew nekiriye! Tu dê bi qastî xerawiya zaro xu naxwazi, ew qezayeka nebaş e, le binêrî! Ew bûyi sebeb ku tu hatî Stenbolê û ketiye xizmeta me, xizmeta dînî Îslamê! Di her xeriyê da xêrik jî heye! Ê bang kir;

–Axano! vî xortî biwin ba neştergerên serayê, bira lêva vî xortî delal bi emeliyatê bidûrin!

Os dîsa di pîyî parastwana da ber bi paşiyê û seri li ber xuzkirî ji xêni derketin. Osê hilmek kûr kişand cigera xu, serjêkirin tunne wû! Li ber dêri kîsek jî kirin berika wî, wek usul bû, padîşah ew xelatkiribû. Kêf kêfa Osê bû, te berda ewe ji wir bê bask bifiriya. Ew birin cem Cerraha, wana lê nêrîn û gotin;

–Sibê bînin vir! Le bi zikî birçî wari, emê bi afyonê te bitevizînin û emeliyat kin! Ew ji bo me neştergerîyeke çûk î! Ne tirs e!

Çi tirs? Wana bê afyon jî ew bidûrîyana, xema Osê ninûw... Os wê şevê ji kelecane ranaket, xew nediket çava, heta siwê li halî xu yî emeliyetkirî difikirî û diket xewn û xeyalan. Roya din siwê rawû av li xu kir, kince şuştî, nû li xu kir, çû neştergehxa serayê.

Li ber dêri xu qeyd kir, ew birin oda emeliyatê, li ser textikî bilind dirêj kirin. Xortî alîkar hinkî afyon da wî, gavik şûnva heşê Osê çûn, xu anda kir. Li ser xu çû. Di odeka din da heşar bû, xortî ku afyon dawû wî, li ber serî wî

rûniştîbû. Osê xwast tiştikî biwêji, le nikarî, qamişek di dêvda wû û devlêv gî bi paçî spî, ji pemmiyê girêdawûn. Lewik bi tiliya xû ji wî ra got huşbi û hertişt baş î. Rûyê wî dikeniya.

Os jî dîlferê bû, ji Xadê ra şukir ku ji wî ra bûyi yarmetdar. Ji kêfa girî ji çava hat. Dîya xu û êl hat bîra wî, ew li piştî emeliyatê, lêva wî dîsa xaş bûyî, bîdiyana, ê çî bigotana? Lêwik bi qamişî di devî wî da hinkî şorbe dida wî, birçîbûna xu hat bîrê, şorbe germ germ ji gewriyê da dadiket jêr, Osê ew dibihîst. Os qasî heftekî li nexaşxana Serayê ma. Rokê siwê sercerrah, ew romî bû, li dû ji çend neştergerên din ketin hûndir. Osê zanî ku îro ji bo yî wî roki mezin î. Hatin cem wî, xatire wî pîrs kirin dû ra alîkar bi meqesa paçê birîna wî birrîn, jê kirin. Ew paç bi birînê va nusikî wû, hinkî canê Osê êşand, le Ose ji ber mêrtiyê xu ji hayê nekir. Sercerrah keniya, neynik da destî xu û ra Osê da.

–Li xu mêzekî xorto! Ka tu xu dîsa nasdike, yan na?

Osê li neynikê da lêva xu yî qeliştî, dirayî nedî, li şûna wê tenê deziye dîrinê xanê dikir. Alîkaran ew dezi bi meqesê birrîn û yek yek kişandin. Dû ra bi meyê lêva wî şuştin, pakirin. Simêla xu hinkî dirêj bûwû. Ji xu xu ra birrî, ji vê şûnva rû berda, bi vê jî şûna birînê lêvê veşêrî! Rawû xu avêt destî neşterger, ew paş kirin.

–Xadê ji we û padîşah razî bi, we

carik din ez anîm dunê! Neşterger û alikare wî ji pir kêfxaş bûn,

–Xadê ji te jî hafîz, Xadê ji te jî! Tu ye ji me ra bi ew dengî xu yî xaş Qur'anekê bixwûnî, ew bese me yî!

Wana jî bihîstîwûn ki, Os hafîzekî navdar û zîrek i. Osê tişte xu berhev kirin, ji nexaşi din, kesên ku xizmeta wî kirinî, xatire xu xwast û keti rê çû mala ku lê dimîni. Hevali wî ew bi dilgermî, bi qîrîna şabûnê peşwazî kirin. Wî bi coşekê ji wan ra qala emeliyeta xu, daweta li cem padîşê kir. Giştika bi heyranî li devî wî mêze dikirin. Osê bi zêre ku padîşê dawûn wî qurbanek serjêkir, şiranî belavkir, li mizgeftê jî mewlud da xandinê. Ew axta xu wû, wî dianî cîh. Ew bê sebr li ber xandina Qur'anê li ber cemaatê wû. Dixwast ku bira dunya elem bizani, ew hendu ne lêvseyî, yekî mîna wana yî û bê fedi tevli wan bi, yekî wek wan bi. Kî dizani, eger Xadê nivîsandî, bi keçekê Stenbolî va jî bizewice.

Heta nika ji xu fedi dikir ku bi hevala va qala keçika biki, yan jî bi keçikeke va rû bi rû biwi. Li ji vê şûnva ew je bi xu guman derketa derva.

Os berî giştika çû seri li Mela Şewqî Efendi xist, carek din ji wî ra dua kir, mineta xu anî ziman. Li dû wî jî çû hindê Mewlana Xalid, Ji ber ku ew newû ya, Os ne diket nav Encumeni muezzina, ne jî li cem padîşê Qur'an dixand. Ji wî ra hînik şiranî

jî bir. Wî dizanî ku Mewlana ji şiranî pirr hezdiki.

Osê bi rûyî xu yî reş, canî xu yî spî û kal û gewr, bejna xu yî dirêj bala pirr kesa dikşand. Pir cara ku kare wan tunne wû diçûn li ber derya yê li keştiyên çûk sîyar diwûn. Xelkê Stenbole, keç, jin, xort, kal gî dihatin vir. Xorta li wir ji xu ra li keçên ezew dinêrîn, ku dile wan keti yekê yan ji li yekê hezkirin, bi avakî jê ra îşmar diki-rin, xeber dişandin ku hevûdi li derek talde da biwînin. Edet bû, keç bi hîn jinên pîr, yên ku vê ra digotin “Baci” yan jî „Baci Kalfa „ va dihatin hevdi-tin ê. Tenê nediwêrîn.

Osê tu bi kesî va qewl nedawû. Herçiqaş wekî berê pirr nedihat bîrê jî, hîn cara Hew dihat berçava, ew çave wê yî heşin, guliyê we yî sor li navê, bejn û bala wê, ku bi rêva çû, sîya wê, bîna wê. Le dû ra ji xu ra digot; Na Oso! wa yî çend sal derbas bûn, tu ji mal û ji wê revya, bêxeber û bê xatirxastin, belkî ew dane mêr jî, ji ber ku li êlê keç di pan-zde, şazde saliyê da diwûn bûk. Ku yek heta wêngê newû bûk, şor derdiket ku ecewa ew keçik bi qusir e, çi kêmasîya xu heyî. Osê xu bi vê dixapand.

Ku bira welêt dikir diçû Sütölçe yan jî aliyê Anadolu. Li wir ji welêt kesên ku kerîye xu ji bo firotinê dianîn, hewûn. Bi wan ra deng dikir, hesreta dilî xu hinkî sar dikir, ji êlê dipirsî ka li ku ne, çi dikin? Ên ku bi tirkîya Osmanî

nedizani ra diwû alîkar, rê ra wana dida. Wana jî pirr cara yan çend Mecidiye didan wî yan jî berxek, pezek didan wî. Wî iptâ ji vê fedi dikir, le dû ra dît ku wana jî naxwazin di bin rindiya wî da bimînin, ew qebl dikir.

Pirr cara ew pez, berx ji şûna ku ew cara yekê hatiwû Stenbolê û lê mawû, mîvanxana medresa Mewlana Xalid ra dibir. Ew bi vê pirr şa diwûn.

Osê jî hêndu dixwast bizewice, biwe xadan mal û zav zêc. Ji ber ku wî epey pere jî berhev kiriwû, wî dile xu jî mela Şewqî ra vekir. Ew pirr pê şa bû. Û got;

—Osman tu gir bû, dil zewacê dixwazi! Başî em li dost û hevala bipirsîn, bira ji te ra keçîkîk helal şîr xarî biwînin! Ku pere te têrê dike, here ji xu ra malekê bikiri yan jî kirê kil!

Os bi kêf çû ew ji hevala ra qal kir. Rawûn bi kêf bi hevra halay kişandin, hînîka jî koçekî lîstin. Te ye bigote qey dawat nika da destpêkirîyî. Osê zûva malik kirûwû çavî xu. Li hêla behrê, di nav dara da, malik çûk, le belê şîrîn. Buhaya vê jî pirsî wû. Pere wî têrê dikir. Wê şevê jî kêfê xew neket çava, siwê çito rawû li dû limiya xu çû hindê wê malê. Hîn mehel di xewê da wû, li hêlê behrê qehwexanek hewû, xadanî wî hendu Os nas dikir, ew ji hundir da dî, derket ber dêrî û bang Osê kir;

—Wari Osman, çi ye vê berbanga siwê, li çi digeri xorto? Rû bi ken...

Osê jê ra qala niyeta xu kir, ew jî

pê şa wû, ra wû çû ji bo yî xu û Osê ra qehwek dayna ser arî komirê. Havinê hendu xatire xu dixwast, payîz li ber dêrî wû, li derva eyam henik bû, Bi yekva ewr reş bûn, ba derket, bakî sar û kûr, dû ra dest bi barane kir, te ye bigote dengiz dirije!

Baca qehwexanê da êr dikir çîte çît, germahîya êr, tehma qehwê û fikra kirîna malikê û di wê malê da bi jin û zarya jiyînê, Os bir xewn û xeyalên rindik.

Baran sekinî, ewr disa belaw bûn, ro tave xu ên germ avêtin ser deryayê û bajêr. Osê destur xwest û çû ber deri malê ku dixwazi bikiri, hilmik kûr kişand cigera xu, got;

—Ya Bismillah! Û li helqa hesin a dêrî xist, sê cara. Bi dilikî zîz.

Gavik şûnva di hundir da denge şimiki ji darê hat bihîstinê, ên ku Stenbolîya jê ra „Takunya“ digotin hat, herçik çû nêzik bû deri giran giran vewû, mêrikî kal bi fistanî xu yî spî û dirêj e xewê, li ber wî disekinî. Xaçek zêrrînî di stû da wû.

—Siwa we bi xêr! Got Osê. Merik;

—Siwa te jî xorto! Xêre? Ji bo çi hat? Os;

—Min bihîst ku hûn vê mala çûk difroşin, ez dixwazin wê bikirim. Merik ha li dor paşî wî mêzekir û pirsî;

—Ka dê û bave te li ku ne? Em bi wan ra deng kin! Os;

—Ez dixwazim ji xu ra bikirim, ew li welêt in! Mêrik;

—Here Xortî delal bi min nekene! Ka ewqas perê te hene? Tu çi karî diki? Os;

—Biborin, rasti sali min çûk in, li ez endame Encümenî Mûezzini im, di serayê da! Perê min hene, ez dixwazim bizewcim û min ji mala we jî gellek hezkir! Mêrik;

—Li qusura min nenêr e! Ji ber ku tu ewqas genc î! Baş i ez xu amadekim, em herin ba Qadi Efendi, li wir bi şahidiya du kesan peymanî firotinê çêkin! Os;

—Ka ez dikarim berî wê malê ji hundir va mêzekim? Mêrikî kal got;

—Diwî! bidi dû min! û ber bi malê va çû, Osê jî bi meraq da dû wî.

Hewş bi dîwari bilind çex kiriwû, li erdê kevre sehlem raxistiwûn, di navîna hewşê da jî bîrik xanê dikir. Li dorpaşî xaniya jî dare çinarê, guza ber bi ezmên bilind diwûn. Mêrik bi devoka Gayrî Muslima bi tirkî deng dikir.

—Ez û keçîka min bi hevra li vir dijîn, ez zêrkar im, li Kapalıçarşı! Navî min Kevork i, Kevork Aituyan! Ew kar me ji kal û bavan hu kir û hîn jî demeşinim, le Xadê lawik nedan mi! Keçîka min yek cara ji min ra diwi alîkar, ji dest jî tê, le bes jin li gor qanunên Osmaniya nikarin bişuxlin, kar bikin!

Mal ji derva va çûk xanê dikir, derikî ji texta, çin bi çin neqşandî û boyaxkirî, li hêla dêri jî du pençerên ji dervada bi hesina parastî û çarkoşe û dirêj hewûn. Ketin hundir, li dora mahbînekê çar deriye xaniya didîtin. Kevork got;

—Vira Aşxane ye, li hêla wê xaniye bara heyî! Herdû xaniyi din jî tu dikari biki xaniyê raketinê û a mîvana! Ji bo rûniştinê!

Mal pîr û pak bû, Osê hema got;

—Temam ez dikirim, hûn çiqasî dixwazin? Kevork kenîya;

—Xorto! Tu hîn ter û genc î! Meri dikari te pirr zû bixapîni, berî ku tu tişteki bikiri yan jî bifroşe, hertim ji piyasê bipirse û tim bazariyê bike! Şîrete xu li Osê kirin. Dû ra got;

—Xorto ez 500 zêrî dixwazim. Ew bes e!

Osê hema destê xu avêt berika xu, zêr û pere ku berhev kirûbûn, derxistin, da destî xadanî malê.

—Ka ji vir hilgire!

Kevork ew hilanî, yek yek hêjmart, bedela malê jê hilgirt a din disa avêt ber Osê. Dûra got;

—Wari hîn zû ye beri ku em herin ba Qêdi peymanê çêkin, li mala me Xurîniyekê bixûn.

Ji wir bang kir; Porsora min mîvane me heyî, sifrê li gor wê amade ke! Dengêki nerm, wek billûr ji hundir ew bibersivand;

—Serseran serçavan Baviko!

Sere xu çex Osê kir û got;

—Dîya wê rehmetî bû, ez bi keça xu va tevhev li vê qonaxa mezin da dimînin.

Ji dengî Bav û keçikê meriya hezkirina, eşka di nav wan, muhabbeta wan pirr baş dibihîst. Kevork li pêş, Os li

paş ketin hundir. Li ser masekê Xurînî hatiwû amade kirin, Ji rişkîn bigre heta pastix û hêkê Qalî hertişt hewû. Li pê dawastî jî keçîkîk navzirav, por zer û guli dirêj bi rûyîkî bi ken ew xêratî kir.

—Ez Asparîk, keça vî kalî Eqî û şîrin! Xu da nasandinê.

Mîna keçîke Êla Os ê bû, ji mêra ranediwyay. Wekî din keç û jini Stenbolê ku bi mêra va deng dikirin, tim serçave xu por dikirin, paşîya xu çex Mêra dikirin û bi dengêkî sîfîk dikirin pistepist, eger wana bi mêrikî nasnedikirin ra deng bikirana. Asparîkê li hûndurî çavî Osê mêze dikir, ji xu bi guman û xaş. Os şaş ma, nezanî çî biki, çito rûni. Keçîkê hema kursîyek kişand û bi destî xu şûn ra wî da;

—Runni, çima fedi diki? Û keniya, hêlekê da jî bi meraq li wî dinêrî.

Os li hêla Kevork rûnişt, sere xu di berda, qe li dorpaş xu nenêrî û dest bi xarinê kir. Piştî xarinê dua xu kir, ji xadani malê ra spas kir û ji si-frê rawû. Kevork pariye xu giran giran dicû, bê deng dadulqand. Meriya daketina pariyî wî di qirikê da didî. Os li ser diwanê rûnişt, ji diwanê da behra reş, wek çemekî biber direj diwû, dîmeneke pir rind bû. Asparîk jî hat li hemberî wî rûnişt, bi çavî xuyî kesî û wek çilûskê êr, bi meraqeka mezin li wî dinêrî. Bavê jê ra got;

—Porsor! Osman kurd e, min ew mala me ya çûk firat wî, Bixu endame Encümeni Müezzîn e Serayê ye. Bi xu kurd e, ji Engürü yê! Keçîk şa bû got;

—Te çiqas rind kiriye baviko, Ewe ji me ra biwi heval. Çex Osê bû,

—Osman tu ezew e an zewicî ye? Osê bi fedi li Kevork mêzekir, Kevork bixarina xu da ketiwû, qe li wan nedirî. Osê got;

—Ez ezew im! Bi fedi...

Çave Asparîkê dikenîyan, ji vî xortî nûgihîştî hezkirûwû. Kevork rawû pê û ji Osê ra got;

—Osman niha ji mala te ra hîn tişt hewce ne, ka em bi hevra herin çarşiyê, li cem hevala wana bikirin, Asparîk ji bira mala te bi cî di!

Os hema bazda, ji Asparîkê xatire xu xwast, solê xu li ber dêri derxistiwû, ew bi lez kir pê û daket hewşê. Li dû wî jî Kevork dihat. Li bêt dêri erebeka hespa, jê ra fayton digotin, dan sekî-nandin, lê sîyar bûn û ber bi sûk û kolanên Stenbolê, ketin rê. Wek jîyana Osê a heta nika, kirîna malê jî pir bi zû bûwû. Le Os bi kêf bû. Rehetîya Asparîkê, bedewî û kene wê jî qe ji bîra Osê nediçû. Hewa xuya dîn û delal ji bîr kirûwû. Asparîkê xaçperest, yêrmanî heş li serî wî birûwûn.

Navenda gund

Seyfi Doğan

Min li Qonyê lîsê dixwand. Sal 1970 bû. Wê wextê, li serî mahê sibetê, du heftan tatîl dibû û bi tirkî ve re digotin onbeş tatîl.

Em xortên ji gundî Xelkê Jorî, rojê tatîlê, piştî ku me qernên xwe distandin, li wesiteyekê digerrîn ku pê herin gund. Emê time bi lez bûn. Me xwe azad û wek ji esaratê xelas bûyî hês dikir. Perên ku em pê li otobosê siwar bibin tune bûn. Ji ber wê yêkê jî, me xwe dida bendê komyonên gund. Kamyona bekalên gund ji bo dan û standinê tînan Qonyê.

Hotela Kulu-Cîhanbeyliyê ya ku li ser Îstanbul Caddesiyê û Hayat kahvesî cîhên hevdîtîne gundîyên me bûn. Wexta ku me dixwest, em insanên gundî me bibinînin, em diçûn wan cihan. Me dîsa wisa kir. Ez û Kemalî Malê Husî Zexê Xocê çûn hotelê.

Me li wir, Hemîtê Mexmkî Taxê Malê Mihî Reşê dît. Lingên me di erdê negeheştin. Em şaş bûnî ku ji kêyfa re çî bikin. Me hevdu hembêz kir û berî xal û xatira, me jî Hêmit

wexta ku herin gund pirs kir. Hemît şoferê kamyonê MAN 520 yî sor bû. Hemît civan bû. Bawer dikim ku eskerîya xwe jî hîn nekiribû. Hemît şoferekî li ser xwe bû. Xelkê pê re digot "pilot Hemît". Xwedîyê kamyonê jî Nuhê Hevîdî bû.

Bekalan dan û standinên xwe devdeve berêvarê xelas kirin û kamyon bi rê kat. Zivistan e. Hewayê wek kêrêke tûj dibirê. Emê li ser tênte nî. Me yî xwe kirîyê nav qutîyên tişt û xwe ji sermê mina zukimê diparêzênî. Belikê guhên me ê bi çermî sûretî me ve da dinûskêne. Di wê rewzê da, emê dîsa jî bi kêyf in ku em dê terinî gund.

Gund cîhê azadiyê bû. Malbate xwe, dê û dutên xwe û hevalên xwe bi hemdî xwe ditîn û bi têrî xwe ecirîyê hesretê dertêxist. Malê me nezîkî mektebê ilkokulê û camîyê bû. Navenda gund bû.

Navendê gund ber dûkanan û camîyê bû. Ew dera wek kuncikê li Hyde Parkê "*Speaker Corner*" bû.

Dûkanên gund li hemberî



Dûkana Uskî Umê

camîyê, di rêzekê da bûn. Dûkan ji kerpîçê hatibûn ava kirin û ser dûkanan bi çoraxê ji baran û berfê diparastin. Ji alîyê kanîyê malê Şêxe da, dûkanê evil, dûkanê Ûskî Umê bû. Ûskê dikanê xwe yê bi birayê xwe Bektaş ve hevpar bû. Ûskî Umê bayîyê titûnê bû. Bes ne tenê bayîyê gundî me bû. Gundên dor alîyê gundî me jî îhtîyacê xwe yê titûne li ba Uskê tēmîn dikirin.


Uskê wekî din jî, li salê du caran; li biharê û peyîzê purti ji Samûlê tîna û bi deyn difrot. Di dûkanê kelekê dûkanê Uskî Umê da, Îzetî Îvkî Hecî Miçê hefserkarî dikir. Li kelekî wî Husî Malê Xexem berberî dikir. Li kelekê dûkanê berber da, Mehmedî Malê Heselmin dûkanê xwe yê bekalîyê hebû.

Ez her roj diçûm ber dûkanan. Ew dera cîhê hevdîtîne bû. Telebe li tatilê, li wir dihatin ba hevdû. Wê demê qehwexane hîn venekiri bû.

Qehwexane piştî xerman hildanê vedibû. Dema ku xelkî bi pere bû.

Li ber dûkanan bes tenê telebeyên ortaokulê û lîsê ne, herkes hebû. Telebên universîteyê û gundî. Zemînekî xweş hebû. Her tişt vekirî dihat muneqaşe kirin. Zikî hevdu nedişandin. Fikran bi rewzeke azadî reqabêt dikir. Kesî nedigot ku rastîyê li ba min in û ez ji herkesekî baştir dizanim.

Însanan xwe li warên xwe rehet û azad hîs dikirin. Wê wextê meselê Kurdan wekî ku li gund dihat mînaqaşekirin, ne devê herkesekî bû ku vekirî li her derê qalê bike. Li gund qerekol tune bû û kesî jî hevdu îxbar nedikir. Lo ma ortameke bi kêmasî be jî, azad hebû. Mêrxasên



Qedirî Eşê Elî

ku ji bo Kurdan,

heqên netewî û ferdî dixwestin, be-
delekî giran didan û îro jî didin. Bi
salan hepis radiketîn û di dezgehên
îşkencê re derbas dibûn. Însanên
çepitî dikirî jî eynê muamelê ditîn.

Berî ku ez herim bi mêvanî soh-
bêtan bim, min ji dûkanê Qadirî Eşê
Elî, ji xwe re dendikên gulan kirîn.
Kek Qadir wek herdem, bi nivîsan-
dinê re mijûl bû, lê xwe ji muneqaşê
nedihîşt. Dûkanê Kek Qadir, bi rû
harimê mektebê, di xaniyêkî biçûk
da bû.

Ez li eynê rojê bûm mêvanê
çend sohbetan. Kom û kom însan
li ber dûkanan xwe dabûn berroj
û sohbet dikirin. Devûdevê biharê
û rojê teze û teze dibiriqî û erd û
ezman germ dikê û bux ji erdê ber-
ve ezmên mina ramusanêke germ
dirêj dibû. Bîhnê axê ya ku wek
nanê germ dihat îştahê însên ra-
dikir ser lîngan.

Herder çamûr bû. Çamûr mîna
bênişt bi merasan va dizeliqî. Zarok
bi zehmet, bi cizmên kevn û dirî
li nav çamûrê digerîyan. Kincên
wanan ne li gor wê demsalê bûn
û ew li ber bayî bakûr wek pelên
darê zerdelan ba dibûn, dicirîfîn û
diqelifîn.

Ji bo ku derdî çamûrê baş we-
re fehmkirin, dixwazim bîranîneke

xwe binivîsînim. Li ortaokulê, de-
ma ku min li Kuluyê dixwand,
mexlîm di dersê tebîatê da pirsek
pîrs kir, got; "eger îskelet nebe
em dê çir bibin?" Telebekî ji wan
gundên me destê xwe rakir û got;
"em dê di çamûrê da bimînin."

Wek îro tê bîra min. Bilkî Bilî
Hucê û Îdî Malê Îdê ketibûn soh-
beteke kûr û li ser heqên Kurdan
yên netevî û ferdî hur û hur mu-
naqeşe dikirin. Wê demê Bilkî Bilî
Hucê li Ankara Hukuk Fakûltesiyê
dixwand.

Pir însan jî, li dor alîyê Heskî
Êhmed, li ber dikanê Qadirî Eşê
Elî kom bibûn. Hêskî Êhmed îns-
anekî dîndar û gelek durist bû. Ji
alîyê dîn da zana bû. Tabî herdê
ku Hes lê bûyî îlahî meselên dîn
dihatin muneqaşe kirin.

Wê wextê, wek karkêrên mê-
van, çend însanên gundî me jî
çûbûn Elmanyayê. Yekî ji cemeatê
ji Hesê pîrsî. "Perên ku li Elmanya,
li welatekî kafîr tên qezenckirin, ê
helal in an heram in"? Berî ku Hes
bersivê bida, xwe di ber re kir û bi
hêrs bersiv da:

"Bêhey nezani û xizano, be-
lengazî deştê Qonyêyo, serqotî û
pêxasî çolan û budaleyî mino.! Bi-
fikire! Binêre! Binkûmî xwe bi kar



Bilkî Bilî Hucê, Mehmîkê malê Hemê û Elîyê malê Yêxiv



Heskî Êhmed



Hesî Elê

hûne! Rojên we însnanan ê bi hesretan hatine barkirin! Ew însanê bi hewcîyê nivînên germ û xwarineke xweş in. Rizîqê zar û zeç û sêvîyan qet nedizine! Ew perenan ê bi xwîya henîyê tên qezenckirin!”

Hesê Ehmed dest bi şorê kir û got; “Helal e! Divê ew zekatê xwe li vir bidin û zikî çend feqîran têr bikin.”

Berî ku Hes here camîyê, ji nav guhdaran telebekî ortaokulê ji wî pirsî; ”Min ji radiyoyê bihîst (we wextê li her malakê radio tune bû.



Memkî Hûs Keçelê

Radio serî seatê propogandeya revî-tîyê Emerikayê ya hîvê dikir) dibê; Emerîka fûzekê bişînê hîve, tu dibê çi?” Hesê got; ”em ê bi şîya nakinî herin Qulekê, ewê ku çîng bifirine hîvê? Herin budele mebin!”

Li ber dûkanê Îzet jî bi henek ji bereketê zevîyan da behsdikirin. Digotin zevîyê îsal çê birûzin em dê xwe ji deynî koparetîvê xelas kin. Mehmî Ewê şor heyne û got; ”em dê her zivistan û biharê wer dibên û ku payîzê wextê toxuma hat, em dê dimaşin Koparetivê deyn. Xwedê hişan bi me de. Koparetivê me turiçkîne.”

Memkî Hûs Keçelê li ber dûkanê berber bi çend hevalên xwe ve xwe dawûbûn berroj û qala berf û baranên bi bereket dikirin û digotin; ”em ê îsal kêf bikin. Çêre, gil û gîyayê îsal bol biwe. Kerîyên pêz ê me zêde neêşînin. Em ê ji xwe re li Hemê Mûskê xînî. Hayê bilûrê kin

û guh bi ser zengilan dinî...”

Hesê Elî Mehmedî bi Mehmedê Elê Simo ve yarnîya û henekan dike. Hevalê hevdûyê baş in. Lê pir caran diketin rû hevdu.

Mehmedê Elê Simo serşivanekî ji xwe xweş bû. Rabîyê ranebûyê î şivanîyê dikê, ji alîyê zeneatî şivanîyê û şiv bi karanînê da bi meharet bû. Şivê xwe yê giran bû. Merî şerî xwe jê diparast.

Hesî Elê, însanekî şor xweş û zekî bû. Bi ser û binî dunê dizanî. Hesê şivanî nedikir. Ji bo wê jî hunerê xwe yê şivê kêmbû. Hes, hostekî pir bi nav û dengî yonîyê bû. Hesê wek heykeltiraşekî kevirî gewr ji bo xanî avakirinê yonî dikir. Li gundî me hema hema tu xanîyên ku emegî Hesê derbas nebûyî tunen. Hes emekdarekî bi heyf bû.

Wana demekê xoş û xoş li ser harbûnê dêlegurên biharê sohbet kirin bi şûnda, Mehmdî Elê Simo wegerî Hesê û got;

”Hesê Elî Mehmedo! Şiv giran û bi akilî minî dest bi mehereto! Tê bi min re, bi çu bikevî misabeqeyê!”

Ê dî jî Hes e, î ku din bin şorê da bimê.

„Mehmedê Elê Simo yî! Serşivanî kerîyên deştê Romê yê Rutiko. Bibêje! Bibêje! Şorê xwe bi elek û bejingê bipîve. Li hemberî te hunermendê kevirî gewrî dawestîye.“

– Hes vegeyîya Mehmed û got, Li kê derê?

– Te kê der xwestîyê!

Yekî ji yekî camêr e. Yekî gavakê paşda nawêjê.

Hesê; li dawîyê çiyayî inê gewr.

– Qebûl.

Mehmdî Elê Simo bi dengê ku herkes bibihîze got;

– Da here mal şivê xwe bine!

Hesê, demekê li Mihemed di bin çavên re bi qirf lê nêrî. Bêdeng ma. Ji berîyê xwe cigare derxist û teklife dor alîyê xwe kir û yêk ji xwe re vexist.

Însanên li wan civîn li bendê gavê din bûn. Bi meraq gotina Hesê çav kirin.

– Hesê çavên xwe berdan çavên Mehmed û got;

– Şiva minê di dest te da ye.

Tovên dîlovanîyê

ez ê
qurmê dara bindestiyê
bişkênim
dîwarê zîndanên serdestan
hilweşînim
gemara
mêjiyên tozgirtî
li ber bayê serê sibehê
daweşînim
bafiroka dilê xêşim
ber bi bîr û baweriyê ve
bifirînim
zilma namerdan
li aşê hezkirinê
bihêrim
konê kêf û şahiyê
vegirim
govend û dîlanê
li meydana xweşmêran
bigerînim
ala rizgariyê
di zikê ekvator de
daçikînim
çirûskên meşaleya hêviyê
geş bikim
strana mizgîniya serkeftinê
bi dengê Şakîro
bilorînim
ava kaniya jiyana xwe
ber bi asta fazîletê ve
biherikînim
tovên dîlovanîyê
li nav gera
kelem û striyan

berhev bikim
ji konçalên tirsehêz
û bêbinî
gewhera nava dilê xwe
derxim holê
sifreya xweşbinî
û zanistiyê
raxim
li ber firtûneyên har
xwe bispêrim
siya tenîştaya sebirê
heqîqet
dergûşa malzaroka
xwezaya min e
qedir û qîmet
çîçekê rengîn ya baxê
exlaqê min e
ez ê
her şev
di hembêza bêxewiya
jana mirinê de
ferîşteyan
bireqîsînim
him bi ferîşteyan re
dans bikim
him jî
li dor helbestê
semahê bigerînim
di sergêjiya semaha xwe de
him helbestê
ava bikim
him jî
derûniya xwe
biafirînim

Temenê derbider

ez
bersiva pirsan
di lalbûna jana awirên xwe de
dibersivînim
ne rabirdûya min
ne jî dahatûya min heye
li ber çirisîna tavê
mirî me
li reştariya şevên xewle
zindî me
di zaroktiya xwe de
perîşan
di xortaniya xwe de
derbider
di kalbûna xwe de
stûxwar
û kûr kûr diponijim
temenê min li xûrbetê
di hesretkêşîya wêran de
tarûmar bû
zebanîyên serdemê
agir berdan bedena min
laşê min parçe parçe bû
û avêtin ber devê çeçelan
xwîna çavên reşbelek
ya dayikan diniquite
ser hinarokên xewnên min
zexelên çavsor
çermê hest û xeyalên şîrîn
gurandin
porên bûkên serbixêlî
rûçikandin
sînga min ya axînkêş

di êşa birîna şewata xedar de
qelişî
hinav li stêrkên eniya qedera min
peritî
ez
bi destê mirov xwerên hov
hatim kuştin
laşê min
bi rondikên heyvê
hate şuştin
cendekê min
bi kulîlkên axa şaristaniyê
hat nixumandin
giyanê keç û xortan
bi qeytanê hevrîşimî
hat xemilandin
çûkên asîmana keskesor
naletê li dîroka çaxên genî
dibarîne
bilbilê şad
li feryad û fîxana berbangên
ji kezebê
dinale
li îxaneta demên rûreş
demsalên bihara min
reşgirêdan
gotinên zimanê lihevgeriyayî
di henasa min de
fetisîn
lezeta tasa şerbetê
di qulteqlta gewriya bîranînan de
tirş bû

Xizan Şîlan

Başvuru dilekce örneği

Başvuru dilekçesi

Kulu,/.../....

Kulu Kaymakamlığına,

Talepte bulunanlar: Aşağıda isimleri, imzaları, TC kimlik Numaraları ve adresleri bulunanlar.
Talep konusu: Köyümüzün/mahalemizin eski isminin Alınması için gerekli işlemlerin yapılması isteminin sunumu.

Açıklamalar ve Talep:

Bizler aşağıda isimleri ve kimlik bilgileri bulunanlar, Kaymakamlığınızın sınırları içerisinde bulunan Karacadağ Köyünün/mahalesinin sakinleriyiz. Ata– dedelerimiz gibi hepimiz bu köyde doğduk ve bu köyün nüfusuna kayıtlıyız. Resmi kayıtlarda köyümüzün/mahalemizin ismi Karacadağ olarak geçmektedir. Fakat kurulduğu günden bu yana köyümüzün gerçek ismi „Xelıkan“ (/Xelıkane Jor) dir. Ata– dedelerimiz baştan bu yana köyümüzün ismini böyle tanımladığı gibi, çevremizdeki köylerde yaşayan insanlarda böyle tanır, böyle bilirler.

Köyümüzün tarihinde resmi olarak yetkililer tarafından verilmiş farklı isimler (....., Yalınayak, Karacadağ) olsa da halk arasında hep **Xelıkan** olarak bilinmiş ve öyle tanımlanmıştır.

Dönemin Başbakanı, şimdi ise Cumhurbaşkanı sayın Recep Tayyip Erdoğan tarafından 30.09.2013 tarihinde açıklanan demokrasi paketinde, eski köy isimlerinin iade edileceği ve mevcut alfabede olmadığı için kabul edilmeyen x, w ve q harflerinin kullanımına izin verileceği belirtilmiştir.

Köyümüz/mahalemiz kurulduğu günden bu yana hep „**Xelıkan**“ ismi ile bilinmekte ve halk arasında bu isim kullanılmaktadır. Bu nedenle köyümüzün/mahalemizin kayıtlarda görünen „Karacadağ“ isminin kaldırılarak, yerine gerçek ismi olan „**Xelıkan**“ isminin tescili için gerekli işlemlerin başlatılmasını saygı ile arz ve talep ederiz.

Adı ve soyadı	Adresi	TC Kimlik numarası
.....		
.....		
.....		
.....		
.....		
.....		
.....		
.....		
.....		
.....		

İmza

Sorumlu kişi /örgüt/kuruluş:

Nimûna Serlêdanê

Ev kesên ku bixwazin navê gund, belde, cih û warên xwe vegerînin ser yên berê, yên esîl dikarin ev numûna serlêdanê bi kar bînin.

Bîrnebûn

Serlêdan

Ji qayîmeqamê Kuluyê ra,

Tarîx / /

Daxwazkar:

Ferdên ku nav, destnîşan û hejmara nasnameya wan li jêr.

Mijara daxwazkarîyê:

Birêvabirina daxwaza qebûlkirina navê gundê (meheleya) me yê berê

Beyan û Daxwazî

Em ferdên bi nav û hejmara nasnameya li jêr nîştocihên gundê (meheleya) Karacadagê ne. Gundê (meheleya) me di nav sinorên berbirsariya qayîmeqamiya we da ye. Mîna bav û pîrên xwe, em gîşt li vî gundî hatine dinyayê û li ser nifusa wî hatine qeyîdkirin.

Navê gundê (meheleya) me di qeyîdên resmî da Karacadag e. Lê navê gundê me yê rast, ji serî da heta niha **Xelikan** e (*Xelikana Jor*). Bav û pîrên me ji sêrî da ew veng binavkirine û gundên dor û paş me jî gundê me bi vî navî nas dikin û dizanin. Her çiqas ku di tarîxî gundê me da navên resmî yên, nimûne wekî, Yalinayak, Karacadag hebin jî, di nav xelkê gund da ew her tim bi navê Xelikan hatiye û tê naskirin.

Di pakêta demokrasiyê ya ku serokwezîrê berê yê niha Serokkomar, birêz Recep Tayîp Erdogan roja 30.09.2013an aşkere kiribû da, soz hatibû dayîn, ku rê li ber bikaranîna navên gundan yên berê û herfên x,w,q yên ji ber ku di elfabeya hal î hazir da cih nagirin, bihê vekirin.

Gundê (meheleya) me ji serî da heta niha bi nave Xelikan tê naskirin û xelk jî vî navî bi kar tine. Ji ber vê, em daxwaz dikin ku navê “Karacadag” yê ku di qeyîdên resmî da cih girtiye, bihê rakirin û şûna wî nave wî yê rast, Xelikan bi resmî bihê qebûlkirin. Em muameleyên ji bo vê pêwîst bi rêzdarî pêşknîyaz û daxwaz dikin.

Nav û paşnav

Navnîşan (edres)

Hejmara nasnameyê (TC Kimlik No)

.....	
.....	
.....	
.....	
.....	
.....	
.....	
.....	

Destnîşan

Berpirsîyar (şexis/rêxistin):



17 /12

Roja ala Kurdistanê